Gava ku masî tî dibin

Roman

Helîm Yûsiv

Li vî welatî dibû ku her tişt bibe. Tiştekî dûrî aqilan nemabû. Heta bi hestên matmayîbûnê li cem xelkê hatibû jibîrkirin. Lewre, çi dibû, çi nedibû, êdî tiştekî bala ti kesî nedikişand. Wey li wî ku halê xwe bi hal bike û dûrî qeda û beleyên nedîtî bimîne. Her kesî didît bê çi dibe, lê wate ji peyva çima re nemabû. Yek ji wan beleyên ku belav dibûn û tenê bêdengî li pey xwe dihiştin, lalbûn bû. Destpêkê bi dehan û pişt re bi hezaran kes li vî welatî lal bûn, bê ku kesek li ser sedemên gurbûna pêlên vê lalbûna dijwar raweste. Hinek bijîjk û doktorên wêrek dan pey şopa belavbûna wê nexweşiya giran, lê hêdî hêdî zimanên wan jî ditevizîn, sist dibûn û ew jî dibûn mîna nexweşên xwe. Hinekan digot; ava vî welatî bi mikrob e, hinekan jî digot hewa û bayê wî jehirkirî ne, gava ku li qurmê zimên dixe, pûç dike. Hinekan berê xwe dabû xwedê, gazî dikirin, da ku li wan û li welatê wan bê rehmê û çareyekê ji vê belaya mezin, ji vî derdê bê derman re, bibîne. Destpêkê hikumet bêdeng mabû, lê piştî ku qijnikên lalbûnê bi zimanên endamên wê jî girtin, xwedêgiravî gotin; emê hawara xwe bigihînin dewletên ku zanista tibê û doktorî li wan pêş de çûye. Ji çar aliyên cîhanê pispor dihatin, tecrûbeyên xwe bi kar dianîn û tehlîl çêdikirin. Her yekî ji wan tiştek digot. Şîroveya yekî ne mîna yê din bû. Tevlîheviya di encamên karên wan de serê xelkê pirtir tevlîhev kiribû. Her ku diçû ev nexweşî aloztir dibû. Dema her kesî destê xwe ji peydabûna derman şûşt, mele û şêxan ji berê pirtir zor da şîroveyên xwe yên olî û mesele bi qeza û qederê ve girê dan. Wisa bawerî li cem piraniya xelkê çêbûbû ku, êdî Xwedê lalbûn kiriye para wan û ev mesele wê heta hetayê bajo. Li cem her kesî normal bûbû ku êdî zimanê wî sist bibe û wisa qerimî, bê liv û tevger bimîne. Jixwe tiştê nedihat fêmkirin ew bû ku hinek lal dibûn û hinek lal nedibûn. Hinek ji wan jî dema diketin riya rêwîtiyê û ji sînorê welatê xwe derbas dibûn, zimanê wan vedibû. Lê kesê ku ji xwe ne bitirs be, tine bû. Nemaze ku di van bîst salên dawiyê de heta bi zarokan lal dihatin dinyayê. Vê rewşê danûstandina di nava xelkê de kêm kiribû, lê bi riya liv û lebitandinên dest, tilî, çav û lingan dikarîbûn hinekî ji hev fêm bikin. Ev şêweyê jihevtêgihijtinê bûbû mîna zimanekî taybet. Xelkê her zarokên xwe dişandin dibistan û zanîngehan, di xwendin û nivîsandinê de li pêş bûn, lê piraniya wan lal bûn. Heta yên zimanê wan heyî jî neçar dibûn ku hînî wî zimanê taybet bibin. Berê, lalbûn tenê bû, lê vê dawiyê êş jî bi lalbûnê re dihat, êşeke wisa xedar ku xwe berdide bin zimanên lalan, bê ku kesek dema hatin û çûna wê zanibe. Êşeke wisa tîr û pîs ku ne tenê xwe bi qurmê zimên ve digirt, belê xwe berdida nav goştê diranan jî. Vê lalbûna bêserûber hema hema seranserê welêt dabû ber xwe. Ti kesî nizanîbû bê Masî çawa jê filitiye. Masî yê ku bi tena serê xwe dijî û kesekî nizanîbû bê çawa û çima li wê derê bi cih bûye. Carna bi mehan çavê kesî lê nediket, carna jî bi salan wenda dibû. Piştre jî li malê dihat dîtin. Xaniyê wî, ji bilî ku bi kevirên mezin hatibû avakirin, derdora wî bi tenekeyan jî pêçayî bû. Her sal tenekeyek zêde dikir. Wî tenê jimara tenekeyan dizanîbû, ew bixwe jimara salên wî bûn. Lê tenêtiya wî, porê wî yê gijik, qermîçokên rû û kuşekuşa cigareyên wî, wisa kiribûn ku ji temenê xwe mezintir xuya bike. Wî bixwe jî nizanîbû ku xelkê vî welatî ewqasî mereqdar in. Li ser dê û bav, esil û feslê wî bi dehan çîrok hatibûn ristin. Her kesî li wan deveran texmîn û gumanên xwe digotin, hêdî hêdî ew guman dibûn çîrok û çîvanok û mija li ser bicihbûna Masî li wê quncika tozgirtî ya vî welatê ecêb, girantir dikirin. Her çend rojan hinek çîrokên nû dihatin gotin. Heta niha jî

cîranên wî tênegihiştine bê çawa bi kûçikê xwe Bozo re, bi dehê rojan di hundir de dima, bê ku kes zanibe bi çi mijûl bû. Di çavê gelek kesan de Masî mirovekî beradayî û nîvdîn bû. Li cem hinekan mirovekî bêdeng, belengaz û bêxwedî bû. Li cem hinekên din jî zilamê dewletê bû, nexasim gava ku cilên leşkerî li xwe dikirin, nîşan bi xwe ve dadilqandin û bi meşa leşkerî li kolanan dimeşiya. Gelek caran Bozo jî mîna leşkerekî dida dû. Li cem zilamên dewletê jî mirovekî serêxwexwarî û di ser re bû. Gelek caran ew digirtin û piştî demekê, bê ku tiştekî jê fêm bikin berdidan. Masî, ne weke ti kesî, tenê weke xwe dijiya. Her kesî ew nas dikir û hema hema serpêhatiyeke her kesê ji wî welatî pê re hebû. Tev wilo jî ti kesî nizanîbû ka wê kengê Masî wenda bibe û kengê li ber çavan be. Gava xuya dibû, her kes pê re diket têkiliyê. Gava ku nependî dibû, nema pirsa sedemên nependîbûna wî dikirin. Tenê pîra cîrana wî mînakeke awarte bû. Gava bi mehan di hundir de dima, digot; Masî bi cinan re dijî. Pîrê sond dixwar ku dostikeke wî ya cinnî heye. Her carê dikeve diruvên jineke cuda de û tê cem. Pîrê bi kêfxweşî qala serpêhatiyên xwe û cinan dikir. Pesnê Masî jî dida ji ber ku dikare bi salan di nava cinan de bijî, bêyî ku hişê xwe bi temamî wenda bike an jî bê kuştin. Dema ji pîrê dipirsîn ka Masî yekî çawa ye, bersiva wê ya kurt ev bû:

- Hinekî tevlîhev e, hinekî serê xwe xwariye, lê dîsa jî baş e. . .

Kesek tênegihiştibû bê Masî bi jinan re çawa ye. Her ku jineke spehî didît, awira wî li ser rûyê wê dicemidî. Çavên wî sor dibûn, bêdeng dima û di hundirê wî de dengê şkestina caman dihat. Weke ku kesek bi hêrs du qedehên qizêz li binguhê hev bixe û tîtikên wan hûr hûrî bibin. Carna jî, bi dîtina jineke xweşik re, dilopek xwîn ji bêvila wî dihat. Carê, Masî desmala xwe ya spî ji bêrîka xwe derdixist û bêdeng ew dilopa sor paqij dikir û li niqteyeke vala dinêrî. Dihat bîra wî, piçûkanî, gava ku germê li serê wî dixist, xwîn ji bêvila wî dihat. Niha piştî ku zaroktî li pey xwe hişt, ne germa rojê, germa spehîbûnê xwîn diherikanda bêvila wî. Pê re dilê wî li hev diket û gêj dibû. Ji xwe re digot:

- Nexweşikbûn bela serê her jineke nexweşik e. Xweşikbûn jî bela serê her mêrî ye.

Dema vê êşa seyr li qurmê zimanên hezarên mirovan xist, yên li derdora Masî dixwestin sir û raza vê nexweşiyê ji wî hîn bibin. Her gav Masî bersiva wan bi henekekê yan bi hêlmeke dirêj ji cigarê dida. Serê xwe û serê xwediyê pirsê di nava dûmana cigarê de dihişt. Li aliyê din roj bi roj çîrokên li ser kûçikê wî yê reş zêde dibûn. Ji roja Masî li wan deveran hatî dîtin û ev kûçikê reş mîna siya wî pêre digeriya, bi şev, geh li dora mala wî digeriya, geh jî li hundir pê re dima, hinekan sond dixwar ku wan dîtiye Masî, çawa ku bi mirovekî re bipeyive wisa bi kûçikê xwe re dipeyive. Heta hinekan digot; ew ne kûçik e, mirov e lê dema tê xwestin dikeve rengê kûçik. Digotin; carna jin e, carna mêr e, carna jî dikeve rengê lawirên din. Geh bi Masî re wenda dibe, geh jî li mala wî bi tena serê xwe tê dîtin. Nedihat bîra wan ku vî kûçikî kesek gez kiriye, yan zirar daye kesekî, lê herdem qala xwarina wî ya mirovan dibû. Lê kesekî nizanîbû, ka kengê hêrs dibe, an jî har dibe. Ji ber vê, her gav, her kesî hesab ji Masî û xezeba kûçikê wî dikir. Gelek kesan wendabûna hinek mirovan dixist stûyê Masî û kûçikê wî. Di nav xwe de, dûr nedixistin ku, Masî bi xwe ew mirov xwaribin. Ji hêlekê ve navûdengekî wisa ku tirs dixist dilê mirovan bi dû xistibûn, ji hêla din ve jî mîna nîvdînekî bizirar lê dinerîn. Sofiyên dîndar li ser digotin:

- Evê ereqvexwir dikare her tiştî bike.

Kesên jixwerazî tiştekî din digotin:

- Rojekê wê evê porgijik ji serma û birçîbûna di vê mala xwe ya ji tenekan de, mirî bê dîtin.

Kesên diltenik wiha lê dinêrîn:

- Xwezî me têr bidîta da rojekê me xwarineke germ bida dest. Mirov nizane ne dîn e, ne jî biaqil e. Mirov tiştekî jê fêm nake.

Hinekan jî ew paşguh kiribû:

- Dev ji wî dînê beradayî berdin lo.

Di van dîtinên cuda û axavtinên rengereng de, ji ber lalbûnê, ji ziman pirtir dest û tilî dihatin bikaranîn. Gava diaxivîn, hev bi destan dinirxandin. Ji ber ku çek peyda nedibûn, bi

kulm û şiqaman hev rexne dikirin. Li vî welatî, mirov çawa bijî, wê bibe cihê paşgotinê. Wan bi xwe li ser hev digot ku, kesek bi qûneke ziwa ji zimanê xelkê nafilite. Ev gotin ji bo her kesî ye, îca çawa ku yekî weke Masî be. Ji çardesaliya wî ve xelkê vê derdorê ew nas kirine ku bi kûçikekî re dijî, kûçikê ku carna mîna mîhekê nerm û bêdeng e, carna jî mîna şêrekî kufekuf pê dikeve. Rih û simbêlên wî yên tevlîhev carna dibûn cihê tinazên jinan:

- Ev çi mêr e? Hemû mû ye. Dilê mirov jê li hev dikeve.

Hinek jinan jî bi dilbijokî digot:

- Ev çi mêrekî spehî ye. Di bin wê pora dirêja tevlîhev de du çavên dilbijok û wehşî hene. Mêrên me jî hemû bûne weke jinan. Ma mêrên me jî mêr in, hemû qurbana Masî bin.

Masî gava jin didîtin ji guhê wî pirtir dilê wî li wan guhdarî dikir. Çîrok û çîvanokên li ser Masî û jinan qet hev nedigirtin. Di hinek çîrokan de Masî dikaribû şevê pênc jinan biguherîne; her wiha ew bêpêjiniya wî ya li malê ku bi roj û şevan dirêj dikir, bi jinan re diborand, kesek weke wî miriyê jinan tine bû. Di çîrokên din de, destê Masî heta wê kêliyê jî negihiştibû jinekê, ji ber wê, gava jin didîtin, dibû mîna mirovekî şkeftan, tevlîhev dibû. Ji bilî kesên bi xwe û derdên xwe daketî, Masî mereq bi her kesî re çêkiribû, dixwestin ji nêzîkayî ve aliyên veşartî yên jiyana wî nas bikin. Berî her tiştî navê kûçikê wî Bozo ew heyirandibûn. Ew cara yekê bû ku kûçikekî reş bi navê Bozo didîtin. Eger xwediyê kûçik ne Masî bûya niha ji zû ve navê wî hatibû guhertin. Lê kesî ceger nedikir ku têkildarî nava Masî û kûçikê wî bibe.

Dema yekî pirseke wisa jê dikir, yekser Masî bi awireke tûj bersiv dida û berê xwe jê diguhert. Çawa ku jê re bêje; ev bi serê te neketiye. Bi giştî têkiliya xelkê vî welatî bi kûçikan re xerab bû. Ji bilî hinek gundiyên ku pez xwedî dikirin, kesekî kûçik di malên xwe de nedihewandin. Ji mirovan pirtir kêfa Masî ji lawir û heywanan re dihat. Hinekan dixist ser bextê xwe ku Masî bi zimanê lawir û heywanan dizane û dikarin ji hev fêm bikin. Lê rastî çi bû, ti kesî nedizanî. Ev welat welatê gotegot û mezinkirina tiştan e. Her ji demekê û demekê kesin derdiketin, li ber çavên xelkê tiştên nedîtî dikirin û wenda dibûn. Li pey xwe baweriyeke wisa dihiştin ku êdî tiştekî ecêb nemaye, her tişt dibe ku bibe. Yek ji wan Şêx Mehdî bû. Di nava civatê de, li ber çavê her kesî, zilamek derdixist, li ber rûdinişt, perde davêt ser serê wî û bi çend liv û gotinên tevlîhev ew zilam dibû pisîk û bitirs li derdora xwe dinêrî. Hem civat ji wî zilamî ditirsiya û hem jî ew ji civatê ditirsiya. Du deqîqe nediçûn, pisîkê bi qajînî xwe li derî dida û diçû. Pişt re careke din ew zilam di nava civatê de dihat dîtin. Her kesî ji wî zilamî dipirsî ka çilo wisa bû û çi bi serê wî hat. Zilamê behetî wisa bersiv dida:

- Min jî wek we hemûyan, ji xwe re li pisîkê dinêrî.

Careke din Şêx Mehdî ferman dabû solên li ber derî, ji nişka ve hemû bi hev re meşiyabûn. Wê şevê, mêr hemû xwas û tirsiyayî vegeriyabûn cem jinên xwe. Ji bilî wan ecêban falên xwendina kefa dest û pêşbîniyên xwe jî digotin ku piştî çend salan rast derdiketin. Sedema felcbûna devê Hissoyê etar jî ev bû, sond xwaribû ku Şêx Mehdî bi xwe kûçikê Masî, Bozo ye. Hisso wiha berdewam dikir:

- Masî bi sihir û pehlewaniyên xwe dikare kûçikê xwe bixe rengê kujerekî an jî firişteyekî.

Piştî ku Hisso ev gotin belav kirin bi çend rojan felcê li devê wî xist û ji wê rojê ve li ser doktoran e, bêyî ku dermanekî ji devê xwe yê felcbûyî re bibîne. Ji bo ku lêborîna xwe jê bixwaze, li ber destê wî tobe bike û careke din zimandirêjiyan derheqê wî yan qencekî xwedê de neke, dostên wî şîreta çûna cem Şêx Mehdî lê dikirin. Ev çend sal in ku Hisso li pey şopa Şêx Mehdî ye, lê Şêxê gerok nema li wan derdoran xuya bike. Wan salan her çend rojan yan çend mehan termê kuştiyekî li derekê dihat dîtin û kujer nependî dibû. Xelkê di nava xwe de digot ku, destê dewletê di van kuştinên seyr de heye. Hinekan berê xwe dida Bozo û bitirs tawanbar dikirin. Heta ku rojekê dora kuştinê hatibû ser Bozo bi xwe. Çend gule ji paş ve berdabûnê, lê yek tenê bi lingê wî ve xijiqîbû. Masî yekser bi hewara wî ve hatibû. Masî dizanîbû ku kujer dixwazin bigihêjin wî bi xwe. Baweriya kujeran ew bû ku, heta Bozo li ber derî weke dergevanekî zîrek şiyar be, wê nikaribin bi hêsanî xwe bigihînin Masî. Yê ku li wan

deran dijiya dizanîbû bê xezeba Bozo çiqas xedar e, ji ber wê ti kesî ji xwediyê wî nikarîbû nêzîk bibe. Her ji çendakî mirinek yan kuştinek ecêb diqewimî, çend roj yan çend meh derbas dibûn, bûyerên nû wisa dikirin ku yên kevin bêne jibîrkirin. Her bûyer dibû bîranînek û diçû. Ne derdorên dewletê ne jî polîsan rojekê ji rojan ew cînayetkar dernedixistin pêşberî xelkê, heta ku dilê wan rehet bibe. Ji ber vê rewşa mijokî guman û xeyalên wan dixebitîn û diçûn ber bi Bozo ve. Hinek hebûn ku karê wan gurkirina van nûçeyan bû. Wê havînê mêrek û jina xwe û du zarokên xwe li ser xaniyê xwe razabûn. Yekî mêrdewan-pîpelk- anîbû, spartibû dîwêr û hilkişiyabû ber serê mêrik. Di nav cih de, cercûrek di serê wî de vala kiribû û daketibû. Cîranê wî yê ku li ser teprep û hewarhewara jina wî pê ve hatibû digot ku, wî bi çavên xwe mêrekî cilreş dîtiye bê çawa radihêje mêrdewanê û direve. Piştî ku bera dû pişta wî daye, mêrik ketiye rengê kûçikekî reş û tev li mêrdewanê ji ber çavê wî wenda bûye. Pirsa ku guhdarên vê çîroka cîranê mêrikê kuştî heyirandibûn ev bû; gelo, Masî, xwediyê Bozo, wê çi fêdê ji kuştina mêrekî li ber çavên jina wî û zarokên wî bike? Di heman demê de, zilamên dewletê jî Masî rehet nedihiştin. Her kesî dizanîbû ku mêrikê kuştî karê siyasî yê bidizî dikir û berpirsiyarê partiyeke siyasî bû. Ji hêla din ve jî dihate gotin ku, eger dewlet bixwaze van kesên wiha bigire, yan bikuje dikare eşkere vî tiştî bike û ne hewce ye ku xwe û kiryarên xwe veşêre. Derya li vî welatî tine bûn, lê deryayên ji pirsan seranserê welêt dagirtibûn. Van paşgotinan nikarîbûn rê li ber Masî bigrin ku derkeve nava xelkê û kolan bi kolan bigere; bi zarokan re bilîze, bi mezinan re henekan bike û bi Bozo re geh bikene, geh hêrs bibe û geh jî bide sixêfan. Gava Masîkê sêzde çarde salî li derdorên vî bajarokî hate dîtin, ji her kesî weye ku ji gundekî ji wan gundên derdorê hatiye. Ji ber tinebûna dibistanên bilind li gundan, ji bo berdewamkirina xwendinê, malbatan zarokên xwe dişandin bajêr. Yên halxweş xanî ji zarokên xwe re dikirîn û yên hejar jî kirê dikirin. Li cem mamoste û zarokan hemûyan jî Masî yek bû ji van zarokên ku ji gundan hatine. Destpêka hatina Masî ya wê derê pir zor bû. Di rojên destpêkê de, ji bo hevnaskirinê, li hember mamoste, her zarokê navê xwe digot. Gava dor gihîşt wî û xwe weke Masî da naskirin, mamoste pirsa cihê jê hatî kiribû. Zarokekî şûm berî wî bersiv da:

- Mamoste, navê wî masî ye, nexwe ew ji behrê derketiye.

Zarok û mamoste bi hev re keniyan. Wî jî dixwest ku bikene, lê nikarîbû. Masî kûçikê xwe li malê girêdayî dihişt û diçû dibistanê. Mamoste li malbat, xwişk û birayên şagirtan dipirsî, yekî digot; ez û xwişka xwe, yê din digot; ez û birayê xwe bi hev re dijîn. Gava dor gihîşt Masî dîsa şûmekî berî wî bersiv da:

- Yê Masî jî ew û kûçikekî reş bi hev re dijîn.

Ji gotinan pirtir , kenê wan ê qerfî ew dêşand. Her çendî rast bû jî ku, Bozo li şûna xwişk, bira û malbatê hemûyî girtibû, lê dîsa jî hestin nexweş, êşeke tîr xwe berdabû hinavên Masî wê rojê. Her roj piştî qedandina danê dibistanê hinek diçûn bi futbolê dilîstin, hinekan jî ji mecbûrî, di bin zora bavan de, berê xwe didan ber mîh, berxik, karik û bizinan. Tenê Masî dida pêşiya Bozo û berê xwe didan çolan. Geh diçûn cem wan şivanên piçûk, geh jî diçûn cihê lîstina futbolê. Her û her Bozo mîna siya wî pê re bû. Hêdî hêdî hevalên wî jî hînî Bozo dibûn. Her ku ji dûr ve serê Bozo didîtin, dizanîbûn êdî Masî jî bi dû de ye. Gelek caran ji rengê têkiliya wan şaş diman. Ji nişka ve Masî bi ser Bozo ve radibû û dibû kûzekûza wî weke ku gunehek kiribe, yan jî bang lê dikir û di guhê wî de dipeyivî. Bozo diçû li dûr radiwestiya û li benda wî dima. Carna jî çawa bavê ku li meydana lîstikên zarokan li benda zaroka xwe ya piçûk be, wisa Bozo bi hişyarî li benda rabûn û rûniştina Masî bû. Masî dikir nedikir nikarîbû vê baweriyê bi hevalên xwe bide pejirandin ku, Bozo jî mîna mirovekî ye, têdigihêje û eger zirar negihêjiyê, wê zirarê negihîne kesekî. Lê zarokan bûyerên bêjimar yên gezkirina kûçikan û êrîşên wan li ber çavên Masî radixistin û li cem wan her kûçik dîsa kûçik bû. Wê demê kolanên bajêr tijî kûçikên birçî bûbûn. Her sibe xelk li ser revandina mirîşk, berx, elok û kêrvoşkên xwe şiyar dibûn. Her dem tawanbar kûçik bûn. Heta ku şaredarî bi hewara xelkê ve hat termên kûçikên jehirkirî li kolanan rêz bûn. Şaredariyê du demance û çend kîlo jehra

mişkan dan dest Masûmo, karmendê şaredariyê û destûra kuştina kûçikan tevan pê re. Masûmo jehir dixist nava nan û davêt ber kûçikan. Kûçikê ku nanê wî nedixwar dibû armanca guleyên wî yên bêîman. Masûmo serê sibê tev li demanca xwe, jehra xwe û bi terektora şaredariyê derdiket nêçîrê. Yan jehir dida kûçikan, yan gule berdidan serî û lingên wan û termên wan davêtin dawiya terektorê, dibirin çolê, koncal dikola û term li wir vedişartin. Di hundirê du mehan de pêjna kûçikan li wan derdoran nema dihat. Di wê navê re Masî xwe gihandibû Masûmo:

- Xalê Masûm, kûçikê min kedî ye û zirarê nagihîne ti kesî.

Masûmo, kujerê kûçikan, ti soz nedabûn Masî:

- Kûçik kûçik e û fermana wan ji hikumetê rabûye. Emrê kuştina her kûçikî dane min. Îca va tu û va hikumet.
- Apê Masûm, ez te nas dikim, tu dizanî ku hikumeta te guh nade min.
- Nexwe ez jî guh nadim te. Bi xwedê ji îro pê ve ez bawer nakim ku pêrgî kûçikekî bibim û nekujim. Îca kûçikê te be, yê pîrika te be, ez nizanim:
- Apê Masûm, bi xwedê ez soz didim te ku tu kûçikê min Bozo bikujî, ezê jî te bikujim.

Bi wê gotinê re Masûm cemidî ma. Ji çavên Masî yên sor nas kir ku mesele xerab e. Bi vê yekê her duyan ji hev fêm kir. Piştî wê, ne deng ji Masûm hat, ne jî ji Masî. Lê tev wê jî Bozo, di wan rojên ji bo kûçikan zehmet de, di hundir de bû, xwarin û vexwarina wî jê re dihatin cem. Mana Masî di wî xaniyê bitenê de li gel kûçik, li gel nenaskirina malbat û xizmên wî bûbû sedem ku Masûmo bitirse û bi awayekî cidî li geflêxwarinên wî binêre. Wê demê çûnûhatinên Masî yên mizgeftê zêde bûbûn. Masî bi xwe kêmaxaftin bû. Li ser digotin:

- Sira xwe nade dest ti kesî.

Gelek kesan dixwest ku Masî ji nêzîk ve nas bikin, lê nikarîbûn. Li cem wan mîna xweziyekê bû ku zanibin bê li paş wî deriyê wî yê hesinî çi diqewime.

Mikurhatinên deriyê hesinî

Ez deriyê hesinî yê odeya Masî me. Naskirina min pê re vedigere rojên destpêkê, dema ku xwestibû li vî bajarî bi cih bibe. Ez li cem xwediyê xwe di nava deriyan de bûm gava li ber derî bazar bi xwediyê min re dikir. Tiştê bala min kişand ew bû ku xortikekî nûhatî bê bazara deriyan bike û bixwaze malekê ji xwe re ava bike. Em hînî bazarên mezinan bûbûn, lê vê carê muşterî biçûk bû. Tev ku mêrekî din pê re bû, lê dîsa jî wî bazar dikir. Çawa ku wî bala min dikişand, xuya dikir ku ez jî bala wî dikişînim. Yekser berê xwe da min. Destê xwe danî ser sênga min:

- Ha ev derî ye yê ku ez lê digerim.

Wî û xwediyê min li hev kirin. Gava ez anîm vê derê her tişt amade bû. Bê zehmetî ez di cihê min de siwar kirim û ji wê rojê ve ez mala wî diparêzim. Carna ew û Bozo bi hev re li hundir dimînin. Carna jî Bozo li xanîkê xwe yê li kêleka min dimîne. Lê pirê caran gava ku tenê derdikeve Bozo di hundir de dihêle. Jixwe piştî ku fermana kûçikan rabû û Masûmo mîna dijminekî har li wan geriya, heta nêzîkî du mehan rûyê Bozo di rûyê min de bû. Masî ez lê digirtim û her tişt jê re tanî, heta ku xeter nema û her tişt vegeriya weke berê. Di wan rojan de carna Masî bi saetan tenê rûdinişt. Serê xwe dixist nava her du destên xwe û diramiya. Mîna kesekî ku tiştek wenda kiribe, bi saetan li dîwêr dinerî. Her car li dîwarekî dinerî û bêdeng dima. Min gelek dixwest ku zimanê min hebe û jê bipirsim bê ka li çi digere, lê dawiya dawî ez parçeyeke hesinê zingargirtî me û haya ti kesî ji min nîne. Min nizanîbû ka li derve çi pê re çêdibe. Rojekê Masî vegeriya malê. Sicade û pirtûkeke qalind bi xwe re anîbûn. Vê dawiyê min nas kir ku Quran e. Li şûna nerîna vala li dîwaran, dest bi nimêj û xwendina Quranê kir. Destpêkê bêdeng lê vê dawiyê bi dengekî xweş û zelal Quran dixwend. Ez tênedigihiştim bê çi dixwîne, lê her min dixwest ku li ber min Quranê bi dengê xwe yê zîz bixwîne. Çend refik

di hundir de çêkirin û tijî pirtûkên qalind kirin. Pirtûk hemû li ser şîroveyên Quranê, jiyana pêxember, sehabî û qencên xwedê bûn. Mîna pisîka ku di nava kavilan de li mişkekî reviyayî bigere, wisa Masî di nava wan pirtûkan de li tiştnan digeriya. Dixwest ku rehet bibe û ji vê bêtebatî û tevlîheviyê rizgar bibe. Ji Bozo re behsa çûnûhatinên xwe yên mizgeftê dikir. Bi kêfxweşî li benda hatina şêxekî mezin bû. Ji kêfan re, şeva berî hatina Şêx, ranezabû. Wê rojê, vegeriya û ji Bozo re bi berfirehî qala xwe û hatina Şêx kir. Min jî lê guhdarî dikir. Ji şeveqê ve ji malê derketibû. Sofî û mirîdên Şêx bi sedan li benda erebeya sipî bûn, ku Şêxê cilsipî jê dakeve û hemû herin tewafa wî. Hinek bi tirimbêlên xwe yên spî, li pêşiya bajêr, diçûn pêşwaziya Şêx. Yên din jî xwe berdidan kolanên derdora mizgeftê. Sofiyên diltenik ji kelecad û heyecanê hindik mabû ku hişê xwe wenda bikin. Ji nava sofiyan ji tevan pirtir yekî bala Masî kişandibû. Ew sofî ketibû cizbê, riha wî ya dirêjî spî bi hejandina serê wî re li ba dibû. Şaşika wî firiyabû ber lingên wî û dengê bi ewteewt 'ez kûçikê Şêxê xwe me' derdixist, pê re jî Bozo dihat ber çavê wî û ji xwe dipirsî:

- Gelo, eger Bozo bi sirr an bi cizbê bikeve, dê çawa be?

Bi hatina Şêx î ber deriyê mizgeftê ve barebar bi hinek sofiyan ket û yên din jî xelk li du aliyan rêz dikirin. Şêxê cilspî û bêhnxweş her du destên xwe mîna du baskan dirêj kiribûn û hêdî hêdî dimeşiya, wey li wî yê ku destan maç bike, yan jî aliyek ji cubeyê wî. Yên xwe gihandin destê Şêx, Masî jî yek ji wan bû. Wê maçê ew du rojan li malê şaş hiştibû:

- Digotin; bêhna misk û enberê jê tê, min bawer nedikir.

Destê xwe nêzîkî bêvila Bozo kir:

- Bêhn bike Bozo, eyn bêhna bihuştê ye.

Bi hatina Şêx re, mele û mirîdên wê derê kesên ku dixwestin li ber destê Şêxê mezin tobe bikin, hemû dan hev. Her şeş, heft heb dikirin komek û didan destê melayekî. Mele ji komê re qala tobekirinê dikir: Divê tobedar here ber destê Şêx û wê şevê heta roja din bi ti kesî re nepeyive. Divê xwe bişû, nimêj bike û Quran û hedîsên pêxember bixwîne. Tobedar mecbûr e ku berî razanê sed kesên mirî bîne bîra xwe û ji bîr neke ku ew jî dê rojekê here ber destê rebê xwe. Wê êvarê Masî tobekirî vegeriya malê. Kêfa wî pir dihat ku, êdî dibe mirovekî bêguneh, ji ber ku heta sibe wê gunehên wî nemînin. Ji ber wê hat nehat xwe şûşt û dest bi xwendina Quranê kir. Heta derengî şevê nimêj û dua kirin. Serê sibehê, heta piştî nimêja sibehê bêdeng bû. Piştî ku roj hilat nû dest bi axavtinê kir û bi kêfxweşî xwarin ji xwe û Bozo re amade kir. Wan rojan kalê mêrê pîra cîrana wî miribû. Pîrê tika kiribû ku Masî çend (yasînan)li ser kalê mirî bixwîne. Her çendî ji têkiliya bi pîrê re dudilî bû, lê dîsa jî ji ber ku xêr e, çûbû mala pîrê. Ji roja ku ev kalê rihspî naskirî ve, hejandina serê kalo bala wî kişandibû. Bîst û çar saetan serê kalo ber bi çep û rastê ve dihejiya. Masî bi dirêjayî ji Bozo re qal dikir. Ka çiqas pîrê bixirecir bû, wisa jî kalo bêdeng kursiyê xwe yê biçûçik dibir qorzîkeke malê, Qurana xwe datanî ser kursiyê wê yê biçûçik û bi serê xwe yê hejhijî her û her Quran dixwend. Pîrê bi xwe û bi nexweşiya qîza xwe Cemîla ve daketibû. Cemîla keçeke wisa bû ku, xelkê wê derê li ser digotin:(Mirov ne bixwe û ne vexwe, hema ji xwe re lê binere). Mînaka keçên xweşik bû. Li wan derdoran, pîrê li ser zimanê hinekên Xwedênenas wiha li ser qîza xwe digot:

- Xwedê Cemîla ji bo xwe çêkiriye, lê bi şaşitî ketiye erdê.

Hinekan di nava xwe de digot ku, nayê bawerkirin ku Cemîla qîza vî kalê hejhijî be. Dibe ku qîza rêwiyekî spehî, yan jî bi rastî ya cinekî be. Ji nişkê ve serê Cemîla tevlîhev bûbû. Her kesî digot:

- Cemîla dîn bûye, bi cinan ketiye.

Tev vê rewşê, dîsa jî xelkê dihat ji xwe re dixwestin. Hêvî dikirin ku bi zewacê re hişê wê bê serê wê û rehet bibe. Dikirin nedikirin nikarîbûn Cemîla razî bikin. Cemîla evîndara xortekî bû. Vê dawiyê, gava ku wêneyê xort pê re dîtin, nû hate zanîn bê mesele çi ye. Wê çaxê xort zewicîbû û mala xwe ji wî bajarî bar kiribû. Tenê di dilê Cemîla de cihê wî parastî mabû. Di wê navê re û bi hatina xwazgîniyekî nû re, pîrê biryara dawî dabû:

- Divê Cemîla bi vî mêrî re bizewice.

Mêrê ku Cemîla dixwest hem maldar û naskirî bû, hem jî bibiryar bû ku ji bilî wê xweşiktirîn jina vî welatî bi keseke din re nezewice. Bi zorê û bi gefan Cemîla derbasî cem Mele kirin. Bi hîle û lîstikên pîrê zewicandin û mêrê wê bê dawet bi xwe re bir. Şeva yekem êrîşî mêrik kiribû, lê xistibû û jê re gotibû:

- Ez ji te hez nakim.

Xesû, xezûr û tiyên wê bi zorê zava ji nava lepên wê derxistibûn. Çend roj di ser re çûn, Cemîla çêtir bûbû û mîna jineke malan tevdigeriya. Sond dixwar ku ne bi dilê xwe êrîşî mêrik kiriye, cin wilo dikin, neçarî lêxistinê dikin. Mêrê wê jî, mîna diya wê zor dabû niviştan û birina cem Şêx û sihirbazan. Her tişt baş meşiya heta ku Cemîla ducanî bû û roja welidandina wê hatibû. Di wan saetên dijwar de ku zarok li ber hatinê bû, Cemîla careke din mîna deveya hêcbûyî, êrîş bir ser doktor û hemşîreyan û her devera nexweşxanê tevlîhev kir. Zêdeyî heşt kesan lê civiyan heta ku zaroka wê hat dinyayê. Piştî vegera malê guhertineke din bi Cemîla re çêbibû. Xwesteka xwe ya di dil de eşkere dikir. Xwesteka wê ew bû ku bavê zarokê wê ew evîndarê wê yê xwediyê wêne bûya. Carekê ji Masî re gotibû ku, mejiyê wê ji lêxistinê çelq kirine. Gava pê hisiyan ku bi dizî diçe cem evîndarê xwe, diya wê giliyê wê li cem xalên wê kiribû. Hemû lê civiyabûn û di bin tirs û geflêxwarinê de tevlîhev bûbû:

- Namûsa me berî jiyana me ye. Vê carê lêxistin e, ji ber ku hîn tiştekî giran nebûye, lê careke din wê kuştin be.

Cemîla niviştên bi xwe ve hemû avêtibûn erdê û giriyabû. Masî her çar niviştên anîbûn bi dîwarê hundirê xwe ve daleqandibûn. Bi dû eşkerekirina çîrokên xwe re, Cemîla roj bi roj li xwe dişkênand û ew şewqa di rûyê wê de diçilmisî û diçû. Niha, yê ku wê bibîne dê nizanibe ku rojekê ji rojan ev jin mîna xweşiktirîn jina vî welatî dihat binavkirin. Pêla bêdengî, zimanherbilandin û lalbûnê, mîna bi hezarên kesan, ew jî dabû ber xwe. Lê her û her dawiya xirecira ku pîrê li dora Masî dikir, nedihat. Di roja mirina kalo de, ji ber ku pîrê nehiştibû Bozo derbasî mala wê bibe, Masî zû vegeriyabû malê. Gava pîrê çav li Bozo ketibû, ji bo ku firax û tiştên mala wê neherimîne, yekser xwe avêtibû devê derî û ji Masî tika kiribû ku wî li derve bihêle. Masî jî xwestibû vegere, lê ji ber ku kalo hê li erdê bû, Bozo li derve li benda xwe hiştibû û bi lez lê vegeriyabû û dilşikestî hatibû malê.

Wê şevê Masî tevlîhev bûbû. Ziq li dîwêr dinerî û dubare dikir:

- Ezê bibînim.

Ez tênegihijtim bê çi wenda kiriye yan li çi digere. Wisa xuya bû ku keleke germ di hundirê wî de serî hildaye. Çavên wî fireh bûbûn. Dest bi kişandina çixareyan kiribû. Hundir di nava dûmanê de hiştibû. Mîna ku di hundirê beroşeke vala de be, dengê wî lê vedigeriya:

- Ezê bibînim.

Roj bi roj rêzên pirtûkên stûr li ber dîwêr, hem bilind û hem dirêj dibûn. Masî, mîna ku di nava aveke bêbinî de be, di nava wan pirtûkên bergstûr de avjenî dikir. Min nema zanîbû li çi digere. Li diya xwe, bav, xwişk û birayên xwe, li tiştekî nenas û revok digeriya. Piştî nîvro bi coşeke mezin hildiperikî ser pişta pirtûkan heta berê sibehê. Dema xelk ji xewê radibûn, ew jihevketî radiza. Roja din gera xwe berdewam dikir, lê armanc her ew bû:

- Ezê bibînim.

Kor û kerr ji dayik bûme

Ez ew kûçikê reş bi xwe me. Ewê ku bi hezaran çîrok û çîvanok li ser têne gotin. Dibe ku hinek ji wan rast bin jî, lê kêfa xelkê vî welatî ji mezinkirina tiştan re tê. Gava min spî dibînin, yekser dibêjin:

- Bozo çermê xwe guhertiye.

Ez li hişê van mirovan şaş dimînim. Ewqas ji xwe razî ne. Qala xwe û destkeftinên xwe, jîrbûn û zanebûna xwe dikin, lê ji hovîtî û bêhişiya xwe jî ne agahdar in. Yek ji wan ji dayik

dibe, hema bîr dibe, hinekî mezin dibe, ji bîr dike ku dawiya wî mirin e. Ne ji temenê xwe razî ye, ne ji jiyanê razî dibe, ne jî mirinê diecibîne. Qala temenê kin dikin û bi şev û roj di pêşbaziya çêkirina çekan de ne, bê kî pirtir dikare kê bikuje, ramanan ji xwe re diafirînin û rê li ber kuştinê vedikin. Lê em kûçikên belengaz, kor û kerr têne dinyayê û nikarin bi dirêjiya nîvê temenê mirovekî bijîn. Piştî deh-pazdeh rojan ku çav û guhên me vedibin, nû Xwedê me davêje ber destên mirovan. Îca her yek ji me û şansê xwe. Ez bi xwe, xwe xwedî şansekî baş dibînim ku li mirovekî mîna Masî rast hatime. Carna ne ez û ne sed kûçikên weke min nikarin têbigihêjin bê çi dixwaze, lê tev wê jî me nan û xwê bi hev re xwariye û ez bawer nakim ku nankoriyê bike. Tiştê xerab ew e ku hinek bêsûc û bêsebeb dijminayiya me dikin. Hinek jî kerba xwe di serê heywanên xwe re derdixin. Ji hev aciz dibin, bi hev nikarin, bi ser me de tên. Divê ez mafê xwediyê xwe Masî ji bîr nekim, ku ne ji wî bûya niha ezê jî yek ji qurbaniyên Masûmo bûma. Lê çawa ku ew xwediyê min e, ez jî xwediyê wî me. Carna Masî diranên xwe li min diqirçîne, min di nava tehdîd û sixêfan de dihêle. Lê ez dizanim ku ji min hez dike. Her ku hêrs dibe, tê pê li teriya min dike û diqîre:

- Ezê rojekê vê teriya te ji qurm ve rakim Bozo, ezê vê teriya te bixim bin lingê xwe û bi meqesekî, yan bi kelbetanekî, ji binî ve jê bikim.

Ez dizanim bi van gotinan tenê xwe rehet dike. Min gelek caran wisa kiriye ku mirin riya xwe ji ser biguherîne. Gelek tiştên min û wî weke hev in. Min bavê xwe nas nekir û hê ez cewrik bûm, min dê û her pênc xwişk û birayên xwe wenda kirin. Masî jî weke min, malbata xwe wenda kiriye. Gava ku li min xwedî derket ez cewrik bûm, ji wê rojê heta roja îro ez bûme malbata wî û ew jî ji bo min bûye malbat. Di vê dema dawiyê de hatiye guhertin. Nizanim çi pê hatiye. Serê xwe ji nava pirtûkên çermqalind dernaxe. Dibe ku sûcê van ramanên olî be. Kûçik hemû dizanin bê misilman di nav xwe de çi dibêjin:

- Eger kûçikek ji firaxekê vexwe, divê bi heft avan bê şûştin, heta ku helal bibe.

Ev tê wateya ku em heram in û divê xwe ji me biparêzin. Ligel vê kûçikaniya xwe, em ji gelekan ji wan paqijtir in. Tirsa min ew e ku, bandora van pirtûkên ku bi şev û roj dixwîne, lê zêde bibe û navbera me xerab bibe. Pirtûkê li pey pirtûkê dixwîne, nimêj dike, rojî digire, bi saetan pistepista wî ye, bi xwe re diaxive. Wê rojê bi awirên min yên gazinok hisiya û bi ser min de hat:

- Hey ehmeq, ez ne tenê me, ez bi Xwedê teala re di têkiliyê de me. Li ser her milekî min firîşteyek heye. Yek gunehên min dinivîse, yek jî xêrên min.

Pirtûkên li ser jiyana pêxember tev li xwe civandibûn û ketibû nava wan. Di wan pirtûkan de hevokekê dilê wî şkênandibû. Pir dixwest ku ew hevok tine bûya. Ew hevoka ku pêxember xwe pêxemberê herî dawî binav dike. Erê eşkere nedikir, lê min pê derdixist bê çiqas vê hevokê xeyala wî şikênandiye û bêhêvî kiriye. Dixwest ku rê ji bo wî jî vekirî mabûya. Di xewê de, her şev, li hespên ronahiyê siwar dibû û ber bi perrê ezmên ve difiriya. Dixwest ew jî bibe firişteyekî cilspî û bifire. Di xewê de, her şev, baskên wî çêdibûn û her sibe gava xwe bê perr û basak didît, hêrs dibû. Nema kêfa wî ji destên wî re dihat. Bi ser her du destên xwe de diqîriya û ji wan dixwest ku bibin bask. Çend caran çû mizgeftê, lê pişt re nema diçe. Gava pirs di çavên min de dîtin, yekser bersiva min da:

- Bozo, li mizgeftê gava di nava bi dehan kesan de, di nava rêzên wan de, li pişt îmamekî nimêj dikim, bi xwe dihisim ku ez biçûk im û cihê min ne li vir e. Ez bi xwe dihisim ku ez mirovekî ji ronahî û nûra Xwedê me.

Perda xemgîniyê xwe davête ser çavên wî û di hundirê wî de dengê herifandina dîwaran dihat:

- Di wan kêliyan de ez pê dihisim ku ez jî yek ji wan hezaran, ji van milyonên mirovan im û hew.

Masî bi xwe û bi hişê xwe dikeniya. Ramana nêzîkbûna mirinê ya mirov her gav vediciniqand:

- Tu dizanî Bozo, li tuwalêtê ruhê min ji min diçe. Rastiya mirov di wir de baş xuya dibe ku, hundirê wî tijî pîsî û bêhna genî ye û divê rojane vala bibe. Mirov ev e, ez jî ew mirov im.

Masî gelek hewl dida ku neçe avdestxanê û zora vê adeta rojane bibe. Ne tenê ji bo wî zor bû, ji bilî wê, êşa zik jî li êşa giyanê wî zêde bûbû. Gava naskir ku, tenê mirin dikare mirov ji çûna avdestxanê qut bike, dev ji wan hewldanan berda. Nizanîbû ka çima di wir de mirin tê bîra wî. Siya vê ramanê jî her di ser serê wî re bû, eger rojekê ji rojan yek ji van organên wî yên ku ava zêde, tiştên zêde, di gewdeyê wî de dibin û tînin raweste, yan nema bi karê xwe rabe, wê yekser bimre. Mîna gêjekî di gerînoka van ramanên tevlîhev de dizîvirî û xwe davêt bextê pirtûkan. Rojekê, serê xwe ji nava pirtûkan derxist, bi her du destan êrîşî dîwêr kir û qîriya: Ez pêxemberekî têkçûyî me.
Piştî nimêjê, bêhna wî hinekî hat ber û vegeriya nava koma pirtûkên xwe. Neh-deh pirtûk nîvco hiştibûn. Di nava pêlên pistepista wî de, kêm gotin dihatin fêmkirin: Ezê bibînim.
Dema li kolanekê em pêrgî keçeke devliken bûn, hê di ser wê keftûlefa wî re du roj derbas nebûbûn. Ew cara yekê bû ez dibînim ku jinek li kolanê Masî bide rawestandin. Bê ku haya keçikê jê hebe, yan jî haya wî ji matmayîna min hebe, lêvên wî lerizîn û ricfeke sivik girt: Min ji te re negot ku ezê bibînim Bozo! Va ye ji wir ve tê.
Ez li bendê bûm ku dengê şkênandina camên hundirê wî bilind bibe, yan jî dilopek xwîn ji bêvila wî bê, lê yek ji van nebû. Bi her du destên xwe, hişk bi serê xwe girt û giriyekî ecêb girt. Di cihê xwe de rûnişt, giriya û hey giriya. Wê şevê, li malê jî, Masî xwarin nexwar. Wêneyê rûyê wê keçika beşişî dihat ber çavên wî û heta berê sibehê bi dengekî bilind giriya. Di nava giriyê wî re carna gotina ’dayê’ dihat bihîstin.

Mar û evîn cêwî ne

Bi bilindbûna dengê wî giriyê bişewat re, min naskir ku êdî derbê cihê xwe girtiye. Hebe tine be, ev girî yê evînê ye. Ji serboriyên xwe ez dizanim ku evîn tenê dikare wilo mirovan bide giriyandin. Ji her kesî pirtir ez marê xedar -hinek min wisa bi nav dikin- bi êş û xweşiya evînê dizanim. Evîn mîna mine. Çawa ku ez dikarim bi dizî û li ser zikê xwe, bê ku mirov pêjna min bikin, ji paş ve bi wan ve didim û di kêlîkekê de jehra min tevlî xwîna wan dibe û filitandina wan namîne, evîn jî wisa ye. Mirov navê xedir û bêbextiyê li vê taybetmendiya me dikin, lê nizanin ku ev bêbextî û pêvedana ji nişka ve sedema hebûna me ye. Bê wê, ne em mar, ne jî evîn wê tine bin, wê nikaribin xwe biparêzin û hebûna dewam bikin. Ev çend salên min in ku ez di bin mala Masî de dijîm. Dibe ku haya wî ji min tine be , lê haya min ji her tiştî heye. Ew min nabîne, lê ez heme. Ji bo me dîtin bi serê xwe kambaxiyek e mezin e. Dîtina marekî, yan pêvedan, yan rev, yan jî kuştinê bi xwe re tîne. Evîn jî wisa ye, mirov dibêje qey tine ye, lê piştî ku jehir dikeve nava xwînê, êş, yan kuştin rû dide. Mirov nû bawer dike ku evîn heye. Di vê derbarê de, li cem gelek mirovan, rûdanek heye ku mîna pêkenokekê ye, lê her û her dubare dibe. Ew jî ev e; mirovin hene nû ji kuştinê difilitin, yan ji jehirkirina xwînê rehet dibin; eger rehetî hebe, dibêjin; evîn tine ye.

Li cem Masî ez jî di nava gumanên hebûn û tinebûnê de me. Ji bo ku çermê xwe biguherînim, havîna derbasbûyî ez derketim ber rojê. Ji bo avêtina çermê kevin, min serê xwe li kevirekî da û hêdî hêdî kirasê xwe guhert. Di wê kêlîkê de pîra cîrana Masî di ber min re derket. Ez pê re negiham ku kirasê xwe yê kevin veşêrim. Pîrê ez dîtim. Hê ji veciniqandina xwe rizgar nebibû, min xwe bi selametî gihand qula xwe. Pîrê rahişt kalanê min û çû cem Masî. Tiştekî ku min jê bawer nedikir bû; li şûna ku Masî li kuştina min germ bike, dest bi şîretan kir. Temîniya min wiha lê dikir:
- Lawo Masî, guh bide min! Ez pîreke porspî me û ji te pirtir van tiştan zanim. Marek di mala te de ye, ew jî nîşana xêrê ye. Eger te dît, hewce nake ku tu jê bitirsî. Haya te ji te hebe, tu nekujî ha! Ev marên wilo bêzirarin. Xwedê ji bo xêra te şandiye vir. Hem nahêle mişk malê talan bikin, hem jî bav û kalan ji berê ve temîniya marên wilo kirine.

Heta demekê dilê wî mabû tasewas, lê piştre mesele hemû ji bîr kir. Cara din bi hêsanî min çermê xwe guhert û ez vegeriyam cihê xwe. Jixwe evîn jî mîna me maran, carna xwe nû dike, carna jî zivistan bi ser de tê, dicemide û bi ser hev de guvaştî û bêdeng dimîne.

Kumê li serê qederê

Ez ew kum bi xwe me, ewê ku qedera mirovan di wan kêliyên teng de dide serê xwe. Ew kêliyên ku tê de rê û rêçikên jiyanê ji nava hev derdikevin. Mirov heta sax be, dimîne girêdayiyê wan kêliyan. Dibe ku ew kêlî çend deqîqe bin jî, lê her û her di jiyana mirov de dibin sedemên guhertinên mezin. Di wan kêliyan de qeder min dide serê xwe û di nava cihê bûyeran de cih digre. Bi vî awayî mirovên ku ev felaket têne serên wan nikarin wê qederê bibînin. Bê ku zanibin destê qederê dirêjî jiyana wan bûye, di bin bandora wan guhertinan de dimînin. Ew kêlî ji bo Masî kêliyên kenê wê keçikê bûn. Di jiyanê de, dibe ku bi hezaran mirov li beşişandin û kenê wiha rast bên, lê ew hejandin careke tenê diqewime. Ji bo Masî jî ew car bi xwe bû. Pirsa ku agir di tenûra dilê wî de dadabû: Gelo, ew keçik kî bû?

Naskirina bersivê gelek li ber xwe neda. Mala ku keçik lê dima ji mala Masî ne dûr bû. Vê dawiyê nas kir ku mala xwişka wê ye û navê wê Berfîn e. Ji pişta sînoran bi malbata xwe re hatibû. Xwazgînî bûn. Eger li hev bikin, wê di hundirê mehekê de daweta birayê wê bikin û vegerin mala xwe. Mala wê li Serxetê bû. Bi zimanê xelkê 'Serxet' navê herêma Berfîn jê hatî bû, lê navê fermî Tirkiye bû. Masî hem kêfxweş û kelecan bû ku dilê wî lê xistiye bûye evîndar û hem jî xemgîn bû ku yara wî li paş sînoran e û ne ji derdora wî ye. Vê yekê Masî pirtir germ kiribû; piştî çûna wê ya Serxetê jî ku karibûya, wê têkilî biparasta. Ji ber ku roj zû derbas dibûn, Masî bi demê re ketibû pêşbaziyê. Ji bo avakirina bingehê têkiliya xwe dixwest berî gavekê kevirê yekem dayne. Bi xwe re dipeyivî:

-Tev de çend roj in, wê ev keçika xweşik û malbata xwe, bûka xwe ya Binxetî bi xwe re bibin û herin.

Ev bûyerên wiha, berî niha jî bi sedan çêbûne; kesên li vî aliyê sînor bi yên wî alî re dizewicîn. Piraniya wan nas û xizmên hev bûn. Bi dehên salan e ku ev sînor bi têlên ristî, bi mayînan û bi hezarên leşkerên nobedar hatine asêkirin. Carekê ji caran jî van zewacên di ser sînor re bala Masî nekişandibûn, lê vê carê tiştekî din bû. Masî dil hebû ku li dawetê hazir be û bi keçikê re vê şahiyê par ve bike. Ji ber wê bûbû çavdêrê çûnûhatina keçika beşişî. Cara yekê ku di pêşiya keçikê re derketibû, nava wê ji Bozo qetiyabû. Piştre bi xwe keniya û Masî ji Bozo xwest ku li ber lingên wê rûne û xwe li sola wê bide. Berfînê ev yek weke lêborînekê pejirand û ji wê rojê ve ji pirbûna lihevrasthatinên xwe û Masî şaş mabû. Vê dawiyê gumanên wê yên li ser hezkirina Masî zêde bûbûn, nexasim gava ku çav li hêstirên çavên wî ketibû. Berî ku Masî tiştekî bêje keçikê her tişt fêm kiribû. Vê têgihiştina bilez serê Masî tevlîhev kiribû. Piştî çend hevdîtinên kurt Berfînê ji Masî xwest ku Bozo li malê bihêle û pê re biçe mala xwişka wê. Mîna kesekî ku di bin bandora gêjbûna veciniqandinê de be, Masî dabû pey Berfînê û bûbû mêvanê mala xwişka wê. Her tişt bi lez û bez meşiya. Masî, hem ew, hem birayê wê yê zava û hem jî xwişka wê nas kirin. Ji her tiştî pirtir wêrekiya wê bala Masî kişandibû. Dizanîbû ku keçikên wê deverê ewqas ne biceger in, lê dibe ji ber ku mêvan bû dikariya wisa serbest tevbigere. Lê hinekî dereng be jî zanî ku ne mesela mêvandariyê ye; belê, keçikeke têgihiştî û xwedî ramanên cihê ye. Ji diyariya wê têgihiştibû ku dinyayeke wê ya veşartî heye. Diyariya wê pirtûkeke kevin û qedexe bû. Masî nizanîbû bixwîne, lê wê bi ken gotibû; wê rojek ku her kes bi vî zimanê qedexe bixwîne. Heta dema daweta birayê Berfînê hat, Masî derbarê wê û jiyana wê ya li Serxetê de hema hema her tişt zanîbû. Soz dabûyê ku wê hev wenda nekin û wiha jê re gotibû: Tu dibînî ka em çiqas nêzîkî hev in, rûbirûne û bi van sînoran jî çiqas ji hev dûr in. Lê roja ku ev sînor ji holê rabin wê bê… Wê ew roj bê…

Kêfa Masî bi van gotinên Berfînê pir dihat. Çawa ku di nava pêlên deryayeke bêbinî de, li kêştiyeke fireh û pirderî rast hatibe, xwe wisa didît. Dikir nedikir ji dîtin û axaftinên wê têr nedibû. Mesele gihiştibû radeya ku Bozo êdî her dem maddayî bû û ji mijûlbûna xwediyê xwe û kêmxewiya wî zivêr bûbû. Kar û barê Masî mabû hewldana xwendina pirtûkê. Pirtûk dixist destê xwe û derdiket. Pêjna Berfînê li ku dihat, ew jî diçû wir. Di her hevdîtinê de Berfînê çend hevok jê re dixwendin û mijar dizîvirî devereke din. Li ser her rûpelekî pirtûkê şûna pêçiyên Berfînê rengekî din, bêhneke din, çêjeke din dida. Her ku Masî lê rast dihat, xwendina pirtûkê dikir behane û bê zehmetî rê li ber danûstandinên dirêj vedibû. Pirsa ku Masî heyirandibû ev bû: Gelo, ew jî ji min hez dike, yan na? Carna bi baweriyeke mezin li wê evîna eşkere ya di nava destê keçikê de dirijiya dinerî û şa dibû. Carna jî bi dilekî sar û xemgîn li têkiliyên wê yên ku bi her kesî re xweş dinerî. Tirseke mezin di dilê wî de bû ku Berfînê rojekê here û ew perdeya li ser dilê wê neyê avêtin. Tenê yek rê li ber vekirî bû, ew jî ew pirtûka bêdeng û stûr bû.

Masî qewlikekî stûr -ku tenê ji bo pirtûkên pîroz dihatin çêkirin- ji pirtûka xwe re çêkiribû. Dema xwediyê pirtûkxanê pirsa qewlik jê kir, derew lêkir, got: Qewlikê Qurana min e. Ji dûr ve jî dema pirtûk di destê wî de dihat dîtin, ji her kesî weye ku Quran e. Ji ber vê yekê jê nedipirsîn. Ji bo wî ew pirtûk ne tenê çend tîp, çend hevok yan çend nivîs bû, na. Di pirtûkê de tîp ketibûn rengê agir, ji hevokan bêhna dilekî şewitî dihat û ji her peyvê cihokeke êşê diherikî. Êşeke kor, xweş, bijan û dijwar. Ew êş dibû nivîs û Berfînê jê re dixwend. Hem agir berdida bedena wî, hem jî aveke zelal nîşanî lêvên wî yên ziwa û qelişî dikir.

Weke ku xewnek be, dem derbas bû û roja dawetê hat, lê berî wê şeva henê bû. Li mala xwişka Berfînê qîr û qiyamet bû. Bûk ji bo guhestinê amade dikirin. Bi lîlelîl û stiranan dixwestin bi rê bikin. Bi hestên dizekî Masî tevlî şahiyê bûbû. Ji wî weye qey haya her kesî jê heye ku ji bo xwişka zavê hatiye. Nû ket hundirê hewşê çavên xwe li guliya Berfînê gerandin. Porê wê yê dirêj, bejna wê ya lihevhatî bilindtir nîşan dida. Ji nişka ve Berfînê ji pişt ve her du çavên wî girtin, ji ber xirecirê ti kesî bala xwe neda wan. Masî ji vê nêzîkbûna bilez şaş mabû. Sînorên di navbera wan de ku diviya bi salan ranebin, di hundir çend rojan de ji holê hatibûn rakirin. Çawa ku bi salan be hev nas bikin wisa tevdigeriyan. Bû sibeh. Dawetê dest pê kir û qediya. Roja din Berfînê Masî bir kêlekekê kaxizeke çarqorzî xist destê wî: Va ye ez diçim. Ji bo ku tu min ji bîr nekî ez vê diyariyê didim te. Piştî niha dibe ku em hev bibînin, dibe ku nebe jî. Bi gotina dawiyê re xemgîniyeke mezin ketibûn çavên Berfînê yên kenok û xweşik. Masî xwest ku li diyariyê binere, lê Berfînê nehişt, jê xwest ku li malê lê binere. Masî dixwest wê kêlîkê bi qemçika şevê bigire, di cih de rawestîne û nehêle ku sibeh bê. Dixwest çend salekî zeman ji bo wî raweste û ev bedewa ku bawer nake yên wisa li dinyayê hebin, çend rojên din, çend salên din nêzîkî wî be. Wê kêlîkê dixwest jê re bêje ku heta mirinê westiyaye û dixwaze serê xwe yê tevlîhev dayne ser singa wê û raze. Dixwest jê re bêje ku heta wê kêlîkê jî nizanîbû ka bêhn û çêja sînga dayikekê çawa ye. Dixwest bêje ku bi sedan, bi hezaran birînên qemûşgirtî di bedena wî de hene, bi çûna wê re wê hemû biteqin û qaşil ji wan bikevin. Dixwest li ber her du lingên wê xwe daqûl bike û tika bike, da ku li dilê wî bê rehmê û berî çûna xwe çareyekê jê re bibîne. Ew kêlîka dawî ya çûna wê wisa xemgîn kiribû heta wê radeya ku hêstirên kevirî di her çar çavan de hişk û lal mabûn, bê ku libek jî biherike. Berî ku here heta bi demeke kin jî Masî çûna wê ewqas zor nedidît. Çûnûhatina ser sînor hêsan didît, tev serêşandinê dema derb hat, cihê xwe girt û çûna Berfînê bû rastî, li ber çavên wî seranserê cîhanê hilweşiya. Têlên ristî yên sînor pitir li hev geriyabûn û ber bi perên ezmên ve bilind bûbûn. Mayînên li seranserê sînor hatîn çandin, hemû bi yek derbê di dilê wî de teqiyan. Wê şeva lal, mîna korekî berê xwe da min û ez ji ser serê qedera xwe avêtim ber lingên Bozo: Ezê vî kumî daynim ser serê Bozo û bidim pey qedera xwe. Berfîn, qedera min bû û ezê bidim pey.

Masî ez ji erdê rakirim û danîm ser serê kûçikê xwe. Kaxeta Berfînê dayiyê vekir. Berfînê serê guliya xwe jê re hiştibû. Kûçik li ber lingê wî mexel hat û kir kûzekûz. Heta Xwedê hêz

dabûyê bi sola xwe ya reş pê li teriya kûçikê belengaz kir û bi ser de çû: Ezê wisa bikim ku îşev kazîniya te di erşê heftan re derkeve Bozo! Ezê îşev yan xwe, yan te û yan jî vê qedera reş biperçiqînim, yan jî ezê hinekan bikujim.

Wê şevê heta berê sibehê, serê guliya jêkirî di destê wî yê çepê de bû û awirên wî li ser wê pirtûka ku nikarîbû bixwîne, rawestiyabûn. Qeder Masî, ez – kumê reşî bêdeng- danîbûm ber xwe û berê Masî wê şevê dabû riyeke tarî ku ne min zanîbû çi rê ye û ne jî kesekî ew rê bi selametî gihandiye serî. Riyeke heta tu bixwazî dûr, heta tu bixwazî dijwar û heta tu bixwazî aqûbeta wê ne diyar. Gelek nav lê dihatin kirin, lê hemû jî di yek peyvê de digihiştin hev. Ew peyv jî 'Evîn' bû. Berê Masî ketibû riya evînê ya bêveger. Ezê vê şevê careke din, cihê xwe li ser serê qedera Masî xweş bikim û bimînim li benda derketina rojê.

Pirtûka ku nehat xwendin

Ji roja min xwe di nava pirtûkên Masî de dîtî heta vê gavê, pirtûkên li her çar aliyên min çûne û hinekên din li şûna wan hatine danîn. Di rojên destpêkê de piraniya pirtûkên li derdora min yên olî bûn. Bergên wan stûr bûn. Li ser jiyana pêxember û dîroka olan bi dehan pirtûk hebûn. Hêdî hêdî Masî ew pirtûk ji cihên wan derxistin û nebedî kirin. Hinek pirtûkên din ku li ser civak û siyasetê bûn hatin şûna wan. Ji ber ku li cem xwediyê malê ez girîngtirîn pirtûk bûm, kêfa min pir dihat, lê ji aliyekî ve jî ji ber ku nikarîbû min bi hêsanî bixwîne ez xemgîn dibûm. Digel ku gelek caran li rûpelên min dinerî, dixwest tîpên min yên rêzkirî bixwîne, lê xwendina min ji bo wî her dem hesret bû. Pirtûkên ku dianîn hemû li ser azadî, wekhevî, dadmendî û hezkirinê bûn. Li şûna ku ev pirtûk nava wî û xwendina wî ya dibistanê xweş bikin, berûvajiyê wê nexweş dikirin. Nema sebra wî li pirtûkên dibistanan dihat. Bi tîbûneke bêsînor diket nava pêlên deryayên felsefe, zanîn, raman û wêjeyê. Pey re jî xwe mîna xwediyê kesên xizan û hejar didît. Xwendinê hevaltiyeke xurt di navbera wî û şevê de çêkiribû. Rabûn û rûniştina wî serûbin bûbûn. Dema xelk ji xewê şiyar dibûn, wî nû berê xwe dida doşeka razanê. Dema xelk hemû di xewê de bûn, çavên wî mîna du terektorên cot dikin, di nava kûrahiya hibra pirtûkên felsefîk de cot dikirin. Bi guhertinên di jiyana wî de, Bozo jî heyirî mabû. Nema zanîbû ka kengî raze û kengî rabe. Piştî çûna Berfînê, her çend rojan carekê diçû pirsa wê ji xwişka wê dikir. Heta ku pirsên di çavên xwişka wê de ew rawestandin û nema careke din biçe wir. Tiştin ku nedihatin fêmkirin ji Bozo re digotin: Ezê bi xwe rewşa wê bişopînim. Divê haya min roj bi roj jê hebe.

Ne Bozo û ne jî kesekî din êdî nizanîbû ka wê çawa ji her tiştê bi Berfînê ve girêdayî agahdar bibe. Min bala xwe didayê; piraniya pirtûkan mehên destpêkê bi kelecan dixwendin, ew piştre nîvco dihiştin. Ji Bozo re bihêrs digot:

- Guhertin bi xwendinê tenê çênabe Bozo! Divê em tiştekî bikin! Wisa ehmeq ehmeq çavên xwe beloq neke, ez jî nizanim ka ew tişt çi ye! Tenê dizanim ku hêzek mezin ji bo guhertinê pêwîst e…

Masî piştî çend rojan, hinek pirtûkên li ser bername û siyasetên partiyan bi xwe re anîn malê. Bin çakêtê xwe jî tijî belavokên siyasî kiribû. Heta berê sibehê bi wan pirtûk û belavokan ve mijûl bû. Geh bi Bozo re diaxivî, geh bi xwe re. Wan rojan çûnûhatin li cem zêde bûbû. Her çend rojan zilamekî porspî dihat cem, berî wî sê-çar kesên di temenê wî de jî hatibûn. Wisa xuya bû ku ew jî xwendekar bûn û zilamê porspî berpirsiyarê wan yê partiyê bû. Her du hefteyan carekê li hev diciviyan, lê di nav re jî çûnûhatina wan hevalên wî qut nedibû. Li derve, piştî ku bi tevayî Masî ketibû nava karê rêxistinê, endamên partiyan şaş û metel mabûn. Eger mirov endamên partiya desthilatdar dayne aliyekî, hema hema hemû ji bo peydakirina kar yan jî ji bo berjewendiyên biçûk û dûrmana ji zirara muxaberat û hêzên dewletê, xwe sipartibûn vê partiya ku zêdeyî sîh salî ye dewletê bi rê ve dibe. Jimara partiyên din roj bi roj zêde dibû, lê jimara endamên wan roj bi roj kêm dibû. Ji bo ku mirov van partiyan ji hev nas bikin, her partiyek bi navê kesekî bi nav kiribûn. Partiya Masî jî yek ji wan

bû. Wan rojan hindik mabû ku Masî Bozoyê xwe ji bîr bike. Bozo bi nûzenûz li ber deriyê wî diçû û dihat, nexasim di dema civînê de, weke ku wî biparêze tevdigeriya. Bozo hatibû şîretkirin. Dengê Masî bi ser ve bilind dibû:

- Eger tevgereke xerîb li derdora malê çêbibe, divê tu bi dengekî bilind bireyî.

Dema zilamê porspî kelecana Masî ji bo karê siyasî didît, ew jî li têkiliya bi Masî re germ dibû. Rojekê ji Masî xwest ku carê bi hev re biçin gundan. Piştî Masî naskir ku rêxistina partiya wî negihiştiye her gundî, her çenda xemgîn bûbû jî, lê digel wê jî bi kêfxweşî berê xwe dabû civînên gundên hevalên wî lê heyî. Riyên gundan ji axê bûn; hinek ji wan bi koncal bûn, hinek jê ji bo bikin bîton û qîr ji erdê bilind kiribûn.

Rojekê zilamê porspî û ziravik Masî li Biskilêteke kevin li dû xwe siwar kir û berên xwe dan riya gundan. Masî hêdî hêdî taybetiyên berpirsiyarê xwe yê porspî nas dikirin. Zilamê porspî ji ber ku nexweş bû her tim ziravik û hejhijî bû. Bavê deh zarokan bû û debara xwe bi dikanekê dikir. Dema dihat civînan, lawê wî yê mezin li şûna wî dikan vedikir.

Li ser riyên gundan gelek kûçik hebûn, lê bi ti awayî ne weke Bozo bûn. Hem birçî bûn, hem jî har bûn; gelek caran didan ser pişta rêwiyan bi wan digirtin. Her cara ku zilamê porspî li wan rast dihat, ji biskilêtê xwe dadiket û bi meşê ji wan derbas dibû. Ev şîret li Masî jî dikir:

- Bila haya te ji te hebe! Dema kûçikan êrîş kir, tu baz nedî! Her ku tu birevî, ewê bêtir bidin ser pişta te.

Masî bi ken bersiva wî da:

- Qey te ji bîr kiriye ku ez jî xwedîkûçik im.
- Erê, raste, lê kûçik hemû ne Bozo ne.

Carekê her du li ser biskilêtên xwe bûn, di ciheke bilind de diçûn. Bê ku haya wan ji kûçikan hebe bi hev re dipeyivîn. Ji nişka ve kûçikekî bi ewteewt êrîşî wan kir. Gîdonê biskilêt ji destên zilamê porspî filitî, ew û Masî bi ser hev de ji jora rê ber bi jêr ve gindirîn. Hêstir ketin çavên Masî. Lê ne ji ber ku êşiyabû, dilê wî bi zilamê porsipî şewitîbû, lewre hem nexweş, hem bavê deh zarokan bû. Her duyan xwe ji toz û tirabêlkê weşandin û riya xwe bi meşê dewam kirin. Zilamê porspî xwest ku Masî ji bin bandora ketinê derxe:

- Ev çi kûçikekî bêbext bû. Bi xwedê gelek biaqil bû. Niha fikiriye ku weke her car êrîşî me bike, wê tiştekî bi dest nexe. Ji ber wê vê carê bipilan hat me.

Her çendî zilamê porspî dikeniya, lê dîsa jî toz û tirabêlka wê veciniqandina ku kûçik bi wan re çêkiribû qermîçokên rû û eniya wî kûrtir û xemgîntir dikirin. Di rojên havîn û biharan de civînên xwe li nava bexçe û bostanan çêdikirin. Zivistan û payîzan jî di hundiran de, dûrî çavan civînên xwe digerandin. Vê dawiyê Masî tenê bi serê xwe diçû gundan. Lê hem ji bo parastina ji kûçikên li ser rê, hem ji bo ku sebra wî di rê de bîne, carna Bozo jî bi xwe re dibir. Ji deh salan vir ve gelek kes ji Serxetê reviyabûn û roj bi roj bandora karê wan yê siyasî di nava derdorên ku dûrî siyasetê bûn, zêde dibû. Peyvên 'Serxwebûn' û 'Azadî'yê li ser zimanê her kesî bû. Sihir û xweşikiya van her du peyvan serî mest kiribûn. Mîna pêlekê, çawa ku ji serê latekê xwe berde û deştê li ber xwe vekirî bibîne, wisa pêl berfireh herikî. Ava van pêlên tevlîhevbûyî hêdî hêdî gihişt bin lingên endamên partî û rêxistinan tevan û her tişt tevlîhev bû. Ji qerebalix û pevçûnan bigre heta bi guhjêkirin û kuştinê. Herêm serûbin bûbû. Her aliyî aliyê din tawanbar dikir û herûher qala ajantî, şer û pevçûnên mezin dibû. Hev rexne dikirin, li hev dixistin û endamên her aliyî ji hêla xwe ve civînên xwe digerandin. Ji kirina şaşitî, xerabî yan jî qenciyê bêtir, tevgera ku ketibû nava xelkê kêfa Masî tanî. Ya dilê xwe, di guhê Bozo de bi kenekî sivik digot:

- Ev pismamên me yên Serxetî, carna şaşitiyên mezin dikin, lê dîsa jî bêhna Berfînê, bêhna evîna min ji wan tê.

Di wê navê re Masî çûnên xwe yên gundan zêde kiribûn. Qerebalixa derve derbasê civînan bûbû û hevalên Masî diketin qirika wî. Bêbaweriya xwe bi sûdwergirtina ji karê siyasî eşkere

dikir. Piraniya hevalên wî, bi taybetî li gundan, dest ji kar berdidan û berê xwe didan çiyê. Carekê yek ji wan bi ser Masî de çû:

- Va ye şerê serxwebûnê li dar e. Ka em li vir çi dikin? Te bawer kiriye ku wê ev dewlet bi pelik û hibra belavokên me mafên me bide me?

Ji Masî dihat xwestin ku weke berpirsiyarekî xort, dîtinên partiya xwe biparêze, lê wî jî ya ku pê bawer bû, got:

- Maf tên standin nayên dayîn. Her kes dibêje; dijmin bi hêzê zimanê me qedexe kiriye, ji ber wê ne bi hêzê be wê ev maf bi dest nekeve. Mixabin guhên van dewletên ku em di bin desthilatdariya wan de dijîn, tenê dengê çekan û dengê zorê dibihîzin. Wê demê Masî bi xwe hisiya ku êdî tê guhertin; lê mirovekî weke wî nazik, çawa dikarîbû wisa bifikire. Bi xwe hisiya ku ew jî weke desthilatdarên van dewletên ku wî bi xwe ji wan nefret dikir, difikire. Piştî wê civînê li wî gundî ti hevalên wî neman. Zilamê porspî bi tundî ew rexne dikir:

  - Te berê wan hevalên me yên xort û xwîngerm da çiyê. Li şûna ku tu rêxistina me xurt bikî, hevalan zêde bikî, yên heyî jî çûn.

Masî bi xwe re û bi serê xwe yê tevlîhev re mabû heyirî. Biryar da ku êdî neçe gundan. Ji xwe re got:

- Berî ku hevalên min min ceze bikin û yekcar dilê zilamê porspî ji min bimîne, ya baş ew e ku ez hinekî bêhna xwe vekim. Wisa xuya ye ku ez gelekî westiyame.

Ev biryara xwe ji zilamê porspî re jî got. Weke herdem bi dengekî nizim û bi dilnazî biryara Masî pejirandibû. Ji wê rojê ve Masî vegeriyabû xwendina pirtûkên li derdora min. Pirtûkên li ser evînê û yên li ser siyasetê dixwendin. Vegeriyabû diyalogên xwe yên yekalî yên bi Bozo re û carna jî bi min re. Dema xeber ji Berfînê bihîstî, di ser mana wî ya li malê re mehek derbas nebûbû. Min ji xemgîniya wî ya kûr ya wê şevê naskiribû. Yekser berê xwe da min. Ez rakirim û bi du çavên ku çirîsk ji wan diçûn peyivî:

- Her deriyek bi mifteyekê vedibe. Mifta deriyê xwendina te, ew bixwe mifta dilê xwediya te ye û ew mifte jî li jor e, dûr e, di nava wan newal û çiyayên bilind de wenda bûye. Zîvirîna wî ya li pey van gotinan û axaftinên wî yên hişk ez tirsandim:

-Lê ezê bibînim.

Ez danîm cihê min yê berê, nava pirtûkan û bilez bê ku li Bozo binêre derket derve.

Sînorê ku dil perçe dike

Gava ku Masî derket û li min nezîvirî, min da dû:

- Min tenê bihêle Bozo!

Min xwe kir ku deng nayê min û min da bende wî. Berê xwe dabû sînor û dimeşiya. Divê ez li xwe mikur bêm ku ez ti caran mîna vê carê ji rewşa wî netirsiyabûm. Wisa xuya bû ku gelek tiştên nû di serê wî de diçin û tên. Nedixwest bi temamî dilê xwe ji min re veke. Her ku nêzîkî têlên sînor yên rêstî dibû, pirtir tirsê ez digirtim. Kesên bi van mayînên li seranserê sînor veşartî hatine kuştin, hatin bîra min. Li vir kî dixwaze xwe bikuje, mesele rehet e, ne hewceyî demançe û kêran e, tenê dikare çavên xwe bigire û berê xwe bide sînorê Serxet û Binxetê. Berî ku bigihêje wê xeta hesinî ya ku navê xwe li sînor kiriye, wê piçik û pariyên laşê wî li hewa belavbûyî bin. Min ramana xwekuştinê dûr xist, lê min dizanîbû ku ji sedî sed tiştek di bin zimanê Masî de heye û wê ji min re bêje. Ez tênegihiştim bê çima ewqas dudilî ye. Xuya bû ku xemgîn e, lê kêfxweşiya xwe jî venedişart:

- Bozo, ez kêfxweş im ku ev pêlên lalbûnê di nava xelkê me de nema ewqas berfireh dibin.

Ez bi xwe re birim serê girekî bilind û li aliyê bakur nerî:

- Ev erdê Xwedê yê fireh û xweş ku têra me hemûyan dike, binere çi kirine jê.

Mirovan bombe û mayîn lê çandine, perçe perçe kirine. Her perçe bi têl û mayînan pêçane da rê li ber mirovên din bigirin. Tu fêm dikî Bozo? Ez bi xwe vê hovîtî û ehmeqiya

mirovan fêm nakim. Tuyê çawa fêm bikî Bozo, kuçiko, rebeno! Ji wî aliyê mayînkirî direvin tên vî alî, li vî alî jî ji mayînan direvin dikevin zindanan û deriyên hesinî li wan tên girtin.

Masî bê ku haya wî jê hebe sedema giriyê xwe yê wê şevê eşkere kir:

- Keçeke nazik mîna Berfînê bi serê wan çiyayan ketiye. Tu zanî Bozo, nameyek ji du sê hevokan ji ku şandibû, ji çiyayê Gabarê. Çawa bîr bir ku bi birîndarekî re vê namê ji min re bişîne, ez nizanim.

Ji bo ku wan çend hevokan ji min re bêje min xwe li lingên wî da. Yekser têgihişt ku daxwaza min ew e:

- Tu çiqas mereqdar î Bozo! Kaxeteke biçûçik mîna kefa destekî ji bêrîka xwe derxist. Kaxeteke kevin û qermiçî bû. Bi dengekî nizim ji min re xwend:

- Li serê van çiyayên bilind, di ber bayê azadiyê yê hênik re tu hatî bîra min. Ji ber ku ez dizanim wê ev name bigihêje destê te, min xwest ez derbarê rewşa xwe ya dawî de te agahdar bikim, da tu nebêjî, çima Berfîn li min napirse. Silav û rêz.

Piştî ku Masî xwendina nameyê qedand, bi du çavên şil li dûr nêrî û bêdeng ma. Min xwest ez li ber dilê wî bidim û tîna bêrîkirin û hezkirina wî hinekî sivik bikim, lê ez li tiştekî din rast hatim. Wî li ber dilê min da û doza têgihiştinê li min kir. Min ji axaftinên wî fêmkiribû ku êdî roja xatirxwestinê hatiye û ne behsa rêwîtiyeke kin dike. Dixwest ji min re bêje ku wî jî bîra rojeke wiha nedibir, ji ber ku herdem di wê baweriyê de bû ku emê herûher bi hev re bin. Ez têgihiştim ji min tê xwestin ku di van rojên pêşiya me de ez debara xwe bi serê xwe bikim û li benda wî nemînim. Ji min re eşkere kir ku wê derî bigire û here. Jixwe kesekî wî tine bû ku xatir jê bixwaze, tenê ez bûm. Ez jî kûçik im, kûçik jî li van welatan bêxwedî ne, bêcih û bêwar in. Min xwest ez jê re bêjim ku ezê jî mîna bi hezarên hevalên xwe karim li debara serê xwe bigerim û carê binerim ka rewşa mala wî çawa ye. Ez di wê baweriyê de bûm ew jî têgihiştiye ku min biryara wî pejirandiye û ez jî mîna her hevalekî dilsoz, ji rojên teng re amade me. Di riya vegera ber bi malê ve nikarîbû baş li çavên min binere, lê min bi ewteewtên nazik li ber dilê wî da, digel ku ez ji wî xemgîntir û dilşkestîtir bûm. Ez kûçikê Xwedê yê kerr û lal, di nava van mirovên ku ji me nefret dikirin de, diviya ji wê rojê pê ve çi bi zorê, çi bi hêsanî be gepa nanê xwe bi dest bixim. Ji bo ku di şevên zivistanan de li wan cade û kolanên ku ji xwe re çêkirine, ji serma neqefilim, diviya ez quncikekê ji xwe re bibînim. Bi çi awayî be diviya ez xwe ji kevir, gule û bêbextiyên van mirovan biparêzim. Xwezî min karibûya tiştek ji Masî re kiribûya da ku ne min û ne xwe tenê nehêle, lê min dizanîbû êdî dereng e û fêda hewldanê nemaye. Minê çavên xwe ji dîtina Masiyê xwe têr bikirana û roja din sibehê bida ser rê û biçûma. Her car minê riya xwe bi mala wî bixista. Minê ji bo jiyanê li ber xwe bida. Digel ku temenê me kûçikan gelekî kin e jî, lê eger Xwedê emir bida, ezê li Masî vegeriyama. Eger nebûya û rê li ber min girtî bûya, sînor nêzîk bû. Mîna kûçikekî ji ruhê xwe aciz, min jî dikarîbû rojekê berê xwe bidim mayînên sînor û dawî li vê kûçkaniyê bînim.

Niviştа di bin çeng de

Li her derê mele, yan şêx niviştan ji xelkê re çêdikin, lê ya Masî wî bi xwe ez çêkirim. Masî serê guliya Berfînê ya diyarî wî kiribû kir hundirê paçikekî sêqorzî, paçik dirût û ez çêkirim. Benek bi min ve kir û mîna niviştekê ez xistim bin çengê xwe. Ji bo ku ti kes min nebîne gelek li min miqate bû. Lê amadekar bû, ku hinekan jê bipirsiya, wê bersiva wan ev bûya:

- Ev niviştek e, wê min ji guleyên bêbext biparêze.

Jixwe wî xwe ji rêwîtiyeke dijwar re amade dikir. Lazimiyên xwe amade kiribûn. Mabû li ser rojan ku haziriyên derbasbûna wî û yên weke wî biqedin. Di wê navê re çend caran li

zilamê porspî rast hatibû. Vî zilamî nema silav lê dikir. Gava hev didîtin, xwe dikir ku ew nedîtiye û qet Masî nas jî nake. Vê yekê birîneke kûr di hundirê Masî de hiştibû:

- Di navbera şev û rojekê de her tişt diqede. Heta tu di partiya wî de bî heval, dost û hezkiriyê te ye, roja ku têkiliya te bi partiya wî re qediya tu dibî kesekî ku ne hêjayî silavê ye. Tu dibî nîvdijmin.

Weke gelek kesên din, Masî jî ev birîn paşguh kiribû û bi amadekariyên xwe ve mijûl bûbû. Dixwest mifta deriyê xwe li deverekê veşêre. Dibe ku rojekê ji rojan vegere. Ji bo jiyaneke xweş ji Bozo re li riyekê digeriya, lê Bozo bi riya xwe ve çûbû. Heta jê dihat nedihişt ku haya pîra cîrana wî ji tiştên wî çêbibe, lê pîrê bi mereqdarî her tişt dişopand. Dem bûbû dema çûnê. Bi şev ber dîwarê xaniyê xwe kola û mifta derî di wir de veşart. Wê demê diçû nava malan, hem ji hêla siyasî ve perwerde dibû, hem jî li hin deverên taybet ku ji bo perwerda leşkerî hatibûn veqetandin, hînî bikaranîna çekan dibû. Havînê çiya, deşt û newal hemû xistibûn bin perr û baskên xwe yên germ. Masî xwe di nava komeke ku jimara wê gihiştibû bîst û heft kesan de dît. Hinek ji wan ji Ewrupayê hatibûn, yên din ji bajar û gundên cuda bûn. Wê rojê bi tirimbêlan berê xwe dabûn ava Dijlê. Li wir qeyik amade bûn. Ji bo ku di qeyikê de ji hev veneqetin, her pênc-şeş kes bi hev ve girê didan. Heta dehê şevê derbasbûna hemûyan qediya. Li aliyê din yê sînor rêber amade bû. Meşa ber bi çiyayê Cûdî ve dest pê kir. Bêhna şer ji derdorê dihat. Her yek çeka wî di destê wî de pênc şeş mitreyan li pey yê din dimeşiya. Helkehelk bi Masî ketibû. Ew cara yekê bû ku ewqas dimeşiya. Êdî roj li ber hilatinê bû. Li qûntara Cûdî dema gihiştin nêzîkî gundekî dehmal, saet ber bi pêncê sibehê ve diçû. Gundî hatin pêşwaziya rêza çekdarên ber bi gund ve diherikîn. Mast, nan, bacan û cigare bi xwe re anîbûn. Hemûyan xwe da ber darên li kêleka gund û ji bo taştê li hev civiyan. Hinek ji wan yekser di xew re çûn, hinekan jî dest pê kir lingên xwe û goreyên xwe şûştin. Wê rojê heta êvarê xwe li gund rehet kirin û piştre berê xwe dan çiyê. Du tiştan tirseke mezin xistibû nava Masî, yek ji wan pirbûna daran, ya din jî xuşexuşa avê bû. Masî ji xwe dipirsî:

- Eger niha lingê min bişemite, gelo, wê çi bibe û wê kî min ji mirinê rizgar bike?

Di wan kêlîkan de Masî bi navê xwe keniya:

- Masiyê ku nizane avjeniyê bike!

Ew cara yekê bû ku bi pêwîstiya zanebûna avjeniyê dihise. Di nava van çiyayan de ev av li çi yê xwe digeriya gelo? Masî ji hilkişandina bi çiyê ve pir hez dikir. Her du saetan carekê bêhna xwe vedikir. Carna ku li jorê dinerî dîsa mirin dihat bîra wî. Nizanîbû ku hatina van deran ewqas mirov nêzîkî mirinê dike. Xetera derdorê ne kêmî xetera tang, top û firokeyên şer bû. Mirin mîna bazekî çavlerizî li benda lingê şemitî bû. Nêzîkî mirov dibû û ji nişka ve pêjina wê wenda dibû. Gera li van çiyayan mîna lîstika bi mirinê re bû, lê ew bi xwe lîstika herî pîroz ya jiyanê bû. Dema tevlî şervanan bû, her yekî navê xwe yê nû ji hevalên xwe re pêşkêş kir. Dema Masî navê xwe got hinek pê keniyan, lê piştre êdî navê wî bala ti kesî nekişand. Nav ne giring bû li van deveran, ya giring germayiya giyan û vîna mirov bû. Masî ji xwe dipirsî:

- Gelo, navê Berfînê yê nû çi ye? Çawa nehatibû bîra wî ku ji xwediyê wê nameya kin bipirse.

Ew roj rehet derbas bû. Ber bi êvarê ve sê xortên biçek hatin. Rêzanê ku li pêşiya Masî bi çend gavan dimeşiya, ji nişka ve behsa Deriyê Keran kir. Tiliya xwe ber bi girekî mezin ve dirêj kir: Navê vî çiyayî Deriyê Keran e. Riyeke teng û bixeter e. Divê hayê we ji we hebe. Masî bi xwe nikarîbû, divabû ku li çîroka vî navî bipirse. Yê rêzan dixwest bala wan bikişîne ser zehmetî û dijwariya rê: Ji bo vî navî du çîrok hene. Yek jê ev e; zilamekî jinek bi kerekê revandiye û di wî çiyayî re derbas bûye. Çîroka din jî wiha ye; dibêjin; mirovê di vî çiyayî re derbas bibe halê wî dibe halê keran. Eger mirov ji ser bişemite, wê pêncsed mitreyî berjêr bikeve.

Masî pirseke din kir:

- Gelo, berî niha kesek ji wir şemitiye?

- Erê, heta niha sê kes şemitîne. Didu ji wan çûn, can dan, yê sisiyan sax ma. Me ew piştşkestî bi xwe re bir.

Berî ku reş bikeve erdê, xwe li Deriyê Keran xistin. Gihîştin girekî bilind. Di nîvê wê bilindayiyê, di nava meydaneke fireh de rasta kaniyeke zelal hatin. Masî mabû şaş: Ji ber ku gihîştina vî cihê bilind mirov ji tîbûnê dikuje, ev kanî bi zanebûn li vir derketiye. Li dora saetekê bêhna xwe li wir vekirin. Her yek ji wan barê wî digihîşt pazdeh kîloyan. Di çenteyê her yekî de nanek, du sed fîşek û lazimiyên şexsî yên mîna kêr, kevçik, sînî û hinek pirtûk hebûn. Hinekan jî helaw bi xwe re anîbû. Xwarina xwe bi hev re xwarin. Pişt re bîdonê avê dagirtin. Di kelekela wê germa Tîrmehê de meşa deh saetan li pêşiya wan bû. Rêzanê wan ew agahdar kirin: Ji vir heta wir av tine ye.

Meşa di dilê tariyê, di nava çavên germê de, dest pê kir. Her yekî tenê yê li pêşiya xwe didît. Saetek neqediyabû bîdonê avê vala bûyî. Biryar ew bû ku her du saetan bêhna xwe vekin. Tîbûneke ecêb bi hinavên wan girtibû. Piştî bêhnvedana yekê benê tîbûnê hêdî hêdî xwe li qirikên wan dipêça û dişidiya. Ji hemûyan pirtir yên ji Ewrupayê hatibûn zor dikişandin. Wisa xuya bû ku kesekî xwe ji bo mirina ji tîbûnê amade nekiriye. Bedenên ku xwêdan û ked didan, gavên dijwar, bilez û bi bawerî davêtin, av dixwestin. Masî hesabê birçîbûn û tîbûnê kiribû, lê wî bi xwe jî bawer nedikir ku stiriyên tîbûnê ewqas bi dijwarî xwe ji qirikê berdidin nava nermayiya giyanê mirov. Tîbûneke wisa bêserûber, bêdilovanî û bêhedan di jor de li serî dixist, di jêr de mîna êşeke veşartî xwe berdida hundirê kabokan û bedena wî sist dikirin. Piştî şeş saetan çend kesan xwe avêt erdê û êdî nemeşiyan. Bi lavelav û bi zorê hevalên wan radikirin ser piyan, lê piştî demekê ziwabûna qirikê êdî rê nedida hilimkişandinê. Ziwabûnê tameke tal berdabû qirikên wan. Pencên tîbûna hov şopa xwe li ser her endamê gewdê her yekî ji wan hiştibû. Tarî bi çiyê ve diherikî û şev jî pê re bi pîpelkên mirinê ve ber bi perên ezmên ve hildiperikî û xwe digihand lingên sibehê. Berê sibehê, ji jora çiyê Masî li newalê nerî. Newaleke kûr û dirêj bû, ji dûr ve agirekî biçûçik xuya dikir. Gav bi gav agir geştir dibû û armanc nêzîk dibû. Di rê de hergav yên kevin ji yên nû dixwestin ku avê hindik vexwin, lê tîbûnê rê nedida guhdarîkirinê. Ji nava komê tenê diwazdehan xwe gihand cihê xwe. Yekser li avê pirsîn. Berî ku vexwe, Masî xwest avê ji yên di rê de mayîn re bibe, yekî ji wan ew şiyar kir:

- Pêşî vexwe, pişt re ji yên din re bibe! Nexwe wê hemû vexwin û tê tî bimînî.

Dengekî din bilind bû:

- Avê bigihînin wan, av negihe wan wê hemû bimirin.

Li ser wê gotinê av ji wan masiyên tî re hat şandin. Masiyên ku avê bi bandora xwe ya sihirbaz di bedenên wan yên tî de ew ji hawhaw xistibûn, niha jî ji bêbextî û xedra tîbûnê diparastin. Hemû gihîştin hev. Li wir, nêzîkî gundikekî vala şkeftek hebû, av tê re derdiket û cihê razanê jî tê de hebû. Du rojan xwe li wir rehet kirin. Roja sisiyan berê wan li wargeha Bestayê bû. Divabû Masî û yên pê re baş hînî bikaranîna çekan bibin. Ji komê hin ketin rê, çar ji wan jî li wir man. Li ber tehtan amadekariyê razanê kirin. Kefiyên xwe, giyayê hişk û çadir ji xwe re kirin mitêl û doşek. Yên kevin ji yên nû re behsa dijwariya jiyana wir dikirin. Bi bêtêlê fermana vegera ber bi Cûdî ve hat. Hevalên wan yên keşfê ji wan re gotin; kemîn li ser rê heye. Li ser riya vegerê bexçeyekî xiyaran hebû, têr xiyar xwarin û piştî demekê careke din agahiya vebûna rê ji wan re hat û meşiyan. Gava Masî gihîşt wargeha mezin ku bi sedan şervan lê hebûn, hemû lê civiyan. Mîna herkesê ku nû dihat, yên li wir dihatin pirsa malbat û nasên xwe jê dikirin.

Li wir perwerdeya bikaranîna çekên cuda didîtin. Masî bi dilekî germ hîn dibû. Piştî qedandina dema perwerdeyê Masî dan beşa lojîstîka herêmê. Diviya xwarinê (erzaq) ji gundan bînin. Ji bo wî karî hêstir amade bûn. Masî û hevalên pê re, hêstirên xwe dan pêşiya xwe birin li ser kaniyê girê dan û berê xwe dan gundê Gîverê. Gundiyan ji bo wan ji bajêr erzaqê weke ard, şekir, birinc, rûn, savar, xwê, nîsk, ava bacanan û pîlên ji bo bêtêlan dikirîn. Bihayê wan didan gundiyan û bi hêstiran erzaqê xwe dikişandin wargehê. Erzaqê zêde

dixistin nava naylonan û di bin erdê de vedişartin. Carna neçar diman diçûn gundên dûr. Carna sê şevan di rê de diman. Pişta hinek hêstiran birîn dibû. Di wan riyên dirêj de carna hinek hêstir di bin barên giran de diketin. Hinek jê dimirin. Bala Masî zêde dikişandin. Carna Bozo dihat bîra wî, lê baweriya wî ew bû ku piştî şervanan, di nava wê keftûlefta çiyê de kedkarên herî mezin hêstir in. Dema hêstirek diket, barê wî li wir vedişartin. Wê rojê ava Çemê Rîsor ku ji Çiravê derdiket û diçû Bestayê, ketibû pêşiya wan. Zivistanê berî dema xwe li wê herêmê xwe bi cih kiribû. Hevalên Masî bi hêstiran li çem xistin çûn aliyê din man li benda wî. Hêstira ku Masî dixwest lê siwar bibe, dîn bû nedihişt nêzîk bibe. Masî bi hefsarê wê girt û xwe avêt ser pişta wê. Hêstirê xwe ji bin kişand, li avê xist û bi tena xwe derbasî aliyê din bû. Hevalên wî neçar man ku hêstirekî din jê re bişînin. Vê carê avê zora wî û hêstirê dibir. Berî ku bigihîje dawiyê, Masî xwe avêt, lingê wî şemitî. Kefiya wî û çeka wî ketin nava avê. Eger di wê kêlîkê de hevalên wî pê ve nehatibûna, wê av û av biçûya û her tişt ji bo wî biqediya. Tiştê ku nava wî ji zivistanê diqetand şemitandin bû û ew jî bû. Cilên wî şil bûbûn. Bayê sar ricfeke xedar xistibû nava wî. Heta gihîştin Besta cilên wî, sola wî hemû bi hev ve bûn qeşa. Reqreqa diranên wî bû. Êşeke lal bi qurmê zimanê wî girtibû. Dixwest wê kêlîkê destê xwe bide min û binere, bê ez nivişta wî, şahida kul û derdên wî, li cihê xwe me, yan na. Tiliyên wî bi ya wî nedikirin, lê bi nêzîkbûna min a ji bedena wî re dihisiya. Masî birin binê çadireke naylon. Hinek êzing xistin sobeyê agir pê xistin. Tîna êgir dilê wî geş dikir. Di wê demê de Masî ne di rewşa xwe de, di rewşa Berfînê de diramiya. Nizanîbû ka çima agir Berfîn aniye bîra wî. Ji ber ku li wir mirov bi tesadufî sax diman, ji nişka ve bi şemitandina ling re, yan bi derengmayîna gavekê re, mirinê pencên xwe davêtin nava çavên mirov. Ditirsiya ku hêviya xwe ya hevdîtinê wenda bike. Ew bizotikên agir mîna evîna xwe û ew xweliya ji ber dima mîna dilê xwe didît. Tenê yek hevok ji nava lêvên wî yên lerzok, tîp bi tîp, dipekiyan nava xweliya ku ji ber wê pevçûnê dima, pevçûna serma çiyê û germa êzingên pêketî:

- Ez ê bibînim.

Lingê bisol û rihê pêxwas

Berî ku Masî bi ser van çiyayan bikeve, dema ji kesekî hêrs dibû, digot; ha ew, ha sola min. Ev jî nîşana bêqedirbûnê bû. Niha rewş hatibû guhertin. Giringî û pêwîstiya min -ya solênayê veşartin. Dema, mîna min, tu sola şervanekî bî, ev tê wê wateyê ku girêdaneke mezin di navbera te û xwediyê te de heye. Girêdaneke wisa ku dişibe girêdana darê bi axê û ya zarokê bi dê ve. Çawa ku dayikeke dilnazik zaroka xwe ji tîrên serma û seqemê diparêze, wisa min jî lingê xwediyê xwe ji cemedê û xwînrawestandinê diparast. Li ser kevir û tehtan, li ser berf û qeşayê, di binê şikeft û zinaran de, li her derê min meşa xwediyê xwe, Masiyê xwe rehetir dikir. Li vir çavên Masî li vê rastiyê vebûn ku tiştên biçûçik ku li malê bala wî nedikişandin, li vir roleke mezin di hebûna jiyana wî de dilîstin. Li malê, carê du sê solên wî çêdibûn. Yek davêt û yek tanî bê ku ev guhertin wî rawestîne, lê li vir her ez im û hew. Piyên xwas û çiya li hev nakin. Masî bi rola kesên din jî hisiyabû. Ne ji hevalên derdora wî bûya, niha yan laşê miriyekî yan jî mirovekî fetisî û xwarina masî û lawirên çem û çiyayan bû. Ku ne ji van gundiyan bûya, wê jiyana wan hema hema di bin tehdîda mirina ji tîbûn û birçîbûnê de bûya. Carna jî tenêtî mîna tajiyekî birçî, zimanê xwe jê re derdixist. Rojekê baran ji erd û ezman dihat. Ewrên bi ser reş ve, yên mîna lawirên ji pemboyekî tozgirtî ku bahoz lê rabûbe, li nava hev ketin. Masî di gel hêstirekî spî li dûrî gundê Gîverê mabû. Li wê devera hemberê Şirnexê, ku hemû kevirên sipî ne, rê wenda kiribû. Tenê bi şev mirov dikarîbû di wir re derbas be. Hat bîra wî ku hêstir rê nas dikin. Hema xwe hişk bi teriya wê ya sipî girt û da dû. Hêstirê lezand û dest bi bezê kir. Masî terpilî û teriya hêstirê ji destê wî filitî. Di nava bêdengî û tariyê de Masî tenê ma. Ji ber ku lingên wî li keviran diketin, têgihîşt ku ji rê derketiye. Her du destên xwe dan ber devê xwe û dengê guran derxist, pişt re jî yê wawîkan. Wî û hevalên xwe wisa li hev kiribûn; yê wendayî, ji bo dengê xwe bi hevalê xwe bide bihîstin, divê dengê gur û

wawîkan derxe. Ti bersiv nehatin. Masî çavên xwe li tehtekê gerandin, da ku xwe bide ber talda wê û ji derbên xedar yên serma û barana bênavber bê rizgarkirin. Xwe da ber tehtekê, lê şilî û sermayê rê neda ku lerz ji nava wî derkeve. Bi zorê qutî ji bêrîka xwe derxist. Pel şil dibûn. Çeqmaq pê nediket. Bi keftûlefteke mezin cigare pê xist. Demeke dirêj hem baranê û hem jî lerizandina Masî dom kir. Dom kir heta ku baran sekinî û ezman vebû. Bi derketina sibehê re berê xwe da gundê Gîverê. Dema gundî çav pê ketin, tirsiyan ku ketibe kemînê. Wê rojê heta êvarê ma li gund. Hevalên wî pê re hatin û bi wan re çû. Her roj civînên kin hebûn û heftê carekê yên giştî. Di civînê de çav hemû li ser Masî û wendabûna wî bûn. Hevalên wî ew rexne kirin û pênc roj ceze danê. Ceze wiha bû; diviya di metbexê de xwarinê çêke. Roja yekê ji cezeyê Masî bi mizgîniyekê dest pê kir. Hevalên wî li ser riya Şirnexê, li herêma Sêrtê dest danîbûn ser du kemyonên xwarina leşkeran, ajovan jî dîl girtibûn. Bi bêtêlê xeber şandin: Hêstiran bînin. Her cureyê xwarinê bi dest xistibûn; ji goşt bigire heta bi hêk, mêwe û pakêtên cigareyan. Ji lez û bezê ji ber ku hêk xistibûn têran, hemû şkestibûn. Rêbaz li wir ew bû ku bê destûra xwarinçêker ti kes derbasî metbexê nebe. Vê bûyerê hem zehmetiya cezeyê wî sivik kiribû, hem jî di pênc rojan de nêzîkî pênc kîloyan li xwe zêde kiribû.

Cezayê Masî zû qediya. Vegeriya nava hevalên xwe, lê her du ajovanên dîl di bala wî de mabûn. Gava ji hevalên xwe pirsî, bersivê kêfa wî anî:

- Rojekê ji rojan me dîl nekuştine.

Piştî çend rojan her du ajovan berdan. Masî bi dilekî germ li benda hatina Newrozê bû. Tenê Bozo jê kêm bû. Ji xwe re digot; ku rewş wiha be, Bozo jî dikarîbû li gundê Gîverê bi cih bibûya. Lê li vir cih ji gumlekan bêtir tên guhertin.

Newroz bi gundiyan re pîroz kirin. Bi hev re agir pê xistin û li dorê stiran gotin. Roja din du firokeyên şer di ser gund re firiyan. Gundiyên Gîverê hinekan kewarên mêşên xwe sererast dikirin, yên din jî bi debara xwe daketibûn. Masî bêhna mirinê dikir, lê hevalê wî gumanên wî dûr dixistin:

- Na lo, ev firoke gelek caran derdikevin, digerin; digerin pişt re vedigerin cihê xwe.

Hê gotina wî di devê wî de bû, roket ji firokeyan hatin xwarê. Bi bayê roketan xanî hildiweşiyan. Qîr û qiyamet li gund rabû. Masî li gel çend hevalên xwe ber bi çem ve beziyan. Ji bo ku xwe bidin ber, li tehtan digeriyan. Li kêleka çem Masî xwe da ber tehtekê. Du jinan li wir cil dişuştin. Wan jî dixwest zû vegerin gund bi zarokên xwe ve herin. Masî gazî wan kir:

- Neçin, neçin!

Yekî ji wan bitirs bersiv da:

- Em ê herin zarokên xwe bînin.

Her du jinan guh neda Masî û çûn bi hawara zarokên xwe ve. Çûnûhatina firokeyan berdewam dikir. Piştî roketan, qazanên ku giraniya wan zêdeyî tonekê bû davêtin ser gund. Bi avêtina qazana pêşî re gund di nava toz û dûmanê de ma. Firoke nizim dibûn û mal, mirov, lawir, giya û her tiştê di bin xwe re hildiweşandin. Roketa dawî li şûna her du jinan ket. Masî serê xwe ji ber tehtê derxist û bê ku toz bihêle bê çi bûye, çavê xwe li wan gerand. Nikarîbû bawer bike ku ewqas bi lez û bez mirin bikare bi ser mirov de were. Xwestekeke ecêb wê gavê xwe berdabû hinavên wî. Dixwest ew hesinên kor ku mirina reş dibarandin bibin sedema kuştina wî jî; dixwest ku wê kêlîkê bimire. Ji ber tehtê derket û ber bi gundê hilweşiyayî ve çû. Dixwest ku roketek berê xwe bide wî jî. Ew cara yekê bû ku dilbijokiyeke wisa hovane dilê wî diguvaşt. Firoke dûr ketin û li pey xwe malên xerabbûyî, mirovên kuştî, perçeyên destan, yên lingan, seriyên bêlaş, destên zarokên hê negihîştîn bi lîstikan bilîzin, hiştibûn. Hinek gundiyên sax mayîn bi ser Masî û hevalên wî de qîriyan:

- Ka, ma ne we digot; em ê we biparêzin?!

Gundiyekî çavên xwe xistin çavên Masî:

- Em ê herin bibin qorocî.

Ji hêla din de yekî bikîn bang dikir:

- We digot; hûn di bin parastina me de ne.

Yekî din jî dixwest berê hêrsa gundiyan ji ser Masî û hevalên wî bide alî:

- Ma ewê çi bikin? Em doza serxwebûna welatekî dikin, jixwe emê bên kuştin.

Kalekî cilbitoz, weke ku nû ji tenûreke pêketî derketibe, berê kopalê xwe ber bi kuştiyan ve kir:

- Ka em termên xwe veşêrin, dû re meseleyên xwe safî bikin.

Masî şaş mabû. Berî saetekê ev mirov hemû li wan deveran diçûn û dihatin, dikeniyan û behsa xewnên rojên xwe yên ku wê hê bên, dikirin, behsa zarokên xwe û gava mezin bibin ka wê ji wan re çi bikin, dikirin. Ev çi qewimîbû û her tişt tevlihev kiribû, niha jî diviya ku Masî beşdarî binerdkirina wan bibe. Hinek ji gundiyan bi birîndaran ve çûbûn, yên din, Masî jî di nav de, bi kuling û bêran du koncalên dirêj kolan. Yên sax mayîn termên miriyên xwe yên jihevketî di nava naylon û betaniyan de kom kirin birin mizgefta gund. Piştî ku li ser miriyan nimêj kirin li pişta xwe kirin, birin di koncalên dirêj de li kêleka hev veşartin. Firokeyan li gundên wê deverê tevan xistibû, lê ji her deverê pirtir zirar gihandibûn Gîverê. Ji dûr ve sê terektorên tijî mirov xuya kirin. Qorociyên gundên derdorê bûn, hatibûn li halê mirov û nasên xwe bipirsin. Ji bo ku şerekî nû dernekeve û kuştiyin nû çênebin, Masî û hevalên xwe muxtarê saxmayî şandin pêşiya wan ve. Ew jî ne bi niyeta şer hatibûn. Gava daxwaza muxtêr pejirandin û hatin gund, yekî ji wan berê xwe da Masî:

- Nebêjin we çima rahiştiye çekên dewletê, em mecbûr in.

Hatibûn da gundiyên Gîverê yên saxmayî bi xwe re bibin, lewre dijmin kevir li ser kevir nehiştibûn. Ew man li cem hev, hêdî hêdî Masî û hevalên xwe jî ber bi Bestayê ve bi rê ketin. Careke din tîbûnê benê xwe li qirika Masî şidandibû. Êdî qonaxeke nû ji bo jiyana wî ya wir dest pê kiribû. Gund, yan vala dibûn, yan jî dibûn qorocî. Tenê yek hêvî winda nekiribû, ew jî rasthatina li Berfînê bû. Nehatina wê hevdîtinê wisa dikir ku çêjeke tal di bin zimanê wî de cih bigire. Tîbûnê dev jê bernedida. Carna dihisiya ku av hebe nikare vexwe, lê herûher tî bû û tiştekî nikarîbû tîbûna wî bişkîne. Tîbûn bûbû siya wî, bûbû cêwiyê wî. Cêwiyekî cilreş, sergirtî û çavsor. Ji ber ku di nava tîbûn û mirinê de şaş mabû, nizanîbû kîjan ji wan ew e; nikarîbû rûyê cêwiyê xwe bibîne. Hevalên wî jê re behsa dijwariyên ku wê bi ser wan de bên dikirin. Bêhna pilanên generalê pîr ji nav bêhna mirinê bilind dibû: Ev gund ji van masiyan re mîna deryayê ne, ava wan ya jiyanê ne. Ji bo masî bêne qelandin divê av bê miçiqandin.

Berê ew tenê masî bû, lê niha hemû bûn masî. Diviya hemû debara xwe bê derya û bê çem bikin. Şerê giran êdî bi tîbûnê re bû. Diviya her masî ava xwe bi xwe peyda bike.

Destê wî çû ser niviştа wî. Dixwest hêza niviştê ji nava paçik derbasî rayên wî bibe û karibe heta dawî li hemberê mirinê li ber xwe bide. Bi tiliyên xwe yên qerimî serê guliya Berfînê guvaşt û hêstir herikîn çavên wî. Nehişt hêstirên wî dakevin. Dilê wî bi wî û bi xelkê wî, bi her du jinên ku cil dişuştin, negihtin bi hawara zarokên xwe yên kuştî ve herin, dişewitî. Dilê wî bi dê û bavê wî yên ku negihatin wî mezin bikin, dişewitî. Dilê wî bi wî û bi her tiştî dişewitî. Dilê wî di nava tevnên pîrê de, yên ku qedera wî ya nediyar diristin, dihat guvaştin. Dibû giriyekî nedîtî û bêdeng, hêstirên wî dibûn kîn û şewat, dibûn nefret û hezkirin, dibûn hêz û şkestina giyan. Giriyê wî ne giriyekî xemgîn, ne jî giriyê sêwiyekî bû. Giriyê wî giriyê şervanekî bû. Giriyê şervanan jî, mîna giriyê ji ber êşa piştê ye. Giriyekî xedar e ku bêhna xiyanetê li pey xwe dihêle, xiyaneta dil bi serî re, ya giyan bi bîr û baweriyan re û berî hemûyan xiyaneta her tiştî bi ruhê mirov re. Wê rojê dixwest ku neynikeke mezin li ber hebe û xwe tê de bibîne. Ji jêr ve li serê pozê min dinerî û awirên xwe ber bi jor ve dibirin. Li şalê xwe yê fireh, li şûtika xwe, li çeka xwe: Tu keça lalbûnê yî.

Bi çeka xwe re dipeyivî:

Dengê kesên lal naçe hev, lê dengê te diçe hemûyan.

Masî li min nerî û keniya. Zanî ku min guhên xwe ji bo bihîstina dengê wî bel kirine. Demeke dirêj bû dengê çekan, yê xerakirin û mirinê nehiştibû ku dengê wî bê guhê min. Ji ber ku di nava wê qîreqîr û hawarê de min xwe hişk bi lingên wî girtibû û heta ji min dihat min

diparastin bi du çavên memnûn li min dinerî. Ji nişka ve kenê li ser lêvên wî vemirî. Çav li çend peşkên xwînê yên li ser çermê min hişk bûyîn, ketibû. Min jî nizanîbû ka xwîna kê ye û ji ku hatiye, xwîn ketibû şeklê devekî vekirî û hişk bûbû. Wî devê vekirî dixwest tiştna bêje, lê nikarîbû. Wisa ji min ve xuya bû ku wê rojek bê û ew devê vekirî û ziwabûyî bêje û hey bêje. Wê çîroka xwediyê xwe yê nenas û jibîrbûyî bêje.

Devê vekirîmayî

Haya ti kesî ji min tine ye, ez kevirekî avêtî yê li ser vî sînorê Xwedênenas im. Kevirê ku êşê ew nerm kiriye û mîna mirovekî ew hînî girî û ken kiriye. Kevirê ku ew jî dikare gotina xwe bêje. Dikare mîna tayekî ku bi agirê şixateya destê zarokekî bişewite. Dikare bibe kulmek ar, bi bahozeke kor re bifire û bikeve çavên xelkên derdora vî sînorê bêdawî. Dikare bibe şahidê terpilandin û beza Masî, dikare bibe şahidê vê xwîna ku li van derdoran bênavber diherike. Ew xwîna li ser sola Masî ziwa bûyî xwîna kê bû? Bersiva vê pirsê ne diyar bû. Dibe ku xwîna zarokekî be, ya kalekî, an pîrekê be, yan ya Masî bi xwe be. Ev xwîn xwîna kesekî ye ku ne ev cihê lê çêbûyî hilbijartiye û ne jî dema ku tê de dijî bi dilê wî ye. Ev lihevrasthatinek bû û va ye bûye devekî vekirî û dibêje:
Dema Masî zarok bû, dixwest rojekê ji xewê rabe û bibîne ku bask pê ve çêbûne û bûye teyrek. Her şev di xewna xwe de difiriya û her sibeh gava dixwest bifire lê destên wî nedibûn bask, hêrs dibû. Vê dawiyê naskir ku êdî nikare bibe teyr; îcar dixwest bibe pîlot. Ew zarokê ku firokeyên şer di jor de bombe bi ser serê wî de dibarandin, dibe wî jî xwestibe ku rojekê bibe teyr û bifire. Dibe ku berî ew pîlot bê û wan qazanên barûdê bavêje nava serê wî, xwestibe ew jî rojekê ji rojan bibe pîlot. Ne ji bo qazanan bavêje ser serê xelkê, tenê ji bo karibe bifire. Dema di xewnê de didît ku ew jî bûye pîlot, lê pîlotê ku li jora wî difiriya, ew kuşt û xewna wî jî pê re. Dibe ku derfet hebûya, wî zarokî ji wî pîlotî re wiha bigota:
- Ji kerema xwe bihêle ku ez hinekî din mezin bibim.

Masî ji xwe dipirsî; gelo, ewê pîlot dizane ku ew jî rojekê zarok bû û di xewna xwe de difiriya? Gelo tê bîra wî gava ku zarok bû û li derve dilîst, li malê jî dê û bavek li benda vegera wî bûn? Her ku Masî çeka xwe ber bi yên li hemberê wî şer dikirin ve dikir, hestin tevlihev digirtin. Ne li xwe, li dê, bav, xwişk, bira û zarokên qatilê li hemberê xwe difikirî. Carna ji xwe re wiha digot:
Ezê bi vî halî nikaribim şer bikim. Lê gelo, ew dizanin ku her yek ji me jî yan yarek, yan dilê diyekê yan jî çavên zarokekê li benda wî ne? Dema yê pîlot her du jinên ku cil dişuştin, kuştin, gelo, diya wî nehate bîra wî? Gelo, zanîbû ku dayîkê ji zarokên xwe re gotiye: Ez ê cilên we bişom û bêm. Û wî bi xwe nehişt ku ne dê vegere û ne jî zarok cilên şuştî û paqij li xwe bikin. Di serê xwe de hizir dikir, hewl dida ku bi qepera bersiva vê pirsê bigre: Gelo, qedera min ez anîme vir, yan têgihîştina min? Carna jiyana xwe ya derbasbûyî bi tevayî ji bîr dikir. Jê weye ku ji roja roj ve di nava vî şerî de ye. Pirsa ‘eger Berfîn tine bûya, wê tevlî vî şerî bibûya’ serê wî tevlîhev dikir. Hatibû vir ji bo ku Berfînê bibîne, an ji bo tiştekî din, an jî her du bi hev re ne? Bi sedan pirs diketin rengê zilamekî û wî zilamî bi hevsarê ramanên wî digirt û ber bi paş ve dizîvirand. Bêriya Bozo kiribû. Dixwest erd biqelişe û Bozo jê derkeve, were cem. Dixwest bi hinekan de bipijiqe, lê kesek nedidît. Dema roket û qazanan xanî xerab kirin û mirov kuştin, veciniqîbû û giriyê wî di qirika wî de ziwa bûbû. Hêdî hêdî ew veciniqandin sivik dibû; dibû kîn, dibû nefret û hezkirin, dibû bêrîkirina ken û hêstiran, dibû xwesteka axaftina bi Bozo re. Dixwest ku Bozoyê qafreş li wir be, da ku pê li teriya wî bike û jê re bêje: Ezê wisa bikim ku qajîniya dîrokeke qehb û bêwijdan ji te bê. Ezê vê teriya te ya reş jê bikim û li qirika vê dîroka em anîn vir, bigerînim û bişidînim, heta ku ruhê wê di qûna wê re derkeve. Bila zarokên me jî, weke me, nebêjin sûcê bav û kalên me bû. Dixwest wê kêlîkê Bozo di wir re derkeve, da ku bişîne ser gora bavê xwe yê qaçaxçî û li ber serê wî bike

ewtewt, da ku ji mirinê rabe û were li lawê xwe yê hêrsbûyî guhdarî bike: Diviya we ev şer kiribûya, em niha baca bêdengiya demdirêj ya bav û kalên xwe ji xwîn û xwêdana eniyên xwe didin.

Masî nizanîbû ku Bozo wê gavê li kolanan li benda hatina şevê ye, da ku derkeve li debara xwe bigere. Ji hêlekê ve bêwarî û birçîbûn, ji hêla din ve jî pîrbûnê ling lê sist kiribûn. Li qorziyeke bajêr, li ber talda dîwarekî her du lingên xwe yên pêşî dirêj kiribûn û serê xwe danîbû erdê. Jiyana wî ya berê ya bi Masî û malbata wî re dihat ber çavên wî yên xilmaş. Ew bîranîn, mîna mêşên mekroh, li dora serê wî diçûn û dihatin, xew ji çavên wî direvandin.

Dara malbatê ya şaxşkestî

Heta niha tênegihiştime bê çima Masî hem xwe şerpeze kir û hem ez. Herdem li dijî karê di nava koman de derdiket. Ji min re digot: Bozo, karê bi hev re kesayetiya mirov dixe qalikekî teng. Mirov dibe hesinekî biçûçik ji makînê. Di dema çûna xwe ya gundan de ji zilamê porspî re dîtina xwe vekirî li ber radixist:

- Pirsgirêk ew e ku tenê makîne giring dibe. Herkes dixwaze makîne bimeşe. Hesinkên biçûçik yên makînê hem bênav û hem bênirx dibin. Hesinek diçe divê yekî din bê şûna wî, mesela partîtiyê jî ev e.

Piştî çûna zilamê porspî Masî aliyê din yê meselê ji min re got: Lê bê karê bi hev re jî konê koletiyê ji ser me nayê avêtin. Min dizanîbû êdî Masî biryara xwe daye û wê biçe. Wê kêlîka ku çavên xwe xistin çavên min û got: Ezê bibînim. Ne Berfîn, ew dara tûyan ya li hewşa wan ya li gund hat bîra min. Min keskayiya wê darê di her du çavên wî de didît. Ji pênc saliya xwe ve Masî bi wê darê ve hatibû girêdan. Hewşa wan fireh bû, lê ew dar bi tenê li wir hebû. Masî hildikişiya serê darê, tû jê dikirin û dixwarin. Gava tû digihiştin û şêrîn dibûn, diçû ser darê şaxên wê dihejandin û dibû reprepa tûyan li erdê diketin. Tasa xwe tijî dikir û dibir ji dê û bavê xwe re. Wî çaxî ez jî ciwan bûm û cihê min li ber deriyê hewşê bû. Ji hevalekî dilsoz pirtir Masî ji wê darê hez dikir. Diçû jora darê, şaxê herî stûr hildibijart, werîs pê ve girê dida û dikir hêlan. Zarokên cîranan hemû bi hesreta ketina hêlana wî bûn. Carna jî şaxekî biçûçik dişkênand, qaşilê wî bi kêrê di ser re dianî û dikir darikê qewsikan. Darik dikir mîna tîpa ‘Y’ê. Ji jêr ve destik bû û bi her du aliyên darik yên kêlekê ve du lastîkên dirêj girê didan. Ew lastîk ji lastîka tekerên piskilêtan dihatin jêkirin. Her du lastîk bi kefikeke ji çerm bi dawî dibûn. Kevirekî girover û biçûçik dixist kefikê û mîna guleyê bi kar dianî. Qewsik çeka zarokan ya wê demê bû. Hem bi kêrî nêçîra çûkan dihat, hem serîşkenandina êrîşkeran. Masî qewsikê xwe davêt stûyê xwe û bêrîkên xwe tijî zixurên girover dikirin. Wisa hest dikir ku artêşek pê nikare û dinya hemû ya wî ye. Lê ji nişka ve her tişt serûbin bû. Dara ku tûyên şêrîn didanê, sîleh didayê, jê re dibû hêlan û havînan jî siyeke hênik didayê, ji nişka ve bi destên çend leşkerên hêrsbûyî, yên bi ser mala wan de girtibûn, ji qurm ve hat rakirin. Di nava çend rojan de dar zer bû, çilmisî û mîna termekî li ber çavên wî hat avêtin. Çîrokê wiha dest pê kir. Bavê wî evîndarê zimanê dayika xwe bû. Zimanê ku li her deverê qedexe bû, tenê li malê pê dihat axaftin. Kevneşopiyeke xelkê wir hebû; dema pirtûkên bi zimanê xwe yê qedexe dianîn malê, ditirsiyan. Ew pirtûkên qedexe an di kadînan de vedişartin, an dixistin nava dîwaran û ew diseyandin, an jî di bin erdê de vedişartin. Gelek ji wan pirtûkan an mişkan dikeritandin, an av diçû ser wan diriziyan, an jî ji zerbûn û kevinbûnê êdî nedihatin xwendin. Kêm ji wan saxlem difilitîn. Bavê Masî jî pirtûkeke qedexe xistibû nava naylonekê, di bin axa ber qurmê darê de veşartibû. Vê dawiyê Masî naskir ku ew pirtûk gramera zimanê Kurdî ya Celadet Bedirxan e. Dema wan çend zilamên biçek ser mala wan de girtîn, Masî di xew de bû. Bi şkênandina derî re ew û dê û bavê xwe bi hev re ji xew çeng bûn. Berê sibehê bû. Hema hema roj dihat ku hilê. Destpêkê çar zilam tevlî çekên xwe ketin hundir, piştre kulmoza leşkeran girt ser malê. Bi fermana yekî ji wan, bi kuling, bêr û tefşoyan dest bi kolana nava hewşê kirin. Gav bi gav ber bi qurmê darê ve diçûn. Dixwestin darê ji qurm ve rakin, ji nişka ve çav bi pirtûka di nava

naylonê de zerbûyî ketin. Mîna çar gurên birçî çav li bereteyekê bikevin, ew pelên zerbûyî ji destên hev revandin, dan destê fermandarê xwe. Bêhna wan derneketibû, karê xwe dewam kirin heta ku dar ji qurm ve hilkirin. Bi hilkirina darê re sê hezar qurmê daran ji hundirê Masî hatin rakirin. Di dilê xwe de digot; qey van leşkeran girr ji darê girtiye. Piştî ku dar wergerandin bi kuling û bêran parçe parçe kirin. Yekî ji wan demanceya xwe derxist, ji fermandarê xwe xwest ku destûra kuştinê bidiyê, lê femandar nexwest çek bê teqandin. Dar dan ber pêhînan. Bavê Masî tevlî cilên wî yên şevê bi xwe re birin çûn. Masîyê cefilî xwe hişk bi lingên diya xwe ya tirsiyayî gitibû û digiriya. Bi derketina wan re diya wî dest bi nifiran kir: Xwedê ji zaliman re nehêle. Wî jî dest bi girî kir. Ew ne cara yekê bû ku bavê wî digirtin, lê cara yekê bû ku pirtûkeke wî ya riziyayî pê re digirtin. Carên berê ji bo karê wî yê qaçaxçîtiya di navbera Serxet û Binxetê de digirtin, lê vê carê mesele girantir bû. Tevlî wê jî mana wî ya li cem wan dirêj nekir. Diya wî ji vegera bavê wî ya zû şaş mabû, lê bersiva bavê wî zelal bû: Li vî welatî her tişt bi pera dibe. Min soz da ku ez perenin pir bidim wan. Dilê diya wî bi bersiva bav neket cih:

- Îca emê pereyan ji wan re ji ku bînin?

Bavê bêçare bihêrs lê vegerand:

- Divê çend mehan ez tenê ji wan re bixebitim.

Xebata wî jî ew bû ku çaya hişk derbasî Serxetê bike û ji wir jî rûn, betanî, tejik û tiştên din bîne. Piştî şer dest pê kiribû karê qaçaxçiyan jî ji berê zehmettir bûbû. Sînor asê kiribûn, leşker, mayîn û çavadêrî pirtir kiribûn. Kesê qaçaxçî diviya hem leşkerê wî aliyê sînor, hem yê vî alî razî bike. Razîkirin jî bi pereyan bû. Bi wî halî bavê wî karê xwe dikir. Meseleya bavê wî dihat çareserkirin, lê wê kê dara wî ya tûyan jê re vegeranda? Êdî wê nikaribûya bikeve hêlanê, tûyan bixwe, xwe bida ber siya hênik û ji xwe re qewsik çêke. Ji bavê xwe dixwest ku dareke din ya tûyan jê re biçîne, lê bavê wî weke ku ji çandina daran tirsiyabe, daxwaza wî di ser guhê xwe re davêt. Weke ku dar ji wan re bûbe sûc, bûbe gunehkarî; nedixwestin careke din wî gunehî bikin:

- Me xêr ji dara xwe nedît, lawo!

Diya wî dixwest bi van gotinan ji çandina daran bireve. Bi hatina laşê bavê wî re, ji ser sînorê bombekirî, dawî li xewna çandina daran jî hat. Ne wî ne jî diya wî nizanîbûn ne leşkerên vî aliyê sînor, ne jî yên wî alî bêbextî bi bavê wî re kirine û bûne sedema kuştina wî. Êvarekê du leşker hatin ber derî, ji diya wî re gotin; şevê din mêrê te xwe li sînor xistiye û hatiye kuştin. Were cenazeyê wî ji nexweşxaneya bajêr bibe. Gundî hemû bi hawarhawara diya wî ve hatin, çûn cenazeyê bavê wî anîn. Piştî ku li ser nimêj kirin veşartin.

Masî dizanîbû ku du apên wî li Serxetê ne, lê kesek ji wan nehat şûna bavê wî. Bavê wî dema barên xwe dibirin wî milê sînor, apekî wî riya kirînfirotinê nîşanî wî dida, pê re kar dikir. Bavê wî tenê diçû û dihat, lê apên wî jî şirîkê bavê wî bûn. Apê din jî mala xwe biribû Diyabekirê û nema deng jê dihat. Va ye bav mir, lê pêjna apan nehat û nehat. Vê dawiyê apê Masî yê qaçaxçî xebereke wiha ji diya Masî re şandibû: Jê re bêjin; maye jinebî, bi tenê ye, êdî nikare li wir bijî. Bila bê Serxetê ez li xwe mehr bikim. Diya wî yekser bersiv jê re şand: Bila bi kêrî jina xwe bê. Ez karim bi kêrî xwedîkirina xwe û kurê xwe bêm.

Masî deh salî bû, dema navê wî li gund ‘Lawikê Sêwî’ bû. Ji diya xwe fêm nedikir bê çima wisa hatiye guhertin. Berî mirina bavê wî her roj bav û diya wî bi hev diketn. Bav bi pevçûnê ji malê derdiket û bi qerebalixê vedigeriya. Rojê carekê Masî li bendê bû ku diya wî bê berdan. Bi roj heta dibû êvar teqreq bû, dema dibû şev jî her du diçûn ser yek doşekê û yek lihêf bi ser xwe de dikirin û bêdeng diman. Dema dibû sibeh, pevçûn dîsa vedigeriya. Bi mirina bavê wî re, diya wî roj bi roj li xwe dişkênand û diheliya. Heta ji diya wî dihat xemgîniya xwe vedişart, lê carna xwe nedigirt, dilê xwe ji Masî re vedikir:

- Ez li ber ciwaniya wî dikevim, lawo! Bavê te bi bêbextî dan kuştin. Xwedê ji wan re nehêle. Ez li ber te dikevim ku tuyê di nava zarokên hevalên xwe de sêwî mezin bibî. Ez li ber xwe jî dikevim; ez belengaza Xwedê, min rojek xweşî nedît. . .

Malbata diya Masî ji hev belav bûbû. Dê û bavê wê miribûn. Xwişk û birayên wê, li pey debara serê xwe, li deverên cuda bi cih bûbûn. Tenê xwişkeke wê li gund mabû, bêhna wê hinekî bi wê derdiket. Ew jî diya heft zarokan bû. Li jiyanê tenê xwestekeke diya Masî mabû: Divê ez heta dawiyê kurê xwe bidim xwendin û bê ku tiştekî wî kêmî heval û hogirên wî be, mezin bikim.

Her ku mamosteyekî gund pesnên Masî didan, perr û bask bi diya wî ve dihatin. Ji kêfan nizanîbû ka çi bike. Heta jê dihat li ber Masî kêfxweş û devliken bû û giriyê xwe dihişt ji xwe re. Dema Masî ne li malê bûya, têr digiriya. Dema li malê bûya, diçû metbexê, derî li xwe digirt û di ber çêkirina xwarinê re digiriya. Carekê Masî deriyê metbexê vekir, diya xwe çavbihêsir dît. Diya heyirî nizanîbû ka çawa hêsirên xwe veşêre:

- Ev hêsirên kêfê ne, lawo! Tu mezin dibî. Ez bi te keyfxweş dibim, lê xwezî bavê te sax bûya, sala bê bi te re bihata bajêr, ji te re xaniyek bikiriya û te xwendina xwe li wir dewam bikira. Masî dizanîbû ku diya wî zehmetiyeke mezin dikşîne. Li gund heta dawiya qonaxa seretayî dikarîbû bixwîne, lê jê pêve diviya biçe bajêr.

Sal zîvirî. Ne tenê daxwaziya diya wî pêk nehat, li rex wê, nexweşiyeke giran jî, mîna dizekî cansivik xwe berdabû hinavên wê. Êdî her dermanî nikarîbû zora nexweşiyê bibe. Ji ber êşê êdî nikarîbû raze:

- Lawo Masî, here xeberê bide xaltîka xwe! Ez dimirim, ji şevê din ve çawa ku hinek roviyên min bidin ber kelbetanan û biqetînin.

Berî hingê jî diya wî êşiyabû, lê ti carî alîkariya kesekî nexwestibû. Masî dizanîbû vê carê êşa wê ji her carê girantir e. Wê rojê xaltîka wî û mêrê xwe diya wî birin bajêr ser doktor. Li vegerê kîsekî tijî derman bi xwe re anîn. Xaltîka wî tenê bi girî bersiva wî da. Mêrê wê jî weke hercar bêdeng bû:

- Dektor got; bila li malê xwe rehet bike û van dermanan bixwe.

Xaltîka wî piştî ku karê xwe yê malê diqedand, dihat cem xwişka xwe. Piştî mirina wê nû Masî naskir ku diya wî nexweşa penceşêrê bûye. Ji ber ku nexweşî li bedena wê belav bûbû, dektorê bêçare ji bo mirineke rehet şandibû malê. Ji Masî re ew sala dawî bû li gund. Mêrê xaltîka wî, li ser daxwaziya wî, xanî û erdê pêşiya mala wan firot, li bajêr xaniyek jê re kirî. Hem ji bo xwendinê, hem ji bo bicihbûna herdem Masî hat bajêr. Heta ez li jiyanê bim ezê wê xwesteka Masî ji bîr nekim:

- Ji gund, ez tenê Bozo dixwazim. Ez û wî emê li bajêr bi hev re bijîn.

Min û Masî wê salê ji gund bar kir, em hatin li bajêr bi cih bûn. Heta ez li gund bûm û diya wî sax bû, ez li ber deriyê hewşê bûm. Piştî ku em hatin bajêr û ketin xaniyê xwe yê nû, êdî ez li ber derî nehiştim.

Di wê navê re salek xwendin lê çû, lê sala din bi germayî ket riya berdewamkirina xwendinê. Di çûnûhatinê de her av dixwest, lê tîbûna wî nedişkest. Min zanîbû ku xwendina dibistan û zanîngehan wê tîbûna wî neşkîne:

- Ez tî dibim, Bozo! Ne lêvên min, dilê min ziwa dibe.

Çawa ku li dûrbînekê binerin û dûr bibînin, çavên wî wisa di valayiyê de vekirî diman:

- Ezê bibînim. Xwezî min zanibûya bê li ser çi dibêje, li çi digere û wê li nava wan çol û çiyayan çi bibîne. Xwezî te zanibûya bê min çiqas bêriya te kiriye, Masî! Jixwe bêrîkirin û mereqdarî du peyvên wisa nin ku ji yek çavkaniyê tên, ku ew jî hezkirin e. Ez îro li vê baweriyê rast hatim. Dibe ez şaş bim, dibe jî ku tu li vir bûya yî, te gotibûya; Bozo serê xwe xwariye. Her tişt dibe ku rast be û dibe şaş be jî, lê bi rastî ez mereq dikim bê ew masiyê min yê biçûk niha li ku ye, çi dike û bi çi mijûl e. Masiyo, masiyê min î tî!

Pênûsa ku êşa xwediyê xwe dinivîse

Masî ez ji malê bi xwe re anîm. Min pê re sînor, av, mirin, çiya, tîbûn, newal, hêrs, mayîn, têlên ristî û deştên fireh derbas kirin. Ez her di binê çenteyê wî de bûm. Êşa min ji ya wî

girantir bû. Kêm kes bi vê xemgîniya pênûsê dizanin, nexasim gava her tiştî dibîne û nikare yek gotinê binîvîse. Carna hibra min di hinavê min de dikeliya, lê di nava wê qîr û qiyameta dirêj de wê çawa biherikiya? Lê ev nayê wê wateyê ku têkiliyeke giyanî di nava min û xwediyê min de tine bû. Masî gihiştibû Gabarê, cihê wê nemeya kin, cihê nivîsandina wan çend peyvan, ewên ku jiyana wî serûbin kiribûn. Her ku gavek davêt, dengekî di guhê wî de dipirsî:

- Berfîn jî di vir re derbas bûye gelo?

Li şûna ku pêjna Berfînê bê, ji jêr ve top û panzer, ji jor ve helîkopteran leşker dadixistin ser girên derdorê. Masî û hevalên xwe riya xwe guhertin, berê xwe dan Çiravê. Di demeke kin de riya di navbera Gabar û Çiravê de jî ji hêla leşkeran ve hat girtin. Hevalekî wan yê ku rêzantî ji wan re dikir, ev agahî da wan:

- Li wê navê girekî fireh bi navê Çilê Sor heye. Ew gir bikeve destê kê, her du alî dikevin destê wî.

Ji bo ku wî girî bi destê xwe bixin, heft kes çûn. Gir girtin. Êrîşên firokeyên şer li ser gir bê navber bûn. Hergav jora gir bidûman bû. Ji çar hêlan ve, leşker bi meşê ber bi gir ve dikişiyan. Piştî berxwedana du rojan sê kes bûbûn qurbanên parastina wî girî. Ji ber ku pîlên bêtêlan bi wan re qediyabûn, ji her çarên din jî deng nedihat. Her çarên mayîn heta dawiyê li ber xwe dan û ji hingê ve navê wî girî bûye Girê Qehremaniyê. Rêberê komê neçar ma ku berê şervanên xwe bide herêma Besta. Tevlîheviyeke mezin li wan deveran peyda bûbû. Gund bi zorê dihatin valakirin, bi hezaran gundî neçarî koçkirin û rêwîtiyên dijwar dibûn. Gundiyên mayîn jî çek hilgirtibûn, pere û alîkarî ji generalê pîr ji wan re dihatin. Pilan ew bû ku leşker tenê ji xwe re bibin çavdêrên şerê gundiyên ku bûne qorocî û çekdarên çiyê. Ji hêla din ve jî gelek erzaqê wan yê di bin erd û tehtan de veşartibûn, ketibû destê leşkeran, herweha meşên wan yên dirêj jî dawiya wan nedihat. Di meşê de jinan û yên qelew bêtir zehmetî dikişandin. Her ku Masî diçû alîkariya hevaleke xwe ya jin, Berfîn dihat bîrê û pirsekê xwe diavêt nava çavên wî:

- Gelo, wê rojek bê ku ez karibim alîkariya wê jî bikim? Wê kengî Xwedê kêfeke wisa bike para min?

Masî ketibû rewşeke wisa ku bi temamî bûbû beşek ji vê jiyana nû. Ji hêlekê ve heta jê dihat erkên xwe pêk dianîn û ji hêla din ve ligel ku wî bi xwe ti derb nexwaribûn jî, ketin û birîndariya ewqas kesên li derdora wî kiribûn mîna birîndarê haya wî ji birîna wî tineyî. Bawer nedikir ku rojeke ji rojan laşê hevalekî xwe bêgor li pey xwe bihêle û biçe, yan jî birîndarek ricaya kuştina xwe jê bike, da ku wî ji êşê rizgar bike, yan avê nede birîndarekî tî, yan jî şîşa çekê derxe, li ser êgir germ bike, bisincirîne û bide goştê diranê hevalekî xwe, da êşa diranê wî bikuje.

Masî bi çavê serê xwe dît bê çawa berf dibe kujerê mirovan, yan dibe sedema jêkirina lingên wan. Wisa jî ev ava xweş, ava zelal û xweşik ku pêwîstiya her mirovî pê heye, çawa dikare di kêlîkekê de jiyana mirovekî bi xwe re bibe û bike yekî bêşop û bêeser. Ev dijwariya ku hem xweristê, hem pilanên generalê pîr bi ser wan de anîbû, dibû sedema revê jî. Her ku yek diçû digihîşt leşkeran, yekser tev li êrîşên leşkeran dibû, bi wan re digirt ser wargeh û kozikên hevalên xwe yên berê. Masî dizanîbû ku tiştên wisa dibin, lê pirbûna bûyerên wisa ew bêhnteng kiribû. Ji ber wê gava bihîst ku di nava komekê de wê derkeve derveyî sînor, kêfa wî pir hat. Tevlî çardeh hevalên xwe, diviya bi deh hêstiran deh şervanên keç yên birîndar û nexweş bigihînin Heftenînê. Dîtina wê jimara keçên birîndar bi hev re careke din Berfîn anîbû bîra wî:

- Dibe ku tu jî li deverekê birîndar bûbî, Berfîn! Dibe ku tu tî bûbî û kesekî ku avê bide te li dora te tine be. Dibe ku mayîneke bêbext li nêzîkî te teqiyabe, yan jî vîzîniya guleyeke kujer guhê te êşandibe. Dibe ku careke ji caran, li van çiyayan, çavên te jî li min geriyabin. Hevalên wî ji xewnerojkan şiyar kirin. Rewşeke cidî li meydanê bû. Li ber guhê wî ket ku xetertirîn rê ev e, riya Qilaba-Heftanînê ye. Neçar bûn ku di ber kulmozên

leşkeran re derbas bibin. Ji Qilaba mirov xwe serberjêr berde, cadeya ku ji gund diçe bajêr tê. Cadeya teng li hemberê qereqolê bû. Leşkeran dûrbîn li ser rê saz kiribû. Karwanê Masî gihişt ber rê. Nexweş û birîndar ji ser hêstiran daxistin. Bi dengê teqînekê re ji hev belav bûn. Nêzîkî wan çem diherikî, li kêleka wî panzer û tang diçûn, dihatin. Gav bi gav û bilez rê qut kirin û çûn ser çem. Xuşexuşa avê rê nedida heta ku mirov biaxive ka çawa derbas bibe. Berî demekê, ji bo çûnûhatinê, mirovan ji xwe re pirek bi daran çêkiribû, lê leşkeran ew pir jî hilweşandibû. Diviya li avê bixin, lê tirsa ku wê li ber avê herin, hemû rawestandibûn. Bexçe û darên derdora çem xistibûn talda xwe, lê çawa ku veger mirin bû, wisa derbasbûn jî zor û zehmet bû. Yekî ji wan pêşniyaz kir ku pêşî hêstiran bişînin wî milê çem. Ji deh hêstirên çar li ber avê çûn, bi zorê şeş ji xezeba wan pêlên bêîman filitîn. Du kesan xwest li çem bixin, lê nikarîbûn:

- Nabe. Em nikarin, vêca wê çawa hevalên birîndar û nexweş derbas bibin?

Ji nişka ve tiştek hat bîra yekî ji wan:

- Çare heye.

Çavên bêçare hemû ber bi wî ve zîvirîn:

- Av li jêrê dibe sê şax. Eger em karibin xwe bigihînin cihê ku av ji hev vediqete, emê karibin lê bidin. Hê gotina wî di devê wî de, dengê xirecira leşkeran hat. Hemûyan bi hev re xwe avêt bin daran, wisa bêdeng man. Masî devê xwe bir ber guhê hevalekî xwe:

- Eger hêstir bi me re bûna, emê niha bihatan dîtin.

Masî difikirî ku careke din tesadufê ew ji mirinê filitandine. Bi dizî û bi bêhneke fireh ber bi cihê jihevveqetîna avê ve xwe kişkişandin. Xwe gihandin hêstirên xwe yên mayîn û meşa xwe ya dirêj ber bi sînor ve dewam kirin. Bi bêtêlê bi hevalên xwe re ketin têkiliyê; bi berbangê re xwe gihandin cihê ku dixwestin. Ji ber ku behsa amadekariyên kongreyê dihat kirin û wê ji her derê tevlî bibûna, Masî têgihişt ku wê li wir dirêj bike. Lempeyên dilê Masî ji her gavê pirtir şewq didan:

- Gelo, wê Berfîn jî bê vê derê?

Heta wê gavê Masî ya dilê xwe ji kesekî re negotibû. Li wê derê derfeta hevnaskirineke rehet pirtir bû. Piştî şiyarbûna sibehê, bernameya rojane ji spor, perwerdeya leşkerî û siyasî pêk dihat. Ji bilî stiran û govendê.

Her şervanekî çîrokeke wî ya taybet hebû. Wê êvarê Masî xwe di nava danûstandineke germ de dît. Rênasê ji Amedê, Bariyê ji Serhedê û Bawerê ji Sine, her yekî behsa sedemên hatina xwe ya çiyê dikir. Rênasê sîsalî wêneyekî keça xwe ya du salî ya bi navê Hêvî ji berîka xwe derxist nîşanî wan da. Zarokeke devliken bû. Du guliyên biçûçik li jora serê wê girêdayî bûn:

- Ez ji bo vê zaroka xwe şer dikim. Ji bo ku bi zimanê dayika xwe bixwîne û binivîse.

Rênas li Masî nerî, di ber re jî dikeniya:

- Gotinên min weke siloganan derketin, ne?

Gava dît ku her sê hevalên wî bi baldarî guhdarî dikin, wêne xist bêrîka xwe û keserek kişand:

- Nû hînî bilêvkirina peyva ‘papa’ bûbû. Wê gotinê ez bi berpirsiyariyeke mezin hesandim. Em tim dibêjin ev şerê ku em dikin, diviya ku bav û kalên me bikirana. Çawa tê xwestin eger wan li ber xwe bida, emê niha ne di nava vî şerî de bûna. Ji bo ku sibe keçika min jî van gotinên niha min gotin nebêje, ez hatim vir.

Her du çavên Rênas wê kêlîkê tijî bûn. Ne hêstir bûn, ne jî êş bû, tiştekî din bû; dibe ku hêvî be. Mîna mirovekî ku li xwe mikur bê dipeyivî: Ez bi xwe ne tenê ji bo rizgarkirina axê şer dikim, di gel girîngiya vê meseleyê, ez şer dikim da ez giyanê xwe ji dagîrkirin û koletiyê rizgar bikim. Rizgarkirina giyanê mirov carna ji axa welat jî girîngtir e.

Rênas li hevalên xwe zîvirî; çawa ku ji wan re bêje; Min dirêj kir. Pişt re çav ber bi Bariyê bîst û du salî ve zîvirîn:

- Meseleya min zelal û kurt e. Birayê min, berî sê salan di vî şerî de şehîd bû. Min jî nexwest çeka wî li erdê bimîne.

Bêdengiyê perdeya xwe berda ser wan. Bawerê bîst û şeş salî ew perdeya giran ji ser wan hilanî:

- Ji bo min tenê yek peyv heye, ew jî nasname ye. Ez li xwe digeriyam. Gera min a li rastiya min ez anîm vê derê.

Gava Masî dît ku hemû li benda wî ne, bi kenekî sivik berê xwe da hevalên xwe:

- Stiranekê ez anîm serê çiyê. Stiraneke evînê wisa kir ku ez bikevim nava vî şerê giran.

Ji nişka ve hemû li xirecira Serhedoyê Torî zîvirîn. Serhedo şervanekî xwînşêrîn û hezkirî bû. Herdem bi kêf bû. Ji her tiştî henek derdixistin. Li ku bûya hewaya wir ber bi qerf û şîroveyên wî yên taybet ve diçû. Destpêkê herkes jê dûr diket, di nav xwe de digotin; ev seresere ye. Lê bi demê re, çavê herkesî lê geriya. Şervanekî jidil bû. Di şer de şahidên mêrxasî û wêrekiya wî roj bi roj zêde dibûn. Di bêhnvedanan de jî yan henek dikirin, yan jî helbest dixwendin û dinivîsandin. Li vir jî ti kesî nizanîbû ku Serhedo li wan guhdarî kiriye:

- Kuro, nebêjin halo, yan halo! Ez dikarim sond bixwim ku hûn hemû ji ber malbatên xwe û ji ber sorin morinên xwe yên ku we nikarîbû çareser bikin, hatine vir. Ji bo hûn xwe ji wan teşqeleyan rizgar bikin we berê xwe daye çiyê.

Her yekî, kenekî sivik xwe avêt ser lêvên wî:

- Berî we hemûyan, ezê li ser xwe bêjim. Erê meseleya azadiyê û welêt berî her tiştî ye, lê ez li ber destê jinbavê mezin bûm û bavê min ez bê dilê min zewicandim. Xwedê jineke weke ya min neke nesîbê ti kesî. Bawer bikin ez ji ber zilim û zora wê û ya xesûya xwe di van deran re derketime.

Ji herkesî pirtir Rênas dikeniya. Serhedo teoriya xwe pirtir piştrast kir:

- Meyzênin, ji ber ku di nava we de ew zewiciye, wî tenê ji min fêm kir.

Her tişt li aliyekî û helbestên wî li aliyekî. Her ku hevalên wî derfet didîtin, jê dixwestin ku helbestekê ji wan re bixwîne. Ji ber daxwaziya Rênas, Serhedo neçar ma ku kaxetên xwe derxe û ji wan re bixwîne. Tenê dema helbest dixwendin cidiyeteke mezin diket şûna henekan. Vê carê li ser çiyê nivîsîbû. Serhedo bi hostayî helbestên xwe dixwendin:

Dilbijokî
Ji ber ku ez mêrekî dilbijok im, dibêjim:
Çiya çiçikên erdê ne.
. . . . . .
Xewna Xwedê
Gava Xwedê milet û welat li hev par kirin, Kurd ji bîr kirin.
Dawiya şeveke zivistanê, Xwedê Kurd di xewê de dîtin.
Ji xewê veciniqî û rabû, çiya çêkirin.
. . . . . .
Çiya çi ne?
Çiya ew perçeyên erdê ne yên ku dixwazin bibin ezman.
Her ku serê xwe radikin, Xwedê di nava serê wan de lê dixe û nahêle bilindtir bibin. Ji ber vê, çiqas bilind dibin nagihin ezman û çiqas nizim dibin nema dibin erd.
. . . . . .
Bilindtirîn çiya
Bibore Agirî, tu çiqas bilind bibî, bejna Egîdê min ji bejna te bilindtir e.
. . . . . .

Serhedo bi qedandina xwendinê re bêdeng dima. Diviya demek di ser re derbas bibe, heta ku bibe weke berê û qerf û henekan li wan deverên ku ken ji bîr kirine, belav bike. Dîtina wî kêfeke mezin bi Masî re çêdikir. Bicihbûna li wê derê, sekinandina firokeyên şer û guregura top û panzeran wan rojan ji aliyekî ve bêhna Masî anîbû ber, ji aliyê din ve serî lê gerandibû.

Pêlekê dibir, yekê ew tanî. Hat bîra wî ku ez di çenteyê wî de me. Ez derxistim û çend hevok di deftera xwe de nivîsandin. Berfîn bi nav nedikir, lê li ser dinivîsand. Bêriya wê dikir, lê digeriya. Carekê ji dûr ve, di nava hevalên wî yên keç de, rûyekî geş xuya kir û bû gurmîniya dilê wî. Bi dehan pîzotik bi ser ariya sînga wî de hatin xwarê. Meşa Berfînê bû, bejin û bala wê bû, dirêjbûna porê wê bû, lê her ku jê ve nêzîk dibû dibû keçeke din. Çivîkên mirî yên ji nava dilê wî ketîn erdê, ber lingên wî, hemû bi hev re firiyan û xwîn hêdî hêdî pê ve hat. Dibe ku jê re baş be ku ne ew derket, ji ber ku hevdîtineke wisa ji nişka ve dikaribû dilê wî rawestîne û wî ji qam ve bîne xwarê. Nema zanîbû çima hêsir ketin çavên wî. Dibe ku dilê wî pê şewitîbe, dibe jî ku hêsirên berî mirinê, yên bêrîkirinê bin. Ji Bêrîvan ve nêzîk bûbû. Bêrîvan ji nerînên wî mat mabû. Gava Masî naskir ku demeke dirêj e li wir bi hev re ne, serê wî tevlîhev bû û nema zanîbû çima wisa dereng keşif kiriye ku ewqas Bêrîvan dişibe Berfînê. Ji bo ku wê bêdengiya di nava xwe û wê de rake, heman pirsa ku wî û hevalên xwe yên din ji hev kiribûn, ji wê jî kir, lê Bêrîvanê bersiva wî bi pirsekê da:

- Tu ti carî tî bûyî?

Masî matmayî bersiv da:

- Erê, çima?

- Tu dizanî hûn hevalên mêr, eger hewcedariya we bi qedeheke av hebe, ya me jinan bi du qedehan heye.

- Av?

- Erê, ez li ser ava azadiyê dibêjim. Hûn şer dikin ji bo hûn ji zilma dewletên dagîrker rizgar bibin. Em şer dikin ji bo ku hem ji zilma mêr û hem ji zilma dewletan rizgar bibin.

- Ne hemû mêr zordar in.

- Rast e, lê civaka ku keçek tê de ji xortekî hez bike, yan tê recimkirin, yan lanetkirin, yan jî kuştin, ew civakeke mêran e.

Masî bi qurnazî pirsî:

- Tu li vir jî nikarî ji xortekî hez bikî?

Berûvajiyê tiştê ku Masî li bende bû, Bêrîvanê bi rehetî lê vegerand:

- Na, ne rast e. Va ye tu xort î û ez ji te hez dikim.

Gotinên wê Masî di nava pencên bêdengiyê de hiştibûn.

- Ji ber ku tu li vir ji bav û birayê min nêzîktir î. Sibe, eger em bikevin kemînekê, ezê berî herkesî li benda alîkariya te bim. Nizanim çima herdem ew têkiliya hezkirinê ya di serê me de bi têkiliyên cinsî ve girêdayî ne.

Weke ku bersiva hinekên ew hêrs kiribin bide, Bêrîvan wisa dipeyivî:

- Jixwe ev şer hemû ji bo hezkirinê ye. Dilê evîndarekê di sînga min de lê dide. Ez evîndar im ji ber wê min çek hilgirtiye.

Tayên werîsê axavtina Bêrîvanê qurmê zimanê wî girê dabûn:

- Lê li vir dema hinek hez dikin mecbûrî revê dibin, yan jî tên cezakirin.

Masî dixwest hêrsa wê zêdetir bike, lê hevala wî li qurnaziya wî dizîvirî û serî jê distand:

- Ez di wê baweriyê de me ku em li vir du şeran bi hev re dimeşînin. Yek jê şerê bi aliyê din re ye, ew eşkere ye, vekirî ye û heta ez karim bêjim rehet e jî. Şerê din yê giran jî ew e ku em bi xwe re, bi hundirê xwe re, dimeşînin. Ew şerê guhertina me ye. Ew pir zehmet e.

Bêrîvanê bi du çavên pilingan li nava çavên Masî dinerî:

- Ez bûme şahida wê yekê ku di şerê yekem de qehremaniyên mezin dibin, lê di şerê din de têkdiçin û direvin.

Masî dixwest helwesta wê ya li hemberê kesên ku behsa wan dike, bizane:

- Nikarin zora dîroka xwe ya ku bi xwe re tînin vir, bibin. Kîna min bi xwe li hemberê yên wisa nîne, ji ber ku hêz û taqeta şerkirinê jî nisbî ye, bi sînor e. Ev jî tiştekî insanî ye û heta radeyekê normal e.

Masî pê dihisiya ku li ser hevala xwe giran kiriye. Dibe ku bîranînên wê yên tal şiyar kiribin, ji ber wê xwest ku gavekê bi paş ve bavêje. Ji bilî çêkirina xwarinê tiştek nehat bîra wî:

- Me hevalên xwe bi tenê hiştine. Ka em herin alî wan xwarinê çêkin.

Mîna ku ji xewê şiyar bibe, Bêrîvanê bi ken lê vegerand:

- Wax, carna çiqas sebra mirov li xeberdanê tê.

Masî ew gotin weke lêborîneke sergirtî fêm kir. Vê yekê, di çavê wî de xwîna Bêrîvanê şêrîntir kir. Her duyan dizanîbû ku dengê dahola şer nêzîk dibe û derfetên axaftinên wisa wê qet nemînin. Sêzdeh rojên kongreyê qediyabûn û belavbûnê dest pê kiribû. Wê rojê Masî di xewê de bû dema koprayan girtibû ser wan. Di jor de gule û amûrên xwe yên kuştin û wêrankirinê tev davêtin ser çavên çiya û wargehên ku pêjna mirovan lê dihat. Toz, dûman, koncal û xerabkirin li pey xwe dihiştin û vedigeriyan. Diviya ber bi Cûdî ve herin, ji bo wê bîst û heşt hêstir amade kiribûn. Li ser rê, piştî geliyekî girekî spî hebû. Leşkeran ew gir xistibû destên xwe û dûrbîn danîbûn ser. Gava kerwanê Masî, Rênas û hevalên wan gihiştin biniya gir, agir ji devê tang û topan bi ser wan de bariya. Hem hêstir û hem ew, ji hev belav bûn û her yek bi aliyekî ve çû. Bi wê teqînê re du kes birîndar bûbûn, yek ji wan Rênas bû, lê birînên wan sivik bûn û çar hêstir jî hatibûn kuştin. Hemûyan xwe berdan jêrê, ber avê; cih ji leşkeran ve xuya nedikir. Wê şevê di wî geliyî de man. Ji bo derbasbûnê, roja din li benda hatina şevê man. Baranê ji erd û ezmên dayê. Mijê derdora wan daqurtandibû. Sê kes ji wan, ji bo keşfê derketin pêş. Bi vegera wan re pilan hemû hatin rawestandin:

- Bi hezaran leşker li raser serê me ne. Ne ji mijê bûya, niha me ji zû ve li hev teqandiba.

Mijê alîkariya vegera wan kir. Lê li Heftenînê jî şer dest pê kiribû. Wan jî barên hêstiran di bin erdê de veşartin û ketin haziriya şer. Firokeyên şer her der bombe dikirin. Şer belav bûbû, giran bûbû. Tenê behsa pêwîstiya çûna ber bi Xantûr û Metînan ve dibû. Mana Rênas li kêleka Masî moraleke baş didayê. Her du bi hev re di nava koma ku wê biçûya Xantûrê de bûn. Çiyayê Xantûrê hem bi bilindiya xwe, hem jî bi newala xwe ya ku ji Pîrbila vediqetîne, dihat naskirin. Komê xwe berdabû wê nawalê. Ji bo keşfê, Masî, Rênas û du hevalên xwe ber bi jor de çûn. Her derê mij bû. Ji bo qelandina hêkan Rênas agirekî biçûçik dadabû. Di guhê Masî de bê navber Vizeviza Koprayan bû. Carna kopra û firokeyên şer tine bûn, lê dîsa jî ew vizeviz ji guhê wî dernediket. Bi çêkirina xwarinê ve mijûl bûn. Gava Rênas miqilka hêkan danî ser êgir, ji nişka ve tangeke leşkeran hat hember wan. Li pişt tangê rêzeke dirêj ji erebeyên leşkerî pêş ve dihatin. Ne wan bawer dikir ku leşker ewqas nêzîk in, ne jî leşker li benda rûbirûbûneke wisa bûn. Her du alî jî veciniqîn. Her çaran berên kilaşinkofên xwe li leşkeran rast kirin. Lê ne wan li leşker teqand, ne jî deng ji aliyê din hat. Tenê dengê hevalekî wan bilind bû:

- Birevin.

Di demeke pir kurt de hemû ji ber çavên hev wenda bûn. Koma di newalê de jî paş ve vekişiya. Kenekî ji nişka ve Masî girt. Lê agahdar bû ku Rênas tevlî miqilkê baz daye û hêk jî mane di cih de. Ne çeka xwe, ne jî hêkên xwe avêtibûn. Gava gihiştin hev, ji ber ku dem û derfeta agirpêxistinê tine bû, hêkên xwe wisa nîvxav û sar xwarin. Xwe gihandin serê gir, tu çi bibînî. Serê rêzên tang, top û erebeyên leşkerî xuya bû û dawî xuya nedikir. Leşkeran jî xwarin dixwar. Rênas pêşniyazek kir:

- Ka em jî xwarina wan li wan biherimînin.

Pêkanîna vê pêşniyazê mîna xwekuştinê bû, lew re hevalên wî tenê bi ken bersiva wî dan û biryara meşa ber bi çiyayê Spî ve dan. Masî li cihê wî pirsî. Rênas bersiv da:

- Çiyayê Spî ye, piştre Bêxêr e û piştre Dêrika Binxetê tê.

Dilê Masî bi peyva Binxetê re, ya ku ji zû ve nehatibû guhê wî, lê da. Lê Rênas berê axaftinê ber bi rewşa şer ve zîvirand:

- Ev newala di destê wan de, eger em derbas bikin, piştre heta çiyayê spî, deşte.

Reş ket erdê. Pênc ji wan derketin keşfê. Masî rahişt dûrbîna şevê, bêtêl jî bi Rênas re ma. Xwe berdan biniya newalê. Hevalên wan jî li pey wan dihatin. Leşker li ser her du girên li pêşiya wan diçûn dihatin. Masî texmîna xwe ji hevalên xwe re got:
- Emê karibin derbas bibin, lê ji bo koma mezin ya li pey me tê, zehmet e.

Baweriya Rênas cuda bû. Ji wan xwest ku sê heb herin aliyekî û ew û Masî herin aliyê din, da kemînê deynin û rê ji derbasbûna koma hevalên xwe re vekin. Piştî ku her yekî ji wan cihê xwe girt, nema deng ji hevalên wan hat û ne jî bersiva bêtêlê didan, lê dengê teqandina çekan jî nedihat. Her pêncan biryar da ku meşa xwe berdewam bikin. Rênas xwe dida pêş:
- Ez rê baş nas nakim, lê ez dizanim ku em gihiştin aveke mezin, wê çiyayê Spî jî nêzîk bûbe.

Li deşta piştî newalê leşkeran kampên xwe vegirtibûn. Her pênc westiyayî û birçî bûn. Meşê heta berbangê kişand û pey re Ava Mezin hat dîtin. Tevgera gundiyan li biniya avê xuya kir. Ew cara yekê bû ku Masî gundiyên wê deverê, yên Başûr, ji nêzîk ve dibîne. Nikarîbûn li avê bixin. Çend qeyik li wê navê bûn. Ji bo ku xwediyên wan bên, Rênas gulleyek teqand. Piştî ku hatin, yekser şertên xwe gotin:
- Derbasbûn bi peran e. Bêpere em we derbas nakin.

Rênas bi awayekî neçar li Masî nêrî û bi nermayî xwest wan razî bike:
- Niha pere nînin, lê bi soz pişt re emê bidin we.

Kirin nekirin nikarîbûn her du zilamên serhişk razî bikin. Berê xwe dan nava gund. Masî ji sarbûna têkiliyên gundiyan şaş mabû. Ji birçîbûnê çogên wan sist bûbûn. Xwarin ji gundiyan xwestin:
- Em nû ji şer derketine, em birçî ne.

Çawa ku gundiyan hev şîret kiribe, yek bersiv didan:
- Xwarina me jî tine ye.

Wê rojê xwarin nexwarin. Heta êvarê her pênc bi dorê razan. Berî ku bi rê bikevin Rênas ji gundiyekî çiyayê Spî pirsî. Yê gundî tiliya xwe ber bi gundekî nêzîk ve kir:
- Ha, piştî wî gundî çiyayê Spî tê.

Berî ku bi rê bikevin deng ji bêtêla hevalên wan yên li çiyayê Spî hat. Ji wan xwestin ku li wir, li benda wan bimînin:
- Li wir bin, va em tên.

Piştî sê saetan gihiştin hev û bi hev re meşa xwe dewam kirin. Dema gihiştin wî gundê nêzîkî Çiyayê Spî, gundî bi kêfxweşî bi wan ve hatin. Xwarin li gund xwarin û bi terektorekê birin heta Çiyayê Spî. Li wir bêhna xwe vekirin, heta ku koma mezin ya hev wenda kiribûn, gihişt wan:
- We çawa av derbas kir?
- Me pere dan wan.

Bêhnvedanê gelek li ber xwe neda. Rêzên leşkerên ji sînor derbas bûbûn ber bi wir ve dikişiyan. Berê xwe dan Çiyayê Bêxêr, ew jî bi çekên giran hatibû dorpêçkirin. Li wê navê û ber bi bajarê Zaxo ve, li serê gir tangeke leşkeran cihê xwe xweş kiribû. Êdî ew ji xwe re kiribûn armanc. Xwe kirin sê kom. Koma êrîşê, ya parastinê û ya hêzdanê ku diviya li pişt ya êrîşê be û ya parastinê dûr bisekine. Masî di nav ya êrîşê de cih girtibû. Piştî keşfê berê çekên xwe dan tangê û deriyê dojehê bi ser de vekirin. Bersiv ji çar aliyan ve hat. Gule ji erd û ezmên dibariyan. Piştî demekê her der bêdeng bû. Rênas xwest biçe serê gir, lê hevalên wî nehiştin.

Roja din di Radyoyê de bihîstin ku tang şewitiye û du leşker hatine kuştin. Biryara wan a nû ew bû ku biçin çiyayên asêtir; berê xwe dan Xantûrê. Di wan meşên dirêj de, heta ku ji Masî dihat dixwest rê li ber xiyaneta gewdeyê xwe bigire, nehêle ku tîbûn, birçîbûn, bêxewî û westandin zora wî bibin. Di rê de teqîn çêdibûn; hinek birîndar dibûn, hinek dimirin. Geh benê şerê bi general û leşkeran re sist dibû, geh jî dişidiya, lê wisa xuya bû ku dema şerekî dijwartir nêzîk dibû.

Zivistan li ber derî bû, diviya dest bi haziriyên serma, seqem, pûk û berfê bên kirin. Kom bi kom hem li çiya, hem li şikeftan belav bûn. Ji daran ji xwe re kursî çêkiribûn. Masî serşûştina bi berfê jî ceriband. Berf dianî, li ser êgir diheland û bi ava wê xwe dişûşt. Hefteyê carekê jî çûna ser çem hebû. Rênas bala xwe dabû girêdana wî ya bi avê ve:

- Bi rastî yê ev nav li te kiriye, ne şaş e.

Ji her tiştî pirtir Masî di qudreta hewcedariyê de difikirî, bê çawa mirovê hewcedar dikare ji tinebûnê her alavê jiyanê çêke. Van hestên azadiyê ew sermest dikirin. Her ku bêhnteng dibû, an hêrs dibû, van hestan kulîlkên xweşik di axa sar ya hêrs û aciziya wî de diçandin. Zivistana wê salê çiqas dijwar jî bû, lê bêhna mirinê hinekî kêm kiribû. Weke ku mirov bi ser hişê xwe ve bê, Masî bi xwe dihisiya ku êdî bi destekî bi qepera qedera xwe girtiye û bi destê din çeka xwe hilgirtiye. Dihisiya ku ew cara yekem e ku dikare berê hespê jiyana xwe li gor biryara xwe biguherîne. Bi xwe dihisiya ku xurt e. Bi hatina biharê re ji bo derbasbûna deverên asê di hundirê welêt de, hat xwestin ku dora sîh şervanên jixwebawer bên hilbijartin. Bê dudilî Masî bûbû yek ji wî sihî. Bi tevlîbûna Rênas pirtir li vê rêwîtiya dirêj û dijwar germ bûbû. Bihar dihat û berê wan li Wanê bû. Dema ketin rê, Rênas bi henekî şûşeya Masî ya avê ji dest girt:

- Ma masî jî tî dibin?

Masî ava xwe ji destê wî derxist:

- Jixwe masî nikarin bêav bijîn.

Rast e, çawa ku masî nikarin bêav bijîn, min jî nikarîbû bê nivîsandin bijîm. Min di dilê xwe de got digel Masî ez ji bîr kirime jî, lê dîsa her dema pêwîst be, ezê vê hibra xwe ya biha bi ser kaxetên spî de birijînim. Eger ez tiştekî ji bîr bikim, wê rojekê Masî bîne bîra min. Heta ku ew min hilgire û bi xwe re bigerîne, ez ê jî mîna dilê jinebiyekê li ser kaniya êşa wî rûnim, bêjim û hey bêjim.

Dikana generalê pîr

Generalê pîr kesekî wisa dihat naskirin ku heye jî û tine ye jî. Xelkên deverê bi hezaran çîrok û efsane li ser digotin. Çi ji wan rast, çi derew bû, kesekî nizanîbû. Pirê caran dema ew çîrokên xelkê li ser dihonandin digihiştin ber destê Masî, ew û hevalên xwe dikeniyan. Her carê bi rengekî behsa wî dibû. Yek ji wan tiştan ev bû; digotin; ku kêfa wî ji nêçîra masiyan re tê. Digotin; generalê pîr bi xwe jî nizane ka ev hewesa girtina masiyan û xwarina goştê wan ji kû hatiye. Her dema masî datanîn ber xwe, ji bilî xwarina goştê wan, dixwest ku dasiyan di nava diranên xwe de bişkîne, hûrhûr bike û daqurtîne. Zêdeyî bîst salan bû ku ew dasî dikerandin. Ne masî diqediyan û ne jî kela dilê wî bi vê dasîcûtinê hênik dibû. Vê dawiyê masî bi xavî davêtin devê xwe; goşt û dasiyên xav didan ber tûjayiya diranên xwe yên hesinî.

Generalê pîr ne tenê şerekî berfireh li wî welatî dimeşand, belê hema hema destê xwe danîbû ser rêveberên dewletê tevan. Zagon bi awayekî wisa saz kiribûn ku hêzeke bêsînor bi destê xwe bixe. Serokên partiyên ku li wî welatî siyaset dikirin, nikarîbûn bê wî pişta guhên xwe bixurînin. Generalê jîr, yê pîr û perixî, dewlet ji xwe re kiribû dikan û partiyên wê jî kiribûn vitrîn. Di her vitrîneke modern de diviya çend mêr û jinên lastîk, ji bo mînak hebin. Vê yekê hem xweşikbûnek dida dikanê, hem jî muşterî zêde dikirin. Li derve dewleta general bi serokwezîr û parleman û her tişt bû, lê li hundir her tişt bi kêfa generalê masîxwir dimeşiya. Tenê vegera leşkerên wî yên bijarte ku dişandin şer, di tabûtan de û şandina wan a bi ser malbatên wan de hêrseke mezin dixist dilê wî. Her ku cenazeyek bi ala wî ya pîroz pêçayî, bi ser de dihat, xwarina wî ya dasiyan duqat dibû. Gava dît ku çare nîne, hawara xwe gihand porspî, aqilmend û şîretkarên wî welatî tevan. Tenê gotinên yekî ji wan di serê generalê heyirî de hatibûn meyandin:

- Mesele pir rehet e paşayê min. Dar, divê ji qurm ve rabe. Eger hûn nikaribin rakin, tenê yek rê dimîne, ew jî kurmîkirina hundirê wê ye. Eger kurmên hundirê darê baş bên livandin, wê ew bixwe dawiya wê bînin.

Di civata serbaz û generalên bilind de dengê generalê pîr zelal û bi coş bilind dibû:
- Divê gundî tev çekan bigirin, yên negirin divê hemû ji gundan bên avêtin. Divê em kûçikan bi kûçikan bidin kuştin. Heyfa leşkerên me.

Yê li kêlekê rûniştî piştgirî da gotina generalê xwe:
- Ev li hundirê welêt. Li derve jî, li her devera cîhanê divê bi yek navî bên naskirin, ew jî terorîst e.

General nizanîbû ka çima bi peyva terorîst re tevzînokan bi laşê wî girtin. Gava xwest lingê xwe bilivîne dît ku teviziye, çawa ku tiştek tine be, gotina xwe domand:
- Ji bo wê emê çend generalên xwe yên bijare li paytextên dewletên biyanî bi cilên sivîl bikin nûnerên dewleta xwe ya mezin.

Bi vî wi awayî civîna dawiya hefteyê bi dilê generalê pîr qediya û pey re yekser berê xwe da nêçîra masiyan. Kincên xwe yên leşkerî, nîşan û xelatên xwe, ji ber xwe danîn û yên nêçîrê li xwe kirin. Ji bo nêçîra wî li kêleka mala wî goleke mezin jê re hatibû amadekirin. Kumê xwe yê kawboyan dida serê xwe, li ber golê hem nêçîra xwe dikir, hem pilanên xwe yên leşkerî di serê xwe de saz dikirin. Ew demeke dirêj bû ku di wê seraya mezin de, bi serê xwe dijiya. Hefteyê carekê diviya ku leşkerên wî masiyên sax jê re bavêjin nav gola avê. Wê rojê ti masî neketin tora wî, ji ber wê, leşkerên xwe yên xizmetkar tev ceza kirin. Pê hisiya ku wê hefteyê leşkeran ti masiyên nû jê re navêtine golê. Ji ber wê komeke xizmetkarên nû anîbûn. Carna general bi xwe ji girêdana xwe ya bi nêçîrê re hêrs dibû, lê nikarîbû dev jê berde. Carna jê bi masiyên mirî re dipeyivî:
- Tenê gava hûn mirî bin hûn baş in. Di saxiya we de her yek ji we bi serê xwe belayeke mezin e.

Ji bilî çend leşkerên ku bîst û çar saetan di xizmeta wî de bûn, ti kesî nizanîbû ku xwarina general ya herî hezkirî masiyên xav in. Bi hatina êvarê re leşkerên xizmetkar dikarîbûn texmîn bikin bê general masî baş girtine, yan jî qet negirtine. Dema masî nedigirtin yan jî kêm digirtin, ferman li ser serê wan bû. Carna berê xwe dida peykerê mezin yê li hewşa wî, li kêleka golê hatibû danîn. Diçû ber peyker, weke gunehkarekî ku here ber destê şêxê xwe, demanceya xwe datanî ber lingên wî yên kevirî û mîna jineke bîmayî digiriya. Li derve herkes jê ditirsiya, lê li hundir ew ji herkesî pirtir ditirsiya. Ewqas ditirsiya dema diçû nêçîrê, yan derbasî seşokê dibû, demanceya xwe di bin cilên xwe de vedişart. Di heman demê de ji çekên leşkerên xwe jî ditirsiya. Ji ber wê, ji hemûyan dixwest ku bi çekên xwe ve neçin cem. Di nava xelkê de, derbarê wî de gotinên cuda cuda dihatin gotin. Hinekan digot; ev agahî hemû ji wan leşkerên li ber destê wî derdikevin, hinekan jî dixist stûyê dijminên wî. Tirsa general kevin bû, lê her ku bi pîpelkên rutbeyan ve hildikişiya û mezin dibû, pey re jî tirsa wî mezin dibû. Her dem di wê baweriyê de bû ku wê rojekê ji pişt ve derba mirinê lê bikeve. Ka çiqas bi çeka xwe ve girêdayî bû û nêzîkî wî bû, ewqas ji çekên di destên kesên din de diqutifî. Heta wê gavê di wê tirsa xwe ya giran re derneketibû, lê tenê zeman pişt lê sist kiribû û mîzê xwe lê nedigirt. Carna neçar dima ku di civînên giring de rabe ser xwe û berê xwe bide tuwalêtê. Ji doktorê xwe xwestibû ku çareyekê jê re bibîne. Doktor bi qerf lê vegerandibû:
- Her tişt bi fermanên leşkerî nabin, paşayê min!

General di xeyala xwe de dixwest ku xurtûmekê ji ber doşeka xwe heta tuwalêtê bikşîne û vê mesela rabûna ji mecbûrî ya bi şev çareser bike, lê ceger nekir ku ji doktorê xwe re bêje. General bi hêrs ji xwe re digot:
- Du tişt li vî welatî bi hêza min û leşkerên min çareser nabin, yek jê ev meseleya mîza min e û ya din jî teror e.

General tenê dixwest ku hevalekî wî hebe û dilê xwe jê re veke. Li ser tenêtiya wî gelek çîrok dihatin gotin, digotin; generalê pîr dixwaze kesek hebe jê re ya dilê xwe bêje:

- Ev tirsa bi min re hemû sûcê bavê min e.

Kalikê wî hatibû kuştin. Ji ber ku bavê wî heyfa xwe hilanîbû, her dem ditirsiya ku bê kuştin. Bavê wî bêçek ji malê dernediket. Rojekê dema bavê wî li xwîniyên xwe rast hatibû ew û diya xwe jî pê re bûn. Mêrik demanceya xwe derdixe û berê wê dide wan, bavê wî di wê kêliyê de ji ber çavan wenda dibe. Diya wî bi destê wî digire, xwe davêjin pişt peykerê nêzîkî xwe. Sê gule li zikê peyker dikevin. Xelk û polîs bi hev re bi wan ve diçin, herkes dixwaze bizane bê çi qewimiye. Mêrik tevlî çeka xwe tê girtin. Ji ber ku peykerê pîroz dabû ber gulleyan weke xayînekî dihat binavkirin. Dema bavê wî vegeriya malê neda pey dadgehkirina xwîniyê xwe, yekser mal bar kir û çû li mezintirîn bajarê wî welatî bi cih bû. Dixwest yekcar şopa xwe bi xwîniyên xwe bide wendakirin. Ji wan rojan ve her ku dengê teqandina çekan dihat, tirs diket dilê general. Bi demê re wisa fêr bû ku xwe ji yên derdora xwe re berûvajiyê rewşa xwe nîşan bide. Bavê wî tim jê dixwest ku guh bide xwendina xwe û bibe doktorekî mezin, lê wî berê xwe da akadîmiya leşkerî û çavên wî her dem li sitêrkan bûn. Sal bi sal dikarîbû çend sitêrkan ji ezmên daxe, li ser milên xwe bi cih bike û xewna xwe bi cih bîne. Bi ya bavê xwe nekir û poşman nebû. Bi dehan doktor amade bûn ku bi kêfxweşî xizmeta cenabê wî bikin û li tenduristiya wî heta dawî miqate bin. Ava zemên zû herikîbû bin lingên wî, generalê xwedî xewn bi xwe jî bûbû bavê du lawan. Her du lawên xwe ji bo xwendinê şandibûn Emerîka. Ji bo jina xwe serayeke tijî xizmetkar li bajarê mezin kirîbû. Nema sebra wî li pîra jina wî dihat. Li seraya wî leşkerên tenê ji bo li kêfa wî binerin hebûn, ew jî ew leşkerên ku general li wan ewle bû ew bûn. Wan jî daxwaziyên generalê xwe nas kiribûn. Diçûn jinên bijarte jê re tanîn. Gelek caran artîst, stranbêj û modelîst jî bi xwe re tanîn seraya general. Generalê pîr herdem keçek ji nava wan hildibijart. Keçikê xwe jê re tazî dikir û diçû xwe li ser textê wî dirêj dikir. Di nava ronahiyeke sor de generalê pîr jî xwe tazî dikir, di ber keçikê re radimidand û xwe lê dida. Nema zanîbû ne pîrbûn e, ne jî tirs e ya ku ev zirar gihandiye mêraniya wî û sist kiriye. Xweşikbûna gewdeyê jinika li ber dirêjkirî, spehîbûna qam û qelafetê ku bang li mêraniya wî dikirin, hêstir dixistin çavên wî. Bi du çavên melûl li mişkê xwe yê mirî dinêrî û digiriya. Generalê pîr ji hêrsan dilerizî, soz dida ku careke din xwe nexe wî halî, lê çend roj derbas nedibûn dîsa xwe davêt hembêza jineke tazî. Xelkê di nava xwe de serpêhatiyên ecêb li ser zimanê leşkerên wî yên ku kar diqedandin û hev diguhertin, digotin; behsa şeva ku ji nişka ve tiştek hatibû bîra wî dikirin. Av bi devê wan diket, dema digotin; keçik tazî kir û bang li leşkerekî xwe kir, jê xwest ku xwe tazî bike û li ber wî bi jinika tazî re raze, Leşkerê reben behetîbû; xwe tazî kir, lê ji tirsa general kir nekir tiştek pê nebû. Roja din general ew ceza kir:

- Mêranî bi leşkerên min re jî nemaye.

Şeva din bang li leşkerekî din kir. Leşker zanîbû ku daxwaziya wî bi cih neyne, wê ceza bike. Leşker daxwaziya wî pêk anî. Av bi devê general ketibû wê şevê û mîna kesekî ku serê xwe xwaribe bilez diçû dihat. Roja din ew leşker jî ceza kir û li ser sînor wezîfedar kir. Gava dihat bîra wî ku jin jî li serê çiyayan li hemberê wî û artêşa wî şer dikin, dev li neynokên xwe dikir û diqîriya. Ji hêlekê ve vî şerî kêfa wî tanî ji ber ku şer ew kiribû stêrka çapemeniyê û wisa dikir ku hergav çav li ser sitêrkên milên wî bin û guh jî li benda axaftinên wî yên dîrokî bin. Her ku tabûta leşkerekî wî dihat, ji xelkê kolanan bigire heta wezîr û serokwezîr û perlementeran dihatin serxweşiya wî; wî jî hêsirên xwe hemû ji bo rojên wilo hiştibûn û bi comerdî li hemberê kamîrayan dibarandin. Ji hêla din ve jî vî şerî lingê wî xistibû soleke teng û serî lê gerandibû. General li serkeftineke mezin û efsaneyî digeriya. Di ber nêçîrê re pilanên xwe yên kevin û nû hemû di bin çavan re derbas dikirin. Hêviya dawî ew bû ku bi pereyan gundiyên feqîr bikire, sonda dilsoziya bi wî û dewleta wî re bi wan bide xwarin, wan bi çek bike û ji leşkerên xwe re bike mertal. Peyva qorocî êdî bûbû benîştê devê herkesî. Qorociyan jî dixwest rê ji çekhilgirtina xwe re bibînin:

- Em neçar mane. Em ji mecbûrî û ji bo dev ji gundên xwe bernedin bûne qorocî.
- Dewlet pereyan dide me, em jî hewceyî peran e. Kar tine, zarok pir in û divê em bijîn.

Di nava hevalên Masî de jî pîlana generalê pîr deng dabû:
- Birayê min bûye qorocî, bavê min, xalê min, apê min, gundiyên min, gundê li cem gundê me. . .

Masî bi ken ya dilê xwe ji Rênas re got:
- Ew apên min yên serxetî jî nebûbin qorocî ?
- Ma tu wan nas dikî ?
- Na weleh ez tenê navê gundê kalikê xwe dizanim.

Daxwaziyeke Masî ya xurt hebû ku here wê herêmê ji nêzîk ve bibîne. Lê ne nîşanên bidawîhatina şer hebûn, ne jî pilanên generalê pîr sînor nas dikirin. Berî çend salan, generalê pîr bi navê Xwedê dest bi pilanên xwe kiribû. Partiyeke bi navê Xwedê damezirandibû û sofiyên welêt hemû li derdora xwe civandibûn. Wê demê bi kêf ji masiyekî mirî re digot:
- Dawiya wan nêzîk dibe. Divê destpêkê mejiyê wan, serê wan bê perçiqandin. Ka serî kî ne, divê yeko yeko li kolanan di nava xwîna xwe de bigevizin.

Bi wî awayî her roj bi navê Xwedê, li ber siya wî, li ber çavên wî û çavên xelkên kolanan gule ji paş ve di serê yekî de diteqandin û diçûn. Ew kes di nava xwîna xwe de dima; ne Xwedê ne jî dewletê nedidan pey şopa kujeran. Generalê pîr navê vê pilana xwe kiribû 'Nêçîra Masiyên Bajaran' û bi ser jî ketibû. Herkesê destê wî digihiştê, diket tora mirinê ku seranserê wî welatî dabû ber xwe. Masiyên bajaran qir kiribûn û niha dora masiyên çiyê bû. Niha generalê pîr li pey wan bû. Ne qanûnên erdê, ne yên ezmên, ne yên dewleta wî, ne jî yên dewletên cîhanê dikarîbûn wî rawestînin. Li vî alî dema generalê pîr zengilê şer dihejand, bi hezaran leşker, qorocî û reşikên şevan diketin coşa kuştin û qirkirinê. Li wî alî jî Masî û hevalên xwe deh deh, sîh sîh, sed sed xwe davêtin hembêza çiyayên asê û li dahola şer didan. Ez jî di nava yên vî alî û wî alî de, di binê çenteyê Masî de, li benda tiştekî bûm, ew tişt çi bû gelo, xwezî min zanîbûya.

Berê Masî li Gola Wanê bû

Gava navê Wanê hat gotin, stiranên ku Masî li wan guhdarî kiribû hatin bîrê. Gola wê, keleha wê û ew wêneyê kevin yê ku ji zaroktiya xwe ve bi xwe re hilanîbû. Di rê de Rênas henek pê dikirin:
- Ez zanim çima tu vê carê bi kêf diçî.
- Çima ?
- Ji ber ku berê te li Gola Wanê ye.

Rênasê ku herdem û hergav ji henekan re amade bû, bi dengekî bilind keniya:
- Berê Masî li gola avê ye. Tuyê çi nekî, birê min!

Masî ji Rênas pirtir bi derdora xwe û bi wê meşa dijwar ve mijûl bû. Sîh şervan bûn. Heryekî sêsed fîşek xistibûn çenteyê xwe. Sê hêstirên bi roket û çekên din barkirî, dabûn pêşiya xwe. Çavê herkesî li rêzanê komê bû ku mizgîniya gihiştina cih bide, lê piştî ku hemû ji hawhaw ketin, nû deng jê hat:
- Em gihiştin derdorê.

Kom ji bo bêhnvedanê rawestiya. Masî û çend hevalên xwe ber bi gundê nêzîk ve xwe berdan. Hê roj derneketibû. Xwe li şivanekî girtin. Dema şivan çav bi wan ket, eger derfet bidîtan, wê bireviya, lê neçar ma ku bi wan re rû bi rû bimîne:
- Hûn teror in!

Xwestin tirsa şivên sivik bikin:
- Kê ev derew li te kiriye? Em ji bo azadiya we şer dikin, terorîstê çi!?

Piştî hinek danûstandina pê re, zanîn ku piraniya gundiyên derdorê çek hilgirtine. Ji şivan xwestin ku wan bibe gund. Şivan ji tirsan re dilerizî:
- Eger qorocî min sax bihêlin jî, wê leşker min bikujin.

Şivan di wî halî de hiştin; ji mecbûrî û ji bo anîna xwarinê daketin gund. Di wê navê re gundiyan jî pêjna hatina wan kiribû. Ti kesî ji wan re derî venedikir. Masî behetî mabû:
- Zilamên vî gundî bi ku ve çûne gelo ?

Li deriyekî din xistin, dengê jinekê ji pişt derî hat:
- Mêrê min ne li malê ye.
- Bi ku de çûye ?
- Ji malê derketiye. Xwe daye alî.
- Em birçî ne… Em nehatine ku zirarê bidin we, netirse!.

Jinan vekirî digot; mêrên me çûne kêleka gund, ji ber wan xwe dane alî. Masî û hevalên xwe bi hev şêwirîn. Biryar dan ku xwe li çend deriyan bixin, bi zorê bikevin hundir, nexwe wê ew û hevalên xwe ji birçîna perîşan bibin. Çend derî bi zorê dan vekirin. Ji barê hêstirekî pirtir nan û penîr dan hev û vegeriyan cem hevalên xwe. Gumanên hemûyan hebûn ku roja din leşker bi ser wan de bikişe. Ji ber wê ji xwe re li cihên asê geriyan û xwe ji bo pîlanên nû amade kirin. Pilana Masî, Rênas û çar hevalên wî ew bû ku alavên televizyona dewletê yên li serê çiyayekî bilind bi cih bûbûn, hilweşînin. Li pêşiya wan deşteke dirêj hebû, diviya di wê şevê de biçin lê bixin û vegerin. Bi hatina êvarê re, dema reş dikeve erdê şervan bi xêra wê rehet diketin tevgerê, her şeş ketin meşê. Xwe li deştê xistin. Şev qediya neqediya, bi bilindbûna dengên dîkên berbangê re, gundî jî rabûn ser xwe, ji malên xwe derketin. Tava rojê ew mecbûr kirin ku pilana xwe li paş bixin. Xwe di nava qamîşên bilind de avêtin erdê. Hercar yek dibû nobedar, pênc radizan. Nan têra du rojan bi wan re hebû. Ji bo ku serên xwe derxin, mîna şeş kulîlkên li benda biharê, her şeş li benda hatina şevê bûn, da ber bi armanca xwe ve bikevin rê. Tarî zû bi ser wan de hat, careke din lingên wan erdê wê deşta dirêj û fireh li pey xwe dihiştin. Nîvê şevê bû dema gihiştin quntara çiyê. Her sisê ji wan çûn aliyekî, ARBC yên xwe amade kirin û man li benda fermana Rênas. Bêtêl bi wî re bû. Ji nêzîk ve alavên weşanê mezin xuya kirin. Vê yekê keysa wan li nîşanê xweş dikir. Di kêliyeke bêdeng, di nîvê wê şeva lal de, gumîniyeke ecêb bi ser çiyê ket. Her şeşan li pey hev û ji du aliyan ve çek teqandin. Lê bersiv jî dereng nema; çawa ku berê amade bin, gule bi ser wan de bariyan. Bombe û guleyên bi wan re hebûn, ew jî teqandin. Nêzîkî nîv saetê şer dom kir. Her şeşan riya vegerê girt. Dîsa li deştê xistin, lê diviya berî derketina rojê xwe bigihînin hevalên xwe, ew jî ne mumkin bû. Hemûyan jî zanîbûn ku zor e, lê dîsa jî bi lez û bez vegeriyan. Masî bi şûn xwe ve zîvirî, agirekî mezin serê çiyê sor kiribû. Li nava bajêr jî tevgera panzer û tangan dest pê kiribû. Erdê deştê hinek cotkirî bû, hinek jî bi giyayê bilind hatibû raxistin. Zêdeyî sê seetan di nava erdê cotkirî de baz dan, lê dawî nedihat. Xwe gihandin cihê giyayê bilind, biryar dan ku li wir bimînin heta bibe êvar. Nikarîbûn razin. Pêjna mirina li ber lingên wan xew ji ser çavên wan dibir. Roj bilind bûbû. Gundiyan xwe berdbû nava erd û zeviyên xwe û di ser serê wan re diçûn, dihatin. Kêlî bi kêlî nêzîkî wan dibûn. Ji nişka ve yekî gundî ser serê wan re sekinî. Wan ew didît, lê haya wî ji wan tine bû. Bi pistepistê biryar dan ku bigirin. Her şeşan bi zikkişkê dora wî girtin û lê hatin hev. Yê gundî behetî, ji tirsa ji desthilanîn ket. Piştî demeke kurt xwîn hat rûyê wî, bi kêf bi wan re axivî:
- Destên we sax bin. Em şevê din bi wê gurmîniya we çiqas şa bûn! Ez Birokî me. Niha hûn birçîne jî… Ez herim ji we re xwarinê bînîm. Mereq nekin, ji ti kesî re ez behsa we nakim!

Masî dixwest yê gundî berdin, lê baweriya Rênas pê nedihat. Sê gundiyên din jî bi aliyê wan ve dihatin. Pişt re li hev kirin ku didu ji wan bimînin û didu herin xwarinê bînin. Axaftinên wan ew ewrên bêbaweriyê ji ezmanê dilê Rênas dabûn aliyekî. Bi hev re xwarin, vexwarin û cigare jî li wan belav kirin. Dilê Masî li ser cigareyê diperitî. Wê gavê hat bîra wî ku demeke dirêj e cigare nekişandî. Gundiyekî bi ken cigareya xwe bi wan da naskirin:
- Min cigareyên ‘Iki Bin’ ji we re anîne.

Wê rojê dema xwe heta êvarê bi hev re borandin. Her çar ji wan re bûn milîs. Rê nîşanî wan dan û bi dilxweşî xatir ji hev xwestin. Ji her çaran rêberê wan pirtir dilê Rênas dixist cih:

- Hûn dikarin baweriyê bidin gundên Birokiyan. Li gora tecrûba me bi wan re, wê piraniya wan zirarê negihînin me.

Lê pey re jî biryara guhertina cih dan:

- Ji bo parastina me guhertina vê nuqteyê pêwîst e. Emê herin aliyê Gewaşê, çiyayên wê.

Berê xwe dan wir, ji wir jî ber bi Muksê ve çûn. Gihiştin çiyayê bilind Ezabşêr. Germa Tîrmehê zora berfê nebiribû. Herder berf bû. Ji wir berê xwe dan milê Betlîsê. Li 'Çiyayê Kurêziyaret bi cih bûn. Sê gorên kevirî li navsera wî çiyayî bûn. Navê xwe ji wan girtibû. Ziyaretê nivişta di bin çengê Masî de anî bîra wî. Germeke xweş xwe berda nava xwîna wî; bi çend hevalên xwe re derket keşfê. Li wir qereqolek li ser cadê hebû. Dora sîh çil leşkerî li wir bi cih bûbûn. Ji bo êrîşê amadekariyên xwe kirin. Nizanîbûn ku leşkeran jî ew dîtine û li çiyayê li hemberê wan bi cih bûne. Weke pirê caran Masî û Rênas di nav heftên koma êrîşê de bûn. Berî ku ew dest bi êrîşê bikin, gule û roket bi ser wan de hatin û li hev teqandin. Qîrînî ji kêleka Masî hat. Jê weye ku qîrîna Rênas e, lê ne ew bû. Bang li hevalekî xwe yê din kir:

- Bi hevalê birîndar ve here, wî rizgar bike, ezê pêş ve herim.

Dengê çekan ji çar aliyan ve nêzîkî saetekê bê hedan li newal û geliyên çiyê belav bû. Ji nişka ve deng qut bû û bêdengiyeke mijokî xwe berda erdê. Masî nema zanîbû çi bi kê hat û çima wisa bêdengî çêbû. Gumana wî ew bû ku leşker paş ve vekişiyane; xwest ji paş gir derkeve, lê hê derneketibû Rênas qîriya:

- Masî, leşker li wir in.

Lê êdî dereng bû, leşkerekî berê tivinga xwe dabû sînga Masî. Berî ku biteqe Masî xwe avêt erdê û bi zîvirandinê re bombe avêt ber lingên leşker. Bi teqîna bombeyê re heta çeka leşker jî ji hev belav bû. Heta niha jî Masî nizane ka çima wî leşkerî pê li tetikê nekir. Dibe ku pê re negihabe, dibe tirsiya be, dibe çeka wî xerab bûbe, yan fişek nemabin, dibe jî ku ecelê wî, ne yê Masî wê kêlîkê hatibe. Dibe jî ew nivişta di bin çengê wî de ew ji mirinê parastibe, kî zane? Her tişt dibe. Li serê gir, li ser kevirên bilind şûna şemitînekê hebû. Li jêr jî deqên xwînê hebûn. Wisa xuya bû ku hevalên wî xwe ji jor de avêtine çûne. Çend laş, çend cil û çente li pey xwe hiştibûn û çûbûn. Wê şevê Masî û hevalên xwe ranezan. Dizanîbûn wê leşker bi jimareke mezin bi ser wan de bê. Lê ne ew tenê, berê komeke din jî ji hevalên wan ku ji hêla Betlîsê ve dihatin, li wan bû. Ber bi Kurê Ziyaret ve vekişiyan. Bi hezaran leşker bi ser wan de hatin. Koma destpêkê, ya Masî û çend hevalên wî li pêş bû. Yên din li pey wan bûn. Komeke din jî wê bigihişta wan. Wê koma mezin xwe berdabû newaleke rût û dimeşiyan. Koprayan ji nişka ve xwe berda ser wan. Di bêtêlê de rêberê komê ji Rênas re bi awayekî bêhêvî got; êdî cihê revê jî nemaye. Û nema deng ji wan hat. Rewşa Masî wan jî ji ya wan ne çêtir bû. Ji jêr ve leşker bi ser wan de herikîbûn û ji jor ve guregura koprayên bêîman dilê ezmên dixwarin û di zikê wî de dizûriyan. Masî texmîn dikir ku leşkerên jêrê agahiyan didin pîlotan û ew jî di jor de agirê cehenemê bi ser wan de dibarînin. Xuya bû ku cihê Masî û koma wan a biçûçik baş tesbît kirine. Ji nişka ve mîna erdê bombe veşartibin, her der diteqiya û dibû dûman. Dûman dibû hespên birîndar û dîn û li derdora xwe dihîriyan, dizîvirîn û bilind dibûn. Hevalekî Masî ser dev ketibû û roketê pişta wî vekiribû. Li kêleka wî laşek serê wî jê dûr ketibû. Lêvên Masî ziwa bûbûn. Di hundirê wî de hezar laşî xwe dilebitand û li ber xwe didan. Dixwestin vegerin jiyanê. Her yek çirayek di destê wî de bû û reşayiya hinavên wî diqelişandin. Dibe ku ji herkesî re wê kêliyê dinya girover be, lê ji Masî tenê re bûbû hevokeke çargoşe ku ji her goşeyê xwîn diniqutî, ew hevok ev bû: Yan bikuje, yan tuyê bêyî kuştin. Ji laşê bêserî wir ve, du giyanên ku li hemberê xiyaneta xwîna ku ji cesedên wan diherikî, li ber xwe didan. Masî guhê xwe danî ser sîngên wan. Hê bi wan ve mijûl bû, gule dîsa bi ser wan de bariyan. Bi bêtêlê hevalên xwe yên li pey wan agahdar kirin:

- Du birîndarên me hene, lê gule ranawestin.
- Wan bibin cihekî ku ne li ber çavên wan be û hûn xwe xelas bikin.

Şevê erd daqurtand ew jî gihiştin hevalên xwe. Dengê çekan bi şevê re westiya û bi temamî rawestiya. Dem hatibû ku bi birîndarên xwe ve herin. Heşt kesan, Masî û şervanê bi

navê doktor dihat naskirin, du hêstir dan pêşiya xwe û ketin rê. Çar ji bo anîna birîndaran, çar ji bo veşartina laşên hevalên xwe bûn. Her du birîndaran xwe hinekî ber bi kaniyê ve kişandibû, lê xwe negihandibûnê. Bê ku bi ser hişê xwe ve bên, li hêstiran siwar kirin birin. Masî û sê hevalên xwe yên mayî bala xwe dan bermayiyên şerê xedar. Masî nikarîbû ji çavên xwe bawer bike. Çar laş ji wan şewitandibûn. Ariya goşt, hestî û giyanên hevalên wî yên ku wê rojê bi mêranî li kêleka wî bûn, pê re radibûn, rûdinişin, dikeniyan û behsa xewnên xwe dikirin. Çavên wî tijî arî kirin. Masî dihat ku kor bibe. Nema ber xwe didît. Gava hat bîra wî ku armanca leşkeran ji şewitandinê ew e ku çavên wan bitirsînin, bi ser xwe ve hat û nexwest wê armanca wan ji wan re pêk bîne. Li ser nefret, kîn û wan mirovan difikirî, ewên karin işkenceyê li miriyan jî bikin:

- Ev çi mirov in ku hebûna miriyên me jî tehemul nakin.

Masî bi dilekî şkestî bi hevalên xwe re bermayiyên laşên şewitî veşartin û li cihên xwe vegeriyan. Li wir di nava diwazdeh gundên qorociyan de bûn. Di nava xwe de qorocî nirxandin û gundê wan yê herî xerab xistin çavê xwe de dest deynin ser pezê wan. Li ser rê kemîn danîn. Masî û çar din berê xwe dan keriyê mezin. Bi teqandina fîşeka yekem re her du şivan reviyan. Masî û hevalên xwe li derdora hezar bizin û mihî dan ber xwe. Gundiyên çekdar bi refan, bi terektorên xwe dan pey wan. Ew jî ketin kemînê û paş ve vegeriyan, da ku hawara xwe bibin ber deriyê leşkerên dewleta generalê pîr ku ew di nav çek û peran de hiştibûn. Şervanan pez bir di xaniyên xerabe yên gundên valakirî de veşartin. Her çil pêncî mîh û bizinan xistin xaniyekî û derî li wan girtin. Wê şevê nobedarên xwe Hemze destnîşan kirin û dil bi tasewas razan. Dawiya şevê Masî li ser xirecirê ji xew rabû, lê dîsa raza. Bi derketina rojê re naskir ku nobedarê wan reviyaye, xwe teslîmî qorociyan kiriye. Gelekî li bendê man, hema pê re pê re bi sedan leşker dabûn pey qorociyên ku Hemze ji xwe re kiribûn rêzan û bi ser wan de hatin. Ne çiya, ne şikeft, ne gundên vala û ne jî gumgumokên di qelşên erdê de xwe veşartibûn, ji bombebaran, gule û roketan filitîn. Tenê tehtên wê herêmê yên asê bi hawara şervanan ve hatibûn û ji qirkirinê parastin. Mîh û bizinên di xaniyên xerabe de kuştibûn. Xaniyek bi ser çil pêncî mîh û bizinên mirî de hatibû hilweşandin. Li xaniyekî din jî hemû ji bêhna gaz û barûdê fetisîbûn. Masî û çend hevalên xwe çûn pezê mayî derxistin, dest bi dotina wan kirin. Guhan ji şîr hatibûn dagirtin. Şîr ji guhanan dirijiya erdê. Çend mîh ji xwe re hiştin, yên din hemû şandin wargeha Besta. Goştê dikirin qelî, ji bo zivistanê di bin erdê de vedişartin.

Reva Hemze, teslîmbûna wî û dana wî ya pêşiya kujerên hevalên wî ku di xew de hiştibûn, çûbû, ji bîra wî nediçû. Hemze ji hevalên derdora wî tevan dilteniktir xuya dikir. Herdem di xizmeta hevalên xwe de bû û qet lê ne xuya bû ku tiştekî wisa di serê wî de diçe, tê. Bêdeng bû, karê ku jê dihate xwestin bê serêşiyê dikir. Nediket bala Masî ku li benda derfetekê ye da bireve û here leşkeran bîne ser wan. Ji ber ku cihê wan hatibû naskirin, diviya ber bi Feraşînê ve herin. Li wir, rê, ne bi kîlometran, ne jî bi tir, otobûs û balafiran dihat pîvan. Pîvana demê saetên meşê bûn. Ev meşa li pêşiya wan jî -wê komeke şervanên keç jî bi wan re bûya- pênc saet bû. Her deh şervanan hêstirekî barkirî û sîh bizin dan ber xwe û meşiyan. Li gundekî valakirî hinekan -Bêrîvan jî yek ji wan bû- xwest ku xwe rehet bikin, roja din meşa xwe dewam bikin:

- Em vir nas dikin. Ev gund berî salekê vala bûye. Qereqol jî ji vir hinekî dûr e. Riya me jî dirêj e.

Dilê Masî bi wê pêşniyazê nerehet bû, çawa ku hinek jê re bêjin ‘qebûl neke’, lê gava hemû bêdeng man ew jî neçar ma ku ya dilê xwe bêje:

- Dibe ku leşker, yan qorociyan em dîtibin.

Hemû man li benda gotina rêveberê komê Rênas:

- Madem piraniya we vê dixwazin, em bimînin.

Rênas xwedî tecrûbe bû, li cem hemûyan cihê baweriyê bû. Bi qedandina gotina wî re yekser çendek çûn bizinek serjê kirin. Sobeyeke xerabe anîn, agirê êzingan di nava dîwarên

maleke hilweşiyayî de dadan. Heta xwarina xwe qedandin, şev bû dereng. Ji ber ku ji hemûyan pirtir Masî dixwest li wir nemînin, Rênas jê xwest ku piştî nîvê şevê heta pêncê sibehê ew nobedar be:

- Pêncê sibehê me şiyar bike.

Li Masî zîvirî, bêtêl da dest:

- Ez bawer dikim wê bi dilê te be. Ji bîr neke carê bêtêlê bibe ser kenala general û leşkeran jî, ka ji me dûr in yan nêzîk in.

Masiyê nobedar çend gavan ji wan dûr ket. Dizanîbû eger ekrana bêtêlê bê dagirtin, leşker nêzîkî wan in. Bêtêla xwe kontrol kir, dît ku ekran tê dagirtin. Belê diyar bû ku leşker nêzîkî wan in, lê çiqasî nêzîk in? Bersiv jixwe li cem kesekî weke Rênas bû. Masî çû bêtêl da dest wî, yekser Rênas li wan zîvirî û bi lezgînî got:

- Dora du sed sê sed mitreyî ji me dûr in.

Gumanên Masî rast derketin wê şevê. Nêzîkî du sed leşkerî dabûn pey sed qorociyî û berê xwe dabûn wan. Hêstirê xwe bar kirin, bizinên xwe dan pêşiya xwe û dîsa ketin rê. Gihiştin newalê; hê ji newalê derbas nebûbûn leşker li serê girê raserî wan xuya kirin. Wan leşker dîtin, lê hê leşkeran ew nedîtibûn. Yên ku li dawiya rêzê li pey bizinan dimeşiyan, Masî, Bêrîvan û keçeke din bû. Hêstir jî mabû li pey wan. Berî newal biqede gurmînî û teqereqê dest pê kir. Bi bilindbûna stûnên toz û dûmana reş re xwe avêtin derveyî newalê û li hev teqandin. Her tişt tevlîhev bû. Masî xwest hevalekî xwe agahdar bike:

- Fîşekên me kêm in.

Hevalê wî, çawa ku rê bide ber, bersiv da:

- Bi çi awayî be, divê em xwe xelas bikin.

Leşkeran dora wan girtibû. Hêstir di newalê de li paş heyirî û ji gumeguma li dora xwe behetî mabû. Bizinan di wê navê re rê girt û berê xwe dan aliyê qorocî û leşker lê bi cih bûbûn. Qorociyek ji wan, ji şer pirtir, bi bizinan daketibû. Gava bizinan berê xwe dayê û ber bi wan ve çûn, kêfa wî dihat. Bi dengekî bilind ji hevalekî xwe re digot:

- Bizin jî xwediyê xwe nas dikin ha. Ji sedî sed ev bizinên te ne.

Gava leşker berjêrî newalê bûn, ji bilî hêstirê ti tişt nedîtin. Bi hev re berê çekên xwe dan hêstirê, ji çar aliyan ve gule bi ser de barandin. Hêstir behetî ji qam ve hat xwarê û di nava xwîna xwe de gevizî. Çend caran xwe lebitand û çend pirsan di her du çavên wî yên sist de, di nîvê dilê wê şeva tarî de çirisand. Çawa ku li sedema kuştina xwe bipirse. Çawa ku ji qatilên xwe re bêje; gelo, hûn kîne û li hemberê min çima ewqas hûn bi nefret û kînin? Çawa ku ji ezmanê bêdeng re bêje; çi bela van mirovan e ku bêdengiya vê şeva xweş xerab dikin û berê guleyên xwe didin dilên hev û yek dixwaze yê din bikuje. Bi ketina hêstirê re careke din qorociyê bi bizinan kêfxweş axivî:

- Ev bizin çiqas biaqil in lo. Wan zanîbû ku berê xwe nedin me û herin aliyê din, tişta hatî serê hêstirê wê bê serê wan jî.

Xwediyê bizinan gotinên wî pişrast kirin:

- Erê, bizinên me jî wek me ne.

Li aliyê din Rênas hêviya xwe ji xelasbûnê birrîbû. Bang li Masî kir. Destê xwe avêt bêrîka xwe. Masî dizanîbû ku wêneyê keçika xwe ya biçûk, delala li ber dilê xwe derdixe. Di reşiyê de Rênas rûyê wêneyê piçûk û bêdeng maç kir û xist cihê wî. Careke din destê xwe dirêj kir, du bombe derxistin:

- Du bombe bi min re hene. Yek ji bo te, yek ji bo min. Eger çare nema û berî em bikevin destê wan. . . .

Masî bombe ji destê wî girt, lê bi hişkî bersiva wî da:

- Ev ne dema mirinê ye, lo. Emê li ber xwe bidin û emê bi hev re bigihin hevalên xwe.

Masî di wê ramûsana wê kêlîka teng û zehmet de difikirî. Bala wî çû ser keçika Rênas ya biçûçik û ji xwe wiha dipirsî: Ev zaroka ku niha li maleke Amedê razayî ye, gelo, wê zanibe ku di şeveke wiha de û li ber dergehê mirinê bavê wê yê şervan ew aniye bîra xwe û maç

kiriye? Wê zanibe bavê wê, berî ku bimire, tenê xwesteka wî ew bû ku rûyê wê maç bike û pişt re ji xwe re dibêje, mirin tê jî bila bê. Wê maça Rênas nivişta wî anî bîra wî. Lê ya wî keçikeke ji ya Rênas mezintir bû, xwesteka wî ne ew bû ka gelo, wê karibe berî çavên xwe li jiyanê bigire rûyê wê yê xweşik bibîne, lêvên wê maç bike û dû re bimre? Wê kêliyê Masî nedixwest ku bimre û qedereke wisa bipejirîne. Bawer nedikir ku ew kêliya ku çavên wî heta hetayê li ronahiya jiyanê bên girtin û di nava tariyê de bimîne, hatiye.

Ew Rênasê ku di şer de hercar mîna pîzotekê germ dibû, vê carê poşmaniyê şikênandibû. Pê dihisiya ku wê şaşitiya wî bibe sedema kuştina wî û neh hevalên wî. Bihêrs ji Masî re got:
- Eger tu sax mayî, ji hevalên me re bêje, carna neh kes bi ya kesekî bikin baştir dibe. Ji wan re bêje, bê carna mirov demokrat be ne baş e.

Careke din guregur bi guleyan ket, geh binavber, geh bênavber heta nîro dewam kir. Wisa xuya bû ku leşker bi paş ve vedigerin. Gava bi temamî nema pêjin ji wan hat, Rênas çawa ku bawer neke, hevalên xwe civandin:
- Carna mana mirov li jiyanê bi serê xwe serkeftin e.

Rast bû her deh sax mabûn, lê westiyayî, birçî, tî, bêxew, nîvsax û nîvmirî heta Feraşînê meşa xwe dewam kirin. Li wir hemû di haziriyên hatina zivistaneke din de bûn. Di nava wê xirecirê de Rênas dixwest bandora bûyerên dawiyê li ser xwe û Masî hinekî sivik bike. Gava behsa geliyê Masîro yê nêzîk bû, yekser Rênas xwest ku herin wir. Di rê de vegeriyabû qerfên xwe:
- Li Wanê masiyê me nikarîbû bikeve avê. Divê em herin ser çemekî tijî masî.

Dîmenê hêstira kuştî ji ber çavê Masî nediçû. Gava ew dîmen anî bîra hevalê xwe, çawa ku li benda derfetekê be, Rênas dest pê kir çîroka Serhedo û hêstirê jê re got.

Serhedo dema nû hatî çiyê, demekê ez û wî bi hev re man. Guhên wî her li ser hêstiran bûn. Didît bê çiqas xizmetên mezin ji me re dikin; radihêjin lazimiyên me, sîlahên giran, birîndarên me, xwarina me. Dest pê dikir li ser wan helbest dinivîsîn. Navê wan jî kiribû hêstirên welatparêz. Di wê navê re hêstireke wî ya taybet çêbibû û navê wê kiribû Zînê. Em diçûn kû Zînê bi me re dianiya. Carekê min jê re got emê navê te jî bikin Mem. Eger rojekê ev Zîna te me hemûyan nede kuştin, baş e. Wî jî bi bawerî got; eger em heta niha saxlem mabin, hemû bi xêra Zînêye. Heta em rojekê digel Zîna wî di nava kulmozeke leşkeran de asê man. Min zanîbû em ê zirareke mezin bibînin. Birîndarên me pir bûn, em neçar man ku bi paş ve vegerin. Bi vekişînê re xwîna ji birîndarên me hatî me bi axê vedişart, da nebînin û kêfa wan xweş nebe. Ez dirêj nekim. Bi sedan leşker bi pêş ve hatin, lê ti kes ji me nedîtin, lê mixabin hêstira Serhedo ketibû destê wan. Zînê dabûn ber guleyan. Laşê wê kiribûn moxil. Roja din ew jî vekişiyan. Serhedo ji min xwest ku em herin hêstira wî bînin. Em çûn, lê em çi bibînin? Bostek tenê jî ji laşê wê bêbirîn tine bû. Dema Serhedo çav pê ket girî pê girt. Min kir nekir nema sekinî. Mîna zarokekî ku diya xwe li ber çavên xwe kuştî bibîne, wisa digiriya. Zincîra çîrokên Rênas li ber geliyê Masîro hate qutkirin. Li wir jî hevalên wan haziriya depokirina xwarinê dikirin. Di nava wan de Azadê Mûşî xwe da ber girtina masiyan. Bombe diavêtin avê. Bi teqînê re bi sedan masî bi ser avê diketin. Yên din jî li derdorên xwe bi qazmeyan erd dikolan, -du mitreyan kûr dikirin- beşt datanîn ser, naylon jî datanîn ser beştan, ji bo ku dilopan neke pişt re ax diavêtin ser. Ji bo parastina ji gurên serma zivistana xedar Kozik û şkeftên bin erdê pir kiribûn. Digel wê jî, ji ber serma û seqema zêde, ji şervanên jin tevan hat xwestin ku herin devereke çêtir. Li wir Masî, Rênas û Azadê Mûşî di nav de nêzîkî çil kesî mabûn. Guliyên berfê dest bi firê kiribûn, dibariyan. Carna bilindiya berfê digihişt çar mitreyan. Çemê Masîro qeşa girtibû, bê ku biherife di ser re diçûn dihatin. Azad qeşa dişkênand, masî bi destên xwe derdixistin. Rênas diçû dihat di bin simbêlan de dikeniya:
- Em weke hirçan dijîn. Hirç jî zivistanê dikevin şkeftan, heta zivistan neqede, ew jî dernakevin.

Çend roj derbas nebûn Azadê Mûşî bi nexweşiyeke seyr ket. Ji ber êşê diqîriya:

- Her dera min diêşe.

Êdî xwîn di rayên laşê wî de nediherikî. Bang li doktorê komê kirin; ew jî şaş mabû:
- Ez jî tiştekî ji nexweşiya wî fêm nakim.

Ji xwarina heban ti sûd wernegirt. Ba û berfa giran nedihişt ku têkilî bi bêtêlê jî bê danîn. Azad ji qam ve ketibû. Ji bo destaê sê kesan dibirin derve dianîn. Rênas nema sebir dikir:
- Divê em tiştekî jê re bikin.

Di wê navê re bêtêl xebitî; têkilî bi komên din re danîn:
- Emê doktorekî bişînin, lê divê hûn bên bibin.

Koma herî nêzîk çar seetan ji wan dûr bû. Digotin; heta heşt metreyan berf bilind dibe. Diviya pênc kes herin. Masî û Rênas jî di nava wan de hatibûn destnîşankirin. Her yekî pênc cot gore û soleke saxlem xist lingên xwe. Sê lekanên berfê li cem wan bûn, ew jî birin. Lekanan nedihişt ku berf here xwarê. Xwarina xwe hilgirtin, xatir xwestin, derketin. Li derve firtone bû. Heta girê nêzîk ku meşa bîst deqîqeyan dûr bû, meşê çar saetan li ber xwe da. Piştî gir xwe berdan newala ku gundekî valabûyî tê de bû. Bi şev li wir man. Li her derê firtonê hefsar sitandibû û her tişt li ber xwe dibir. Li hundir agir dadabûn, dixwestin vegerin çîrokên xwe. Gotin li pey gotinan dihatin. Rênas û Masî ajotin ser mijara evînê. Evîna ku di nava çavê mirinê de şîn dibe û li ber xwe dide. Masî henek pê kirin:
- Te bêriya jinikê nekiriye ?

Vê pirsê careke din derfet dan Rênas ku wêneyê keçika xwe ya biçûçik maç bike:
- Bi rastî bi qasê ku ez bêriya vê zaroka xwe ya şimamokî dikim, ez bêriya diya wê nakim. Xuya ye ku evîn jî qonaxên wê hene. Ez di qonaxa bavitiyê de me, lê tu. . .
- Wileh jinikeke min hebûya, minê bêriya wê kiribûya.

Masî jî dixwest bi nivişta xwe mijûl bibe, lê derfeta keşifkirina vê razê heta hingê nedîtibû. Rênas bêdengiya wan bi gotina serpêhatiyeke din xerab kir:

Zivistanekê ji zivistanên van deran, min rêveberiya komekê ku ji neh hevalan pêk dihat, dikir. Çend caran meseleya hezkirina Alan û Hêlîn ku her du jî bi me re bûn, li ber guhê min ket, lê min di ser guhê xwe re davêt. Şeveke sar, me xwe ji şerekî giran re amade kiribû. Nizanim çima wê şevê leşker paş ve vekişiyan û me şer nekir. Me naylonên xwe bi ser xwe de kirin û em razan. Nobedarê serê sibehê ji min re got:
- Şevê din di bin naylona me de şer hebû. Piştî ku em razan di bin naylona me de bûbû xirecira Hêlînê û evîndarê wê. Ji ber ku tiştên li derveyî qanûnên me ne, heryekî cezayek ji wan re dixwest. Heta yekî ji komê got:
- Divê bên îdamkirin.

Hestên jibîrbûyî di hundirê Masî de şiyar bûbûn. Mereq dikir bê hevalê wî yê nêzîk çi biryar derheqê wan de girtiye:
- Min ji wan re got meseleyê mezin nekin. Lê me her du jî ceza kirin, me her yek ji wan şand deverekê û pişt re em hemû ji hev belav bûn.

Min çîrokên wisa pir bihîstibûn. Gelek ji wan bi hev re direviyan, dû re dizewicîn, lê ew cara yekê bû ku ez tiştekî wisa li ber çavên xwe dibînim. Tu rastiyê bixwazî dilê min bi halê me dişewite, Masî. Evîna welêt, ya azadiyê, ya jinê yan ya mêr hemû li nava hev ketine. Em bedelên hemûyan didin û yekê ji wan jî bi dest naxin.

Ew şev li wir qedandin. Sibehê zû, ewr hebûn lê berf sekinîbû. Xwe girê dan, bi rê ketin. Her car sê kesan bi lekanan rê vedikir. Hemûyan pê li şûna piyên hev dikir û dimeşiyan. Lingê Masî şemitî, ket bin tehtê. Hevalên wî pê ve hatin; derxistin û meşa xwe heta nîvê şevê dewam kirin. Rênas li hevalên xwe yên birçî û westiyayî zîvirî:
- Em gihiştin Deriyê Qaçê.

Ew mizgîniya gihiştina cih bû. Wê şevê bêhna xwe vekirin, sibeha din tevlî doktor xwestin bidin ser şopa lingên xwe û vegerin. Firtonê şop û eser hemû xerab kiribûn. Vê yekê riya wan a vegerê dirêjtir kir, lê dawiya dawî gihiştin. Doktor bi baldarî Azad kontrol kir. Derman

dayê, lê çend saet derbas nebûn, dîsa nexweşiya wî vegeriya. Bi guregura firokeyên şer re Masî naskir ku şûna lingên wan şopandine. Cihê agir lê kiribûn, cihê çûnûhatinê hemû dabûn ber bombeyan û ji her alî ve ser cihê wan de girtin. Di demeke kin de kozik û şkeftên ji xwe re çêkirîn hemû hatin herifandin. Di wê kêlîkê de Masî beroşa nîskê danîbû ser êgir, Rênas jî xwe gihand cem û bi ser de qîriya:
- Xwe bavêje erdê, şkeft hemû hilweşandine.

Masî xwe di cih de avêt erdê û serê xwe xist bin beştên kozikeke herifî, lê pişta wî hemû mabû li derve. Li nêzîkî wî teqîn û dûman bû. Pişta wî bi çend cihan birîn bû. Beroşa nîskê bi hewa ketibû û her tişt tevlîhev bûbû. Teqîn mîna kabûseke giran û lezok qediya û nema pêjna firokeyan hat. Hemû hatin cem hev. Azadê ku hercar serê kerwanê şervanan dikişand û berê çeka xwe bêtirs dida çavkaniyên gule û roketan, di bin beştên koncaleke herifî de laşekî sar bû. Azadê xwedî pêzanînên şer, rêberê bixwebawer, bêdeng û bênefes mabû. Xwe bi ser êşa xwe de tewandibû û can dabû. Mana li wê derê dihat wateya mirinê. Laşê Azad, xewn û xeyalên wî, kulîlkên dilê wî yên bişkivî, kêfxweşiya diya wî bi vegera wî, kenê zarokên taxa wî, hêviya çivîkên ku li ser dara ber deriyê mala wan datînin û êşa wî jî, hemû bi hev re binax kiribûn. Ketin rêzê û ber bi wargeheke din ve meşiyan. Di rê de li hevalekî xwe yê birîndar rast hatin. Ji hevalên xwe mabû. Çend rojên wî li wir qediyabûn. Birîna lingê wî kevin bûbû. Gava çav li Masî ket, giriya. Ew û Masî demekê bi hev re mabûn. Giliyê xwe pê dikir:
- We çima li vir ez tenê hiştim ?
- Ev tu yî. . . ?

Ji matmayînê navê hevalê wî nehat bîra wî. Ji tîbûn, birçîbûn û êşê hindik mabû ku aqilê xwe wenda bike. Mîna dînekî diaxivî; heta şkefteke nêzîk hilgirtin:
- Emê sibe hêstirekî peyda bikin, te xelas bikin.

Li şkeftê birîna wî paqij kirin. Ji bo xwarinê giya kelandin danê. Roja din birîndarê xwe li hêstirekî kirin şandin Besta. Piştî çend rojan komê hemûyî berê xwe da wir. Tinebûna xwarinê perîşan kiribûn. Rêveberê wan berê wan da geliyê Berazan. Ne tenê navê berazan lê bû, yekser çar beraz ketin zefta wan. Bi amadekirina goştê berêz re qerebalixeke mezin ket nava wan:
- Guneh e em naxwin.
- Bixwin, xwarin çêtir e ku hûn mecbûrî xwarina tiştekî xerabtir bibin.
- Bixwin û guneh li stûyê min.

Xwediyê vê hevoka dawî Rênas bû. Çend kesên ku destpêkê nexwarin, vê dawiyê neçar man ku bixwin. Piştî sê rojan barê du hêstiran xwarin ji wan re hat, lê pey re jî bêhna şer nêzîk dibû. Kom bi kom ji hev belav dibûn. Bi ketina reşayiyê re ketin meşê. Çend gir û newal derbas kirin. Çîrokên Rênas nedihiştin ku dijwariyên rê sivik bibin. Herdem û her gav tiştekî nû li cem hebû ku bibêje. Ketibûn newaleke dirêj, ew û Rênas li pêşiyê, sê hevalên wan dabûn pey wan. Ji nişka ve çawa ku roj li wan hilê, çaraliyên newalê ketin bin ronahiyê. Yek ji wan qîriya:
- Em ketin kemînê.

Bi qîrîna wî re her yekî xwe avêt paş kevirekî. Hem dereng bû, hem jî talde û tehtên mezin tine bûn. Masî û Rênas man li aliyekî, her sê hevalên wan man li aliyê din. Gule ji her çar aliyan dibariyan. Bi destpêkirina şer re şewqên wan vemirîn û rê dan tîrêjên ku ji guleyan dirijiyan. Dilê tariyê bi xezeb dihat çirandin û axînek bi Rênas ket:
- Heval, ez birîndar bûm.

Her alî li benda jiholêrakirina aliyê din bû. Dem dema man, yan nemanê bû. Bêhna mirinê ewrên reş li ezmanê welêt çêdikirin, ji wan ewran kumên reş û stûr ji çiyayên berfgirtî û behidî re diristin. Masî xwe bi zikkişkê gihand cem Rênas. Tev ku reşayî giran bû, dîsa jî zanîbû ku birînên hevalê wî giran in. Hem ji sînga xwe, hem ji serê xwe derb xwaribû. Birînên nêzîktirîn û şêrîntirîn hevalê jiyana wî hê germ bûn. Bi zorê destê xwe ji bin cilên xwe kişand, dirêjî Masî kir:

- Ez vî emanetî didim te. Wêneyê keçika mina biçûçik e. Ez naxwazim wêneyê Hêvîka mina biçûçik bikeve bin erdê. Ez dizanim birîna min giran e û ezê ranebim. Rojekê ji rojan ku tu li keçika min rast hatî, jê re bêje ji bo ku tu serbilind bijî, bavê te canê xwe da. Bibîne û jê re bêje bavê te gelekî ji te hez dikir. . .

Gotin li ser lêvên Rênas disincirîn, giran giran, lê zelal diherikîn. Gelek tişt hebûn ku bêje, lê mirina lezok û hişk rê neda. Masî mat mabû. Çavên wî nikarîbûn bawer bikin ku serê li ser çoga wî xiliyayî mayî serê Rênas e. Wêne ji destê Rênas girt, xist bêrîka xwe. Xwest li ber dilê wî bide, lê serê wî bi aliyekî ve xiliya û êdî ji bo axaftinê dereng bû. Her tişt qediyabû. Nema pêjna kesekî, an jî dengê çekan li wan derdoran dihat. Ji bilî xemgîniyeke giran ku dikarîbû ew erd hemû daqurtanda û tiştek nemabûya li wir. Masî mabû heyirî. Du rê li pêşiyê hebûn, yan diviya rahêje laşê hevalê xwe û ji wir here, yan ji bo ku laşê wî roja din nekeve destê kujerên wî li wir veşêre. Laşê hevalê xwe hilgirt û meşiya. Nikarîbû pir bimeşe. Dît ku wê wisa xwe û laşê hevalê xwe jî bide destê kujerên rojê. Bi bista çeka xwe ber kevirekî mezin kola. Eniya Rênas ya sar maç kir, li binê kevir dirêj kir û veşart. Ji nişka ve li xwe hay; du tişt bi hev re hatin bîra wî. Yek jê ew bû ku nema dikaribû bigirî û hêtsirên wî nema dihatin, ya din jî, çi bi her sê hevalên wî yên din hatibû? Diviya roj derkeve heta ku qedera hevalên xwe bizane. Lê ya pêwîst ew bû ku berî berbangê ji wê newala dirêj derkeve. Bêtêl mabû bi hevalên wî re. Destê xwe li çeka xwe şidand û bi gir ve hilkişiya. Bi xwe dihisiya ku barê wî girantir bûye. Berê niviştenê bû niha wêneyê keçika biçûçik jî lê zêde bûbû. Bizotik bi dîwarê dilê wî ve hildiperikîn û agir diketê. Dengê şkestina giyayê sinbilgirtî ji nava wî dihat. Dizanîbû ku ew bi xwe tê guhertin, lê çi pê tê wî jî nizanîbû. Berbang nêzîk dibû, hêviyên wî jî pê re dûr dibûn. Carekê serê xwe hilda, reşên du mirovan ketin ber çavên wî. Tariya ji ber şevê mayî nedihişt ku wan nas bike. Xuya bû ku wan jî ew dîtiye. Dengê yekî ji wan hat guhê wî:

- Heval, heval, were em li vir in.

Kêfa Masî pir hat; çawa ku zarok windabûyî çav li nasekî xwe bikeve, wisa bersiva wan da:

- Ez têm.

Nema deng ji wan hat, heta ku gihişt cem wan. Ji nişka ve her du qorociyan berên çekên xwe dan sînga wî:

- Sîlehê xwe bavêje.

Masî çeka xwe navêt. Hinekî din xwe nêzîkî wan kir. Wî jî berê çeka xwe da wan:

- Hûn çekên xwe bavêjin.

Her sê jî ji hev ditirsiyan. Masî û kujerên Rênas li hemberê hev rawestiyabûn, sîleh li hev kişandibûn û her yekî ji hêla xwe ve tiliya xwe danîbû ser tetikê.

Mar nedidît, lê dizanîbû

Wê kêlîka ku çek li hev kişandin, ez di bin mala wî ya dûr de veciniqîm. Çawa wiha giyanê min bi yê Masî ve hatibû girêdan, ez jî nizanim. Mirovan di çîrokan de herdem em mar weke dijmin nîşan dane. Heta li gora yekemîn efsaneya mirovatiyê ya Adem û Hewa, rola mar di xwarina sêvê û vekirina rê li ber şaşiyan de heye. Mar dibe sedem ku Hewa Ademê xwe bixapîne û ji dara sêvê bixwe. Ji wî çaxî ve Xwedê ez avêtime derveyî bihuştê. Lê li cem hinekên weke pîra cîrana Masî ez çawa bûme sembola xêrê, ez jî nizanim. Di çîvanokên me maran de tê gotin ku her marek ji me dibe ku giyanê mirovekî be, aliyê wî yê veşartî û reş be. Baweriya hinekan jî ew bû ku her cara ku marek kirasê xwe diguherîne pîrek an kalek li cîhanê dimire. Dibe ku ez jî ew aliyê giyanê Masî bim. Eger ne wisa bûya, çima bi veciniqandina wî ya li ber dergehên mirinê yên vekirî re, yekser ez jî veciniqîm.

Ew cara yekê bû ku Masî ewqas bi cidiyeta nêzîkbûna mirinê dihise û xwe ji mirinê re amade dike. Ji aliyekî ve jî li xwe û li kujerên li hemberê xwe şaş mabû. Çend filmên Emerîkî

yên kawboyan yên berî hingê temaşe kiribûn, hatin bîra wî. Nizanîbû ev hatina beramberî hev, şervan û leşker, bi vê nêzîkbûnê di vî şerî de jî heye. Mesele ewqas cidî bû ku lebitandina tiliya yekî ji wan wê her tişt biqedanda. Teqq,. . . . . û wê reşayiya mirinê bihata. Masî ji çavên xwe bawer nedikir, çawa ku yekî din be ku ewqas nêzîkî mirinê bûbe û ew jî temaşevanekî bêalî be. Bi biryar bû ku yek ji wan biteqîne û derbê lêxîne, ew jî wê herduyan bide ber gulleyan. Biryar wiha bû; yan wê her sê kesên li hemberê hev di nava tariya wê şeva lal û bêdeng de bi hev re di nava xwîna xwe de bigevizin, yan jî wê sax bimînin. Wê gavê, di çavên her du kesên li hemberê wî de, hêvî vemirîbû. Destpêkê her du bi nêçîra xwe ya giranbiha kêfxweş bûn, lê çirîskên xezebê yên ku ji çavên Masî dipekiyan nava tariya kerr û têkçûyî, tirseke mezin xistibû nava wan û çog li wan sist kiribûn. Masî, bi wan re li ser wê pira ziravik ya di navbera mirin û jiyanê de ket bazareke giran. Bêhna mirinê li wan deveran belav bûbû. Her sê bi xwe dihisiyan ku êdî ew bazara wan ya dawî ya jiyanê ye. Gotinek, livek, kêlîkek dikare sê laşan li ber hev raxe. Her duyên di bin rehma çeka Masî de di bin çavan re li hev dinerîn. Çavên wan ji hev re digotin; êdî dereng e û dema xapandinê jî nemaye. Her sê bi çekên li ber teqandinê demeke dirêj bêdeng man. Tenê tirs dipeyivî; diçû û dihat, zimanê xwe derdixist û bi guhê mirinê girtibû anîbû ber lingên wan. Yekî ji wan kevirê xwe di serê bêdengiyê de lêxist:

- Em dev ji te berdin, wê leşker dev ji me bernedin. Jixwe baweriya wan bi me nayê.

Yê din destek da gotina hevalê xwe:

- Eger em te berdin, wê ew me bikujin.

Masî xwest ku dilê wan bixe cih:

- Şev reş e, ne min hûn dîtine, ne jî we ez dîtime. Bihêlin ez bi riya xwe ve herim, çêtire.

Bi Masî re ketin bazareke din:

- Emê çeka te veşêrin. Bi soz emê bêjin me bêçek girtiye. Wê hindikî ceza bidin te, wê te berdin.

Yê din jî piştgiriya bazara hevalê xwe dikir:

- Wisa emê jî bên xelatkirin û tuyê jî bi cezayekî sivik xelas bibî.

Masî bêhna xapandinê ji bazara wan dikir. Ji bo wî dem ne dema bazar û danûstandinê bû. Jê re eşkere bû ku dixwazin yan berê wî bidin teslîmbûnê, yan jî di nava axavtinê re derbekê lê bixînin. Hestên şervanekî ku di nava mivredên xiyanetê de hatine tûjkirin, Masî ajotibûn ber qîrîna dawî:

- Ez li vir bêm kuştin çêtir e ku ez bi saxî bikevim destê wan. Niha biryarê bidin. Eger hûn niha nebêjin erê, yan na, ez li benda we namînim. Ezê berî we sîleh biteqînim. Ezê we bikujim û bila ez jî bêm kuştin.

Destên her duyan li hemberê wî li ser çekên wan hatin şidandin. Tirseke mezin ket dilê wan. Bê ku bi hev bişêwirin, herduyan bi hev re got:

- Temam. Temam.

- Naxwe me ji hev fêm kir. Ne min hûn dîtin, ne we ez dîtim.

Bi van gotinan re Masî bi paş ve, gav bi gav vegeriya:

- Çekên xwe bidin alî.

Heta kêlîka ku ji ber çavên wan winda bû, Masî li paş xwe dinêrî. Di wê baweriyê de bû ku imkan hebe wê careke din lê bizîvirin. Lê Masiyê bi tenê di nava çiya û newalan de bûbû mîna teyrekî nû bi firê bikeve. Xelasbûna wî ya vê carê ji mirinê hêzeke mezin dabûyê. Xwarin pê re nemabû; ne giya, an pelên daran, ji ber kêfa mana li jiyanê dikarîbû keviran bixwe. Berê xwe dabû aliyekî, nizanîbû kîjan alî ye, lê tenê dizanîbû ku êdî ev alî berûvajiyê aliyê mirinê ye.

Ji hêla xwe ve, ez marê binê erdê, dilê min bi Masî ve bû, ewê ku li ser erdê bê av bi mana li jiyanê kêfxweş dimeşiya. Wê kêlîkê xwestekeke tenê ya Masî hebû; dixwest ku bosteke erd ji xwe re bibîne da karibe li ser bê kuştin, bê azar û perçiqandin karibe şûna her du lingên xwe çêke û guh bide dengê dilê xwe, guh bide awaza bêrîkirina Berfîna nebedîbûyî.

Derdê Masî ew bû ku di wê meşa dirêj de li deverekê, li geliyekî, newalekê, li paş kevirekî, li binê darekê, li quntara çiyayekî li Berfîna xwe rast bê. Dizanîbû ev xewnek e û pêk nayê, lê vê xewnê alîkariya lingên wî dikir ku bi çiyan ve hilkişe û di newalan de bimeşe, heta ku bigihîje ber sînoran. Li gora xwe, cihê kevalên xwe texmîn dikir. Wisa tîbûyî ket rê. Ji wî weye ku bi gihiştina cih û wargehên hevalên xwe re, wê bi kêf here cem wan û dest bi çîroka meşa xwe ya dirêj û dijwar bike, lê wisa nebû. Piştî demekê gihat quntara çiyayê Metîna. Xwe avêt hembêza çiyayê bilind, xwe avêt hembêza hevalekî xwe û giriya. Ne ew tenê, bi dîtina wî re kesek nekeniya. Nizanîbû ew giriyê ecêb wê gavê ka ji ku hat û bi qirika hemûyan girt. Masî tevlî masiyên din bû û xwe berdan nava ava zelal ya azadiyê, ew azadiya ku ji serê çiyayê Metîna ber bi newalan ve co bi co, kevir bi kevir, diherikî. Ez jî di wê qula tarî û xewle de li benda Masiyê evîndar pîr dibûm û bi giyanê wî re min xwe dida ber siya Berfînê. Berfîna li wir û di hundirê sînga Masî de qiyamet rakirî û çûyî. Min di dilê xwe de got ezê bi te re bimînim Masîkê min, çiya bi çiya, erd bi erd, giyan bi giyan emê ber bi şûna her du lingên Berfînê ve herin, ew Berfîna bakurê dinyayê ew daqurtandibû.

Şûtika germ û dilê sar

Di jiyana xwe ya rojane de kesekî ji wan ez li pişta xwe nedigerandim. Lê ji bo şervanekî şûtikeke weke min dikare her tiştî bike. Dibe ku ji dûr ve ez tenê mîna paçikekî li nava şervanekî pêçayî bêm dîtin, lê panbûn û dirêjiya bejna min ya sîh mitreyî dikişe, dikare herkesî li bidestxistina min germ bike. Di rojên teng de dikarim bibim mitêl, lihêf, ji şervanê birîndar re dikarim bibim (band)ê li birînê tê pêçan. Di dema berf û bahozan de, ji lingên ji berfê şewitî re dikarim bibim sol, ji kesên ku ji bilindayiya çiya û giran re nebin qurban, dikarim bibim werîs, ji çerm û goştê şervanekî ciwan re bibim tirs û guleyên ku ji nişka ve tên, hemêz bikim bê ku zirarê bide wan. Dîsa dikarim bibim benê qirika birîndarekî êşgiran ku mirinê ji jiyanê xweştir dibîne, yan jî ji bo tiyekî ez avê ji cihên kûr derxim. Divê ez vê bêjim ku şensê min ji yê gelek şûtikên din baştir bû, ji ber ku ez bûm şûtika Masî yê ku bi rastî qedir dida min û ji bîr nedikir ku ezê gelek caran karibim bi hewara wî ve biçim.

Vê carê riyeke dirêj li ber Masî bû. Li derdora pêncî şervanî bûn, dixwestin ji Metînan derbasî aliyê Hekarî bibin. Ji bilî Masî, Barî, Serhedo, Bawer û Bêrîvan jî di nava komê de bûn. Barî yê evîndarê dîrokê navê qorociyan kiribû ‘Alayiyên Hemîdî.’ Yên ku dixwestin şervanan derbasî aliyê din yê sînor bikin ev Alayiyên Hemîdî bi xwe bûn. Bi qorociyên ku bi şev nobetê digirin re li hev kiribûn ku wan bê xirecir derbas bikin. Barî bi kêf bû:

- Va ye hinek ji Alayiyên Hemîdiyên me yên niha ji yên dema Osmaniyan çêtir in.

Qorociyên nobetdar ew derbas kirin. Her ku meşê dewam dikir, rê dirêjtir dibû, gav bi gav xwarin jî kêm dibû. Ji hev re digotin:

- Haya we ji we hebe, xwarin neqede.

Roja çaran hemû bê nan man. Serma şevê û bayê sar ricif û lerz xistibû nava herkesî. Her serê du gavan yek ji komê diket, heta ku hemû mîna terman li erdê dirêj bûn. Ji nişka ve mizgîniyek belav bû. Hat bîra yekî ku kîsekî ard li devereke nêzîk veşartiye. Diviya çend kes herin bînin, lê kesekî ku karibe bimeşe tine bû. Ji birçîbûnê nava Masî li hev diket. Hinek ji ser hişê xwe diketin, hin jê di xew re diçûn. Pêncî gewdeyên bêhêz, birçî û tî, hinekan çavgirtî, hinekan jî çavvekirî li ezmanekî vala, ziwa û kor dinêrî. Masî û çend hevalên xwe yên ku çûbûn ard bînin, li kevirên spî rast hatibûn. Hirç bi ser kîsê ard ve bûbû û ketibû navê tarûmar kiribû. Ardê mayî xirab bûbû, di navê de tişt û mişt hebûn. Di nava xwe de li hev kirin ku ti kes ard wisa nebîne. Bi keviran bi gilokên kevirî yên ard ketin, hûrhûr kirin. Yekî ji wan bang li Masî kir:

- Ka şûtikê werîne.

Masî ne ez, şûtikeke din bir da li şûna moxilê bi kar bînin. Ardê xwe li şûtikê kirin. Li gora jimarê girik çêkirin. Ji tenekeyên rûn yên vala sêl çêkirin û bi qirşikan agir dadan. Ew şev bi xwarina girikên ard yên pijiyayî meşiya. Roja din bi bêtêlê alîkarî hat xwestin. Ji dûr ve nan û ava bacanan ji wan re hat. Piştî ku têr xwarin dengê Serhedo bi ser yê hemûyan ket:
- Vêca bila werin, wileh heft tabûr ê nema bi min karibin.

Du rojên din derbas bûn. Dîsa tiştek ji bo xwarinê nema. Bi derketina keşfê, komika ku Masî jî yek ji wan bû, niyeta xwe li nêçîra mehînekê û caniya wê xerab kirin. Dev ji keşfa aliyê Qereqolê û leşkeran berdan, ketin pey keşfa mehînê. Dikirin, nedikirin mehîn û caniya wê nedihatin girtin. Bi hîleyan û bi dizî yekî ji wan derbek li mehînê xist. Canî reviya. Bi amadekirina goştê mehînê re qelebalix û hêlehêl ket nava koma mezin:
- Ev goştê çi ye?
- Goştê çêlekê ye. Me ji gund anî.

Berî hingê di nava koma biçûçik ya keşfê de bûbû xirecir. Bawerê ku nedixwest baweriyên xwe yên olî bişkîne, şertek li ber wan danî:
- Yan hûnê şertê min bi cih bînin, yan ezê ji hemûyan re bêjim goştê mehînê ye.
- Şertê te çi ye?
- Divê hûn kezebê bidin min.

Baweriya wî ew bû ku kezeb ne goşt e û bê ku baweriya wî xerab bibe dikare bixwe. Tev ku şertê wî bi cih anîn jî, lê piştî ku goşt qediya, hemuyan bihîstibû ku goştê mehînê xwarine. Careke din bû xirecir. Hinekan digot ku Li gora Islamê goştê hesp û mehînan helal e, hinekan jî digot, na heram e. Herdem meşê xirecirên mezin li pey xwe dihiştin.

Vê carê berê wan li Xerza bû. Meşa bi mehan li pêşiya wan bû. Heta gihiştin derdora Besta jî têrxwarin tine bû. Xwe gihandin hevalên xwe yên ku keriyên pez di destên wan de bûn. Jimara mîh û beranan bi ser pêncsedî diket. Xwe bi perîşanî gihandin wir. Di rê de çay ji giya çêdikirin. Solên wan hemû riziyabûn û rengê nan ji bîr kiribûn. Bûbû hewarhawara Barî li nan dipirsî:
- Ez ne ji bo xwarinê li nan dipirsim. Ezê pariyekî bi serê darekê ve dalqînim û ji xwe re lê binerim.

Li wir her roj mîh dihatin şerjêkirin. Goşt dikirin qelî hiltanîn. Xwarin, sibê, nîro û êvarê goşt bû. Sibê diqelandin, nîro dikelandin û êvaran sor dikirin. Piştî roja sisiyan Masî nema karîbû goşt bixwe. Ew û hevalên xwe hemû bi zikêşê ketibûn. Di ber re nedigihan ku rext û şûtikên xwe girê bidin. Berpirsiyarê deverê şîret li wan dikirin:
- Xwe ji hêla pisîkolojîk ve perwerde bikin. Bi gepa yekem re ji xwe re bêje, ha ev nan e. Bi gepa duyem re bêje, ha ev goşt e û bi gepa sisiyan re jî bêje, ha ev dew e.

Pişt re li Masî û hevalên wî zîvirî:
- Evên berê we li Xerza, zû herin ji bo em karê xwe bikin.

Masî û hevalên xwe dan rê. Rawestgeha din Wan bû. Hê di rê de, bihîstin ku li Besta karê xwe baş kirine. Ev jî dihat wateya ku êrîşên wan gihiştine encamên xwe û ti zirar nedîtine. Ji ber wê bi moralekî bilind gihiştin hevalên xwe yên li herêma Wanê. Di wê navê re hevalekî Masî reviya gihişt dijmin. Di ezmanê dilê Masî de, ji hêlekê ve xeyala Azadiyê û keskesorên serkevtinê reng didan, ji hêla din ve tîrêjên êşê yên têkçûn û revê serî hildidan. Di nava her du hêlan de, sitêrkên giyanê Masî geh bi kêf, geh bi xemgînî diçirisîn. Nêzîkbûna gola Wanê ya ku di stiranan de bihîstibû, rehet dikir. Li cem hevalên wir goşt tine bû, lê nan û germiya firîkan hebû. Ji xwarina wê ya rojane, ne zikêşê, vê carê hişkayiyê bi roviyên wan girtibû û hemû qevzoyî bûbûn. Diviya wê şevê jî bêhna xwe li wir vekin, xwe li binê tehtên derdora Wanê dirêj bikin û roja din bidin rê. Serê sibehê, berî ku ji xew rabin, dengek li ser serê Masî bilind bû:
- Leşker ket nava me.

Masî çavên xwe vekirin, dît ku hemû li nava hev ketine û çar alî dibezin. Hevalin wî nû kîsên ard vekiribûn. Xwestibûn nan çêkin. Kîs wisa vekirî hiştibûn û reviyabûn. Masî ard xist

hembêza xwe û reviya. Leşkeran çaraliyên wan girtibûn. Wê rojê, heta êvarê li hev teqandin. Bi hatina şeva dilovan re ku dikare bi perdeya xwe ya reşî fireh alîkariyeke mezin bi şervanan re bike, kom bi kom ji hev belav bûn û li deverên nû bi cih bûn. Masî û neh hevalên xwe çûn aliyê Tetwanê. Mal bi mal, çi bi destê wan diket, goşt, savar, çay, qehwe û heta kincan bi xwe re dibirin. Hinek ji bo rojên teng vedişartin, hinek jê bi kar tanîn. Pilana girtina ser marketeke mezin de çêkiribûn. Pilan du rû bû, rûyê veşartî ew bû ku rêveberê wan pereyên xwediyê marketê danêyê û lazimiyên xwe jê re destnîşan kiribûn. Pilana eşkere jî ew bû ku bi zorê marketa wî talan bikin.

Êrîş birin ser Marketê. Li ber çavên ajovanên wir li xwediyê Marketê xistin. Di bin siya gefxwarinan de dest danîn ser lazimiyên xwe. Bi zorê barên xwe hilgirtin û çûn. Xwediyê Marketê telefonî polîsan kir. Hê dûr neçûbûn çekên giran şixulîn. Rê dirêj bû, ji bo ku bigihîjin cihê xwe diviya heta serê sibehê bimeşin. Berî ku roj hilê xwe gihandin cihê xwe, lê roja din bêhna şerekî din dihat. Jimara koma Masî gihiştibû sihî. Her roj pênc kes li serê gir bûn. Karê wan hem keşif, hem jî parastin bû. Leşkeran derdor girtibû, dixwestin hemûyan di newalê de asê bihêlin û bi yek derbê hemûyan bikujin. Helîkopteran leşker dadixistin, Koprayan jî li wan dida. Li serê gir tenê didu sax mabûn. Heta êvarê ji jêr, ji jor, ji çar aliyan bombe dibariyan. Diviya Masî û hevalên xwe yên saxmayî ji wir derkevin. Leşkeran bombeyên ronîkirinê davêtin. Hema hema weke rojê bû. Dixwestin bi bombeyên xwe zora reşayiyê bibin. Reşayî ji Masî û hevalên wî yên ku xwe bi giya veşartibûn re, bûbû perdeya jiyanê. Gava zanîn ku nikarin wê şevê xwe bigihînin cihekî asê, biryar dan ku li wir veşartî bimînin. Mana li ber kevirên wir xetereke mezin bû, lê riyeke din jî tine bû. Heta ku ronahî li dinyayê hebû ew jî bê liv û bê tevger bûn. Bi ketina reşayiyê re xwestin ku bi cenaze û birîndaran ve herin. Navê cihê birîndarek û doktorek lê hiştibûn, kiribûn nexweşxane. Cihê yekem ku Masî, Barî û Bawer berê xwe danê ew bû. Dîtin ku her du hatine kuştin. Bi awayê kuştina wan, leşkeran xwestibûn ku (nameyekê) ji şervanên din re bi rê bikin. Bi benekî her du tiliyên mezin yên destan bi hev ve hişk girê dabûn. Tazî kiribûn, cilên wan şewitandibûn, nava tiliyên wan bi cigareyan şewitandibûn û laşên wan dabûn ber guleyan. Doktor û birîndarê wî her du bi wî awayî kuştibûn. Her du veşartin û berê xwe dan jora gir. Bawer di hundirê xwe de dikeliya. Nema bi xwe karîbû:

- Bextreşiya me ew e ku em bi hinekan re şer dikin ku ne hurmeta jiyanê dizanin ne jî ya mirinê.

Barî lê zêde kir:

- Min pir dixwest ku ez li hemberê dijminekî mezin şer bikim.

Bawerê ku dilê wî li hev diket, bi hêrs dipeyivî:

- Erê, hêzeke mezin e, lê bêexlaq e, bêmistewe ye. Xwedêgiravî exlaqê şer jî heye!
- Ji xwe ku ew exlaqê tu dibêjî hebûya, wê ev şer di serî de neqewimîbûya.

Masî bi guhekî li her du hevalên xwe guhdarî dikir û guhê din li ser dilên dayikên wan bû, li ser rewşa malbat, hêvî, xewn û xeyalên xwediyên wan laşên şewitî bû. Li jorê, li solekê terpilî. şervanê xwediyê solê tazî kiribûn, serê wî şewitandibûn û avêtibûn jêrê. Li cem solê du laşên tazî li ser piştê dirêjkirî bûn. Devê yekî xistibûn navbera lingên yê din û agir berdabûn wan. Li wir gotin di devên wan de pûç bûn. Nema derketin. Bêhna pora şewitî ketibû nava bêhna dohn û şewata goştê mirovan. Bawer dest bi girî kir; soz da ku destê xwe nede wan û wan veşêre. Bi şîşên çekên xwe yên hesinî Masî û Barî erd kolan; ne bi temamî be jî laşên şewitî veşartin. Bawer ketibû rewşeke xerabtir û dest bi qîreqîr û xeberdanên ku nedihatin fêmkirin, kir. Wisa xuya bû ku hişê xwe wenda dike. Barî du sîle lê xistin, dengê wî birrî, lê tirsa wî zêdetir bûbû. Masî bi xwe jî hem nava wî li hev diket, hem li hemberê tevlîheviya Bawer şaş mabû û nema zanîbû ka çawa bide rawestandin.

Ji wir xwe berdan ser avê. Tevlî wê serma giran Masî serê xwe xist nava avê û her sê vereşiyan. Heta çend rojan dihatin xewna Masî. Bêhna şewat, dohn, hestî û goştê mirovan bi serê wî ve mabû. Piştî çend rojan Masî li rewşa Bawer pirsî. Barî bi xemgînî bersiv da:
-Ji wê rojê ve serê xwe xwariye.

Rewşê wisa dirêj nekir. Di nava toz û dûmana şerê bêrawestandin de Bawer reviyabû. Kesî nizanîbû ne çûye teslîmî leşkeran bûye, ne jî bi çolan ketiye. Ji derdorên din jî nûçeyên dijwar mîna stiriyan dihatin guhên Masî. Qala bikaranîna çekên kîmyawî dibû, qala şewitandina laşên pênc jinên şervan bi asîdê dibû. Berî vê û wê û berî her tiştî birçîbûnê diranên xwe li giyanên her bîst şervanên mayî qîç kiribûn. Li derdora Tetwanê li qorociyekî baş digeriyan. Dijwariya birçîbûnê nema rê dida mana li benda encamê. Mabûn li benda derfetekê:
- Ya baş ew e ku em kesekî ji wan bigirin û fidyê ji wan bixwazin.

Ji wan re li hev hatibû. Muxtar lawê xwe, xulamê xwe û gayê xwe dabûn pêşiya xwe, hatibûn cot. Şervanan dora wan girt. Ev soz dan wan:
- Em zirarê nadin we, netirsin.
Gava muxtar daxwaziya wan zanî, yekser ferman da xulamê xwe da here ji wan re birinc, ard, makerûn, şekir, çay, savar, nan û tiştên din bîne û bê ku kesekî bi xwe bihisîne, vegere. Masî xwest pirtir xulam çavtirsandî bike. Baweriya wî bi çavên xulam yên reqisok nedihat:
- Emê êvarê li ser rê hev bibînin. Eger tu xeberê bidî qereqolê, ne tenê muxtar û lawê xwe, tuyê jî bêyî kuştin.

Tev wê jî, xulam çûbû cem leşkeran; bi hev re pilan çêkiribûn ku piştî berdana muxtar û lawê wî, leşker bê bi ser wan. Li wan derdoran hinek daristanên biçûk hebûn. Ji wan pêve her der deşt bû. Êvarê, li ser rê, muxtar û lawê wî berdan. Masî û hevalên xwe bilez erzaqên xwe veşartin, barên xwe dan pişta xwe û ketin rê. Heta ji ber çavên hev wenda bûn jî Masî dixwest hevalên xwe şiyar bike:
- Baweriya min pê nehat.

Wê şevê di nava daran de man. Serê sibehê bi hezaran leşkeran derdora wan girtibû. Gava Masî çavên xwe vekirin, leşker hê ber bi cihê wan ve dikişiya û qorociyan bi mîkrofonan bang dikir:
- Werin, emê we efû bikin.

Berên tangên xwe dabûn daran û teqîna çekan gav bi gav pirtir û dijwartir dibû. Hinek leşkeran xwe berda nava daran. Li hemberê cihê Masî, Barî û hevalekî wan yê din yê xwe dirêjkirî veşartîn, sekinîn. Li aliyê din, dengê çekan bênavber dewam dikir. Çawa ku hevalê bi wan re xwe livand, derb li pişta wî ket û bi ser Masî de ket. Her yek li paş qurmê darekê bi cih bûbû, gule bi ser yên li hemberê xwe ve dibarandin. Cihê Masî lê bi cih bûyî, bûbû hedefa guleyan. Zêdeyî sîh guleyî li qurmê dara li piştê ketin. Li ber guhê wî, nêzîkî pozê wî, li ber çavên wî mêşa mirinê diçû û dihat. Wî jî berê boriya çeka xwe dabû wan û bênavber mirin dida alî û ber bi wan ve dişand. Guleyekê berê xwe da navika wî, lê ji ber ku ez lê pêçayî bûm, bi zorê xwe gihand çermê zikê wî. Birîneke biçûçik li pey xwe hişt. Ew cara yekê bû ku ez rastûrast wî ji mirinê rizgar dikim. Gava tîreke germ xwe berda bin çermê wî, naskir ku guleyê zirareke mezin gihandiye min, ji ber wê ew nekuştiye. Bi serê tiliyên xwe kêlekeke min bilind kir, ez maç kirim. Bi xwe re diaxivî:
- Kî bawer dike ku şûtikek mirov ji mirinê xelas bike û temenê mirov dirêj bike?

Masî her du hevalên xwe dan dû xwe û berê xwe da newaleke nêzîk:
- Dûrbîn ji destê Barî girt, li hawîrdor nerî:
- Piştî van daran, girên rût in û çaralî leşker bi cih bûne.

Masî û hevalên xwe serên xwe bi pelên daran nixumandibûn û çavên xwe li riyekê digerandin. Qorociyan mîkrofonek danîbû ser erebeyekê, bang dikirin:
- Werin, emê birîndarên we derman bikin, emê we bizewicînin.

Çenda ku xwe xistibûn rengê pelên daran, lê ji ber ku pir nêzîkî hev bûn –heta hêlma xwe hêdîka berdidan- derketina dengekî dikariya bibe sedemê kuştina hemûyan. Di heman demê

de tîsorkê bi Barî girtibû, qerpika wî nedisekinî. Her ku qerpika wî hildihat, Masî digot qey hatin keşifkirin. Gava dît ku qerpika wî nasekine û leşker deh deh xwe di ber wan re berdidin jêrê, kefî xist devê wî û bihêrs di guhê wî de got:
- Ku ne wiha be, tuyê me bidî kuştin.

Ji bo ku bikevin tevgerê û xwe li cihên asê bigirin, şervan hemû li benda hatina şevê bûn. Bi şev birîndarên xwe derman kirin. Leşkeran hinek cenazeyên wan biribûn. Tenê gayê muxtêr li wê navê mabû; yekser dest bi şerjêkirina wî kirin. Sola Masî ji hev ketibû, bi kêrê ji çermê ga, ji xwe re solek çêkir. Pişt re hat xwestin ku hin birîndar û nexweşan bibin Bohta û yên din jî ber bi Amedê ve herin. Şeva din, berî ku bi rê bikevin, hevalekî wan got; ezê herim ser avê goreyên xwe bişom. Ew û du hevalên xwe çûn û nema hatin. Ji leşkeran re gotibûn; berê wan li aliyê Amedê ye. Leşkeran agir berda daristanê, hemû şewitandin. Ji ber wê, di wê meşa nozdeh rojan de, ew bi ku ve diçûn, bi çekên giran, leşker bi ser wan de digirt. Barî ya di dilê Masî de digot:
- Xuya ye ku wan jî xwe li gora me bi rê xistiye. Em li ser kîjan riyê bin ew jî li wir in.

Her tim rêveberê komê digot:
- Daristan nêzîk e.

Ne li daristanan, li qurmên darên şewitî rast dihatin. Rêveberê komê li çareyekê digeriya:
- Divê em rê li xwe bizîvirînin. Divê ew şopa xwe wenda bikin.

Ji hevalên xwe xwest ku herkes li gora cidiyeta rewşê tevbigere û baş bizanin ku hemû di bin baskê kuştinê de diçin û tên. Rêveber berê wan da newalekê. Li wir dengê leşker û qorociyan dihat. Leşkeran dixwest vegerin:
- Heta vir bes e, ne mumkin e ku xwe berdin vê deştê.

Qorociyan ev biryara wan nedipejirand:
- Na, li vir in, emê wan bigirin.

Berî êvarê, ji bo firavînê, leşkeran xwe berda qereqolên xwe. Li hêla din jî, Barî dixwest bê ku dûman derkeve, çayê ji hevalên xwe re çêke. Barî agir dikir û pif dikir darikên şewitî:
- Barî, dîsa dûman derdikeve.

Bi vê gotina rêveber re, Barî xwe şaş kir û li şûna ku darikan bavêje ser êgir, çeydan danî û dûman bilind bû. Ev bû sedem ku bi lez û bez meşeke din dest pê bike. Di rê de şîlan û giya miya dixwarin. Ji lingên Masî xwîn dihat û êşeke sivik ketibû birîna zikê wî. Li dawiya rêzê mabû, bi şaxekî şopa lingên xwe xeradikir û dimeşiya. Rêveberê wan bi bêtêla xwe li leşkeran guhdarî dikir. Ji hev re digotin:
- Wa ye hatin.

Û jimara wan ya rast ji hev re digotin. Baş têgihiştibû ku ew wan dibînin û li bendê ne ku nêzîktir bibin. Ji bo ku wan şaş bike, rêveber ferman da ku hemû berevajî bimeşin. Ango yê li paşiya rêzê bizîvire, yên din hemû bidin dû. Pişt re ew jî çû xwe gihand Masî. Bi vî awayî pilanên dijmin tevlîhev kirin. Bûbû carwara leşkerên li benda nêzîkbûna şervanan:
- Ka nehatin. Ma çawa bû?

Gava leşkerên kontrolê dîtin ku bi rastî kesek ji wan ve nexuya ye, nema zanîbûn ka çi bikin. Hema yekser lêborîna xwe xwestin û gotin:
- Xuya ye reşên heywanan bûn, me got qey ew in.

Ji bo ku pilana xwe bigihîne serî, rêveber fermaneke din da:
- Heta sibê divê hûn hemû di binê erdê de bin.

Cihên xwe di erdê de û li ber keviran çêkirin û giya bi ser xwe de kirin. Heta bû serê sibê wisa man. Diviya êvarê bidin rê. Pey re fermana amadeyiyên meşa dirêj hat:
- Ji ber ku rê dirêj û dijwar e û hûn jî westiyayî ne, ji bilî çek û rextên xwe, hûn çi diavêjin biavêjin. Eger me xwe zû gihand bajarokê Norşînê, mirin li pey me dimîne.

Xwe gihandin wir û ber bi Mûşê ve meşiyan. Di rê de warina wan şîlan, pelên daran û berf bû. Nêzîkî Geliyê Gozan bûn. Hemûyan xwe avêt erdê:
- Em ji leşkeran xelas bûn, lê emê birçî bimirin.

Gwîz nêzîk bûn, lê kesekî ku bi xwe re bibîne, xwe bigihîne wir tine bû. Piştî bêhnvedanê nû karîn berê xwe bidin gwîzan. Hin dikelandin, hin diqelandin û hin jê xav dixwarin. Ji kêfan bi gozan li hev dixistin. Divabû roja din herin aliyê Qulpê. Li wir toraq, penêr her tişt veşartibûn. Lê hê di bin çavdêriya leşkeran de bûn. Koprayan bê navber xezeb û jehra xwe ya mirinê di jor de bi ser wan de dibarand. Kuştî û birîndar li şûna xwe dihiştin. Agir li dora wan pê xistibûn û dixwestin xelekê roj bi roj li wan teng bikin û wan jî mîna dar, çiya, giya û lawiran, bişewitînin. Li pişt cihê şervanên Çiyayê Keskesor ji berfê spî dikir, ji bo leşkeran asteng bû. Dema şervanan xwe berda newalê û ber bi hembêza Keskesorê ve çûn, jimara wan gihiştibû pêncî. Masî li dawiya rêzê dimeşiya. Tenê yên birîndar hêdî hêdî li pey dimeşiyan:
- Ez dikarim alîkariya te bikim?
- Na, barê min tine ye, lê nefesa min baş naçe nayê.

Masî gazî hevalên xwe kir:
- Bisekinin, hevalek bi şûn ve maye.

Rêveberê komê ji keçeke din xwest ku ji bo alîkariyê pê re bimîne û meşa xwe ya di nava firtoneyê de bi hev re dewam bikin. Haya ti kesî jê tine bû ku ketine kemînê. Bi teqîna guleya yekem re firtoneyeke din di nava wê firtoneya berfê de rabû. Her du keçên li paş dimeşiyan bûn armanca guleyên leşkeran. Li nêzîkî Masî her du ji qam ve hatin xwarê. Mîna ku yek kulmeke xurt li kêleka zikê wî bixe, Masî bi derba guleyê hisiya. Li ber tehtê li hevalekî xwe zîvirî:
- Xuya ye ez birîndar bûme.

Reş ketibû erdê. Hemû li hev digeriyan. Vê carê reşayiyê jî rê li ber Koprayan negirtibû. Piştî nîvê şevê bû gava ku bombe û top bi ser serên wan çiyayan de dibariyan. Her ku firokeyekê di jor de diavêt, di jêr de çiya dihejiya. Masî nema zanîbû çi li derdora wî diqewime. Gava çavên xwe vekirin dît ku şeş hevalên wî li dora wî ne:
- Em te rakin.
- Na, sîlehê min rakin.

Geh bi xweşikayî û geh bi zorî heta berbangê meşiyan. Birîna Masî sar bûbû. Dilê wî li hev diket. Ji bo karibe bimeşe, carê hevalekî wî li pêşiyê çend mitreyan berf vedikir. Lê tev wê jî nema karîbû:
- Heval bimeşe.
- Ne ji ber birînê, ji birçîbûnê ez nema karim.

Çend rojên wî derbas bûbûn, ji bilî berfê tiştek nexwaribû. Hevalekî wî toraq dayê. Qarînî pê ket. Hetanî ku ew toraq bi vereşanê ji hundirê xwe neavêt bêhna wî venebû. Li quntara çiyê Masî ji hawhaw ket û qidûmên wî nema şixulîn:
- Hûn herin. Ez nema karim.
- Emê herin lê emê li te vegerin.

Çûn lê venegeriyan. Du roj û du şevan berf nesekinî. Masî di nava berfê de mabû, geh ji ser hişê xwe diçû, geh bi xwe dihesiya. Geh li ser piyan, geh li ser zikê xwe hewl dida ku ji nava berfê derkeve. Lê her ku hinekî diçû ber bi jêr ve digindirî. Li quntara çiyê xwe li cihekî çawa ku hatibe kolan, girt. Piştî ku ket kortikê nû naskir ku qula hirçê ye. Hem tirsê girt, hem dilê wî ket cih ku êdî li devereke asê ye. Nû li birîna xwe haydar bû. Derb li cercûra wî ketibû, xwe gihandibû goşt. Bi çavekî tijî memnûnî li min nêrî. Di ber xwe de dikir pistepist:
- Ne ji vê şûtikê bûya, niha ez miribûm.

Sola wî çûbû. Careke din li min zîvirî:
- Ya baş ez solekê ji şûtika xwe ji xwe re çêkim.

Perçeyek ji min kir, li her du lingên xwe yên werimî gerand. Çawa ku pê li avê bike, dimeşiya. Wisa bêçek, bêsol, birîndar û westiyayî dixwest xwe bigihîne cihekî ku tiştek lê hatibe veşartin. Gelekî nemeşiya, dîsa rûnişt. Birçîbûnê nehişt ku di qula hirçê de dirêj bike. Ew jî bi xwe dihisiya ku mîna hirçekî birîndar e û li van çiyayan ji xwe re li nêçîrekê digere. Pişta xwe da tehtekê, lingên xwe vekirin. Tiliya lingê ya beranekê heliyabû. Tenê neynok

mabû. Nema zanîbû ka çawa li wir di xew re çûye. Li ser dengê sê hevalên xwe ji xewê rabû. Her sê hevalên dema di hatina koprayan de ji bo anîna xwarinê daketîn gundên nêzîk, ew bûn. Ji bo veşartina termên hevalên xwe, bi xwe re bêr û kuling anîbûn. Gava Masî dîtin, her sê bi hev re giriyan. Hingî Masî berf xwaribû nema dengê wî derdiket. Xwarina bi wan re hewdela ji ardê qemirandî û şekir bû. Wê rojê Masî birçîbûna xwe bi wê hewdela şêrîn şikênand. Di rê de her çend gavan, kevçikek didanê. Hevalekî wî xwest sola xwe bidiyê, lê ji wermê, nema sol li lingên wî dihat. Li ser pişta xwe kirin, ber bi gundekî vala û xerabe ve meşiyan. Li kavilekî bi cih kirin. Yek ji wan li cem ma, yên din çûn. Di wê navê re ne xezeba Koprayan, ne jî agirê leşkeran li jêr betal bûbû. Hevalê li cem mayî çû nava gund. Li vegerê kerek bi xwe re anî, hat. Masî li ker siwar kir, berê xwe dan newalekê. Ker dûrî çavan girê dan, ew jî li wir bi cih bûn. Wê şevê mîna ku her du lingên Masî di beroşeke ava kelandî de bin, êş, şewat û jan ji wan diçû. Carwara wî bû, dinaliya. Serê sibehê hevalê wî derket; heta êvarê nema pêjin jê hat. Bi vegera wî re sê hevalên din jî bi xwe re anîbûn. Nan û penêr ji Masî re anîbûn. Birînê dilê Masî tenik kiribû. Her ku hevalên xwe didîtin, hev hembêz dikirin û bê deng digiriyan. Hevalên wan yên ku heta roja berî hingê bi hev re radibûn û rûdiniştin, îro ne li jiyanê bûn; dema dihatin bîra wan hêstiran zora her tiştî dibir û diherikîn. Ji Masî re gotin:
- Li biryargehê ji me re gotin; şehîd ketiye.

Dilê Masî pirtir pê şewitî. Wê gavê valayiyekê hundirê giyanê wî zeft kiribû. Li ser xwe, li ser jiyan û mirina xwe diramiya:
- Nexwe mesele wilo rehet e? Navek e û wê weke şehîd bê binavkirin û her tişt biqede?

Li biryargehê bi germayî pêşwazî kirin. Mîna miriyê vegeriyayî jiyanê. Xwarina herî xweş ku peyda dibû didanê. Di demeke kin de hevalekî bi navê Doktor hat cem. Doktor li deqên reş yên her du lingên wî nerî, biryareke bilez da:
- Divê lingên wî bên jêkirin.

Doktor bi xwîneke sar gwîzan li lingên wî yên werimî xist. Birînên wî hinekî çirandin, pembû danî ser û bi paçikî girê dan. Hê paçik baş girê nedayî vizeviz bi firokên şer ket, dîsa her tişt serûbino bû:
- Ji jor û ji jêr ve tên.
- Em çi bikin?
- Em mecbûr in we veşêrin û herin.

Şervanan bilez Masî û birîndareke bi navê Bêrîvan li ser pişta xwe kirin, birin dan ber tehtekê. Betanî avêtin ser wan û çûn. Di demeke kin de, ew û leşker li ber hev edilîn, qîr û qiyamet rabû. Bi saetan şer ajot. Piştî bêdengiyeke dirêj, çar heval hatin cihê Masî û Bêrîvanê guhrtin. Erd kolan, ser girtin, naylon kirin û her du birîndar li wir bi cih kirin çûn. Birînên Masî girantir bûbûn. Nikarîbû raze. Xwe bi xwe bê derman û bê doktor li birînên xwe dinerî. Hedana wî ji ber êşê nedihat. Teprepa leşkeran nêzîkî wan bûbû. Her duyan jî bombeyên xwe amade kiribûn. Biryar dabûn ku mirin ji ketina destên wan çêtir e. Her ku pêjna leşkeran dihat, destên wan diçûn ser bombeyan, li benda kêliyên dijwartir diman. Li çavên hev dinerîn. Tiştek ji hev re nedigotin, lê pirseke xwînî xwe berdida nava her du birîndarên bêçare:
- Em bombeyên xwe biteqînin, yan hê zû ye?

Naylona ku çîrok dinixumandin

Dibêjin; qedera her mirovî li ser eniya wî nivîsandî ye, lê kesek nikare bibîne. Eger ji bo mirovan wisa be, wê ji bo nayloneke weke min qeder çawa bê naskirin? Carekê min dît ku ez di nava wan çol û çiyayan de digerim. Ji ber destekî diçûm ber destekî din. Dibûm hevpara êş, kul, derd, serma û germa wan jî. Lê vê carê mesele hat guhertin û ez bûbûm qapaxa devê koncaleke xemgîn. Bûm çavdêra nalînên du birîndaran, çavdêra mêr û jineke ku berî bi jinîtî û mêraniya xwe bihesin, bi êşa xedar ya birînên xwe ve mijûl dibûn. Ne tenê birînên di ling, sîng, zik, serî û piştên wan de, her wisa birînên kûr yên di giyanên wan de. Wê lihevrasthatina

Masî û Bêrîvan anîn cem hev, serê Masî tevlihev kiribû. Eger berê, rojê çend caran bûya, niha rojê bîst û çar saetan Berfîna wî di bala wî de bû û pê re dijiya. Birînên Bêrîvanê ne weke yên wî giran bûn. Yên wî roj bi roj xerabtir dibûn. Dizanîbû her ku rojek diçe, hinekî din nexweşî bi ling û çîmên wî ve hildikşe, her ku rojek derbas bibe, wê perçeyekî mezintir ji lingê wî bê jêkirin. Carna xweziya xwe bi halê wan hevalên xwe tanî, ewên ku di yek kêlîkê de tên kuştin. Ya wî kuştineke hêdî hêdî û dijwar bû. Mirinê ji jêr ve dest bi xwarina laşê wî kiribû. Li ber çavên wî, laşê wî piçik piçik dixwar û nikarîbû bisekinîne. Ji aliyekî ve berfa Xwedê û şerê leşkeran ji aliyê din ve qedera wî, bi wî awayê xemgîn, tevnê jiyana wî diristin. Lê mana Bêrîvanê li cem, moraleke baş didayê. Tev ku hevalên wan soz dabûn ku di hundirê çend saetan de bi wan ve bên, lê çend roj derbas bûbûn û hê jî pêjna wan nedihat. Her ku êşa birînê derfet dida Bêrîvanê, bi pê re dipeyivî.

Ji ber ku dema wan dirêj, hêdî hêdî û giran derbas dibû, Bêrîvanê buxçika bîranîn û êşên xwe li ber xwe datanî û ji Masî re çîroka xwe ya xiyanetê û qehremaniya çogşkestî, ta bi ta, dirêsa. Di binê wê koncala sergirtî de Masî bûbû Şehreyarekî birîndar, Bêrîvan jî bûbû Şehrezada ku bi vebêjiyê ne tenê temenê xwe, yê Şehreyarê lingwerimî jî dirêj dikir.
Min û Masî bi hev re me guhdarî dikir. Çawa ku mirîdek gunehên xwe yên ji roja çêbûyî ve heta wê rojê, li ber şêxê xwe daweşîne, Bêrîvanê jî wisa bi kelecan serpêhatiyên xwe yên wan salan li ber Masî dadiweşandin. Li xwe mikur hat ku berê ji çiyê ditirsiya.

Bêrîvanê digot û diherikî

Hevalê Masî, şaş nemîne. Hestin seyr bûn; ez ji çiyê pir ditirsiyam. Niha jî gava em dikevin tengasiyê, weke çêlîkên çûkan dema bê dê bimînin, çawa xwe diavêjin binê hêlîna xwe, em jî xwe wisa davêjin bextê çiyê. Destpêkê pir zehmet bû, em ji Dêrika Binxetê ber bi sînor ve hatin. Ji bo ku şop nemîne, carna me pê li dewsa lingên hev dikir, carna jê me tejikeke dirêj radixist, em li ser dimeşiyan. Me bi du kelekan li avê xist em derbasî aliyê Dihokê bûn. Ji wir me xwest em herin wargeha Zapê. Êrîşên hewayî nedihiştin em rehet bimeşin. Em li derdora çil şervanên nû bûn, cara yekê bû ku me firokeyên şer di ser serê xwe re didîtin. Gava qîrqîra ‘firoke hatin, firoke hatin’ bilind bû, hinekan ji lez û bezê heta bi çenteyên xwe li pey xwe hiştin. Sê, çar qazan û roket di jor de hatin. Şervanên kevin çenteyên me dan hev û berê me dan şikeftan. Ez ji wê lez û beza ketina nava şer veciniqîm. Zozanê, -hevala min ya kevin- li ber dilê min dida:
- Emê fêrî van tiştan bibin, netirse.

Wê şevê, mîna koran me da pey hev em meşiyan. Lingên min hemû bûn peqik. Bi meşa ber bi jor ve û tîbûnê pencên xwe di qirika min de diçikandin. Bi daketina ber bi jêr ve gotin:
- Em gihiştin Zapê. Yên nû bibin şkeftan.

Li şkefta ku ez tê de bi cih bûbûm, tiştekî ez xemgîn kirim, tiştekî din jî ez kêfxweş kirim. Cihê xemgîniyê bû ku keçeke şervan aqilê xwe wenda kiribû. Li kêleka wê du hevalên wê yên nêzîk hatibûn kuştin. Dema em gihiştin cihê xwe, yên li wir hatin silav li me kirin. Tenê ew keç rûniştî ma û dipeyivî. Behsa xwînê dikir, bi hinekan re dipeyivî:
- Razane yan şiyar in? Here ji wan re bêje rojbaş.

Li ber ronahiya fanosa li ber devê şkeftê pêketî xeyalên nedîtî di ber çavên wê re diçûn dihatin. Ti kes tênedigihişt ka çi dibêje, yan bi kê re diaxive. Ji aliyê din ve, ez bi dîtina dotmama xwe Binefşê pir kêfxweş bûbûm, bask bi dilê min ve şîn hatibûn. Ew jî li wir bû. Binefş hevala min ya zaroktiyê, ya jîr û jêhatî bû. Di wê navê re dengê firokeyên şer yê bênavber li erd û ezman firtone rakiribûn. Me şûtik û êlekên xwe danîn ser naylonê, ji xwe re kirin doşek û lihêfên me jî kefiyên me bûn. Binefşê cihê min ji yên hevalên min yên din xweştir kiribû. Lingên me yên bi peqik bi hena ji darên **Belotan** hatin dermankirin. Gelek ji me di xew re neçûn. Yên razan jî di çarê sibehê de ji xewê rabûn. Taştiya me nîsk bû. Jimareke mezin ji şervanan li wir bû. Piştî meşa du saetan em gihiştin Ava Zapê. Di ser avê

re, em dido dido bi sindoqê -ji du aliyên ve bi du benên stûr hatibû girêdan- derbasî aliyê din bûn. Em wê şevê li ber avê man. Roja din, berî vexwarina çaya sibehê, firokeyên şer li cihê me dan. Carekê min xwe dît ku ez li şkeftê me. Qazan avêtibûn avê jî. Sindoq belawela bûbû. Her du ben qetiyabûn. Barûda qazanan masî kuştibûn, bi ser avê xistibûn. Me şûtikên xwe vekirin, bi wan masî girtin. Wê rojê me têr masî xwarin.

Em bi dilekî şkestî ketin rê. Qazanên ji ezmanan hatibûn xwarê, ne tenê masiyên di nava avê de, masiyekî ciwan ji nava me jî biribû. Delîlê bîst salî ku hê nû gihîştibû wir, berî ku guleyê biteqîne, bê xatirxwestin, bûbû mêvanê axa sar. Min Binefşa xwînşêrîn, dotmama xwe ya devliken li pey xwe hişt û bi du çavên bihêsir em gihiştin quntara Kurêjaro. Çiyayekî bilind û bêav û bêdar bû. Me navê wî kiribû Kurê Jehro. Serê sibehan perwerdeya li ser çekan dest pê dikir, êvaran jî bi pêkanîn û piratîkê perwerde bi dawî dibû. Zanîna bikaranîna çekan bi serê xwe hunerek bû. Hezkirineke ku berî her tiştî baweriya bi doza ku mirov ji bo wê şer dike, tê pêş. Serê sibehan, ji serê Kurêjaro, dema mirov li derdoran dinêrî, hesteke wisa bi mirov re çêdibû çawa ku cîhan hemû ya mirov bi xwe be. Em ên ku nû hatibûn, di rojên xwe yên pêşî de, me defter û pênûsên xwe derdixistin û me ji xwe re dinîvisand. Rêveberê me devliken li me dinerî:

- Ez hêvî dikim ku hûn tim wisa bin.

Rêveber dizanîbû ku bi demê re wê ev dîmen dubare bibin û sal bi sal bê bandor bibin. Ji ber wê dibeşişî û rojên xwe yên destpêkê dianîn bîra xwe.

Wan dîmenên bedew û spehî ligel hevdîtina bi Zozanê re herdem ez vedigerandim salên zaroktiyê. Min ji dil dixwest ku Binefş jî tevlî koma me bibe, lê wisa nebû. Hêstireke me hebû. Taybetiya wê ew bû ku ji şervanên jin neditirsiya û nedimeşiya. Min û Zozanê me dixwest em herin avê bînin, lê me kir nekir hêstira me nemeşiya. Pîrikeke min hebû, xwe bi heft mêran nedida. Zozanê got; wê niha bibe pîrika min. Darek xiste destê xwe û bi ser hêstirê de çû. Piştî hingê, çawa ku li pêşiya mêran dimeşiya, wisa li pêşiya jinan jî dimeşiya. Dengê zengilê şer li ber guhê me bû. Li seranserê sînor leşker bi cih bûbûn. Dilê min hebû ez jî tevlî şer bibim, lê ji ber nûbûna min destûr nehat dayîn. Zozanê saeta xwe û deftera xwe ya bîranînan da min:

Dilê min ji min re dibêje; ev cara dawî ye ku emê hevdu bibînin.

Gava dît ku xatirxwestina wê min ditirsîne, bala wê çû ser ramana ku wê gavê di serê min de dizîvirî:

Ez rica dikim ji kesî re nebêje.

Di bizavên leşkerî de rêveberên şervanan kesên wisa şkestî û bêhêvî bi xwe re nedibirin. Ji ber wê, dema pirsa moralê wê jê kirin, wiha bersiv dabû:

- Pir baş e, tenê min henekek li Bêrîvanê kir.

Zozana devliken û serbilind ket nav çalakiyê. Em jî li benda encamê bûn. Nûçe bi şifre dihatin gotin: Sembola şehîdketinê yek, ya birîndarbûnê sisê bû. Hê ew hevoka giran ya ku min ji bêtêlê, ji devê rêveber bihîstî, ji bîra min neçûye:

Çalakî bi serket, lê Zozan yek.

Piştî ku vegeriyan ji ji me re gotin:

- Ji qereqolê leşkerekî birîndar bi çeka xwe ve filitîbû. Xwe veşartibû, derba wî ji pişt ve li Zozanê ketibû.

Her tişt qediyabû, nefes, jiyan, ronahî, giyan, teperepa dil û hezkirin hemû ji Zozanê hatibûn sitendin. Lê wê derba kuştinê nikarîbû kenê ji ser rûyê wê rake. Zozana devliken, bi perçeyekî giyanê min li wir hat veşartin. Ji bo ku xwîna Zozanê li erdê nemîne, diviya wê rojê pira Balenda bê roxandin û qereqola li kêleka wê ji holê bê rakirin. Berî ku dest bi çalakiyê bê kirin, koma me ya dermankirinê ya bêçek riya xwe şaş kir, ket kemînê. Di serî de serkêşê komê -navê wî Dêrsim bû- dan ber gulleyan. Pey re, pey re hêstirek jî hat kuştin. Yên din xwe xelas kirin. Ji ber ku ti kesî deng ji xwe neanî, leşker bawer kir ku Dêrsim ji hevalên xwe qetiyaye, bi tenê ketiye kemînê. Ji dûr ve bang dikirin:

- Hûn çima nayên heyfa xwe hilnaynin?

Dizanîbûn em li wan deveran in, lê nikarîbûn cihên me bizanin. Bi hatina êvarê re erebeyên wan nêzîk bûn. Bi derbên ARBC re agir bi pênc erebeyên leşkerî ket. Bi şewitandina ya şeşan re min şaşitiya xwe naskir. Xwîn ji guhê min dihat. Min ji bîr kiribû bi teqandinê re devê xwe vekim. Perdeya guhê min teqiyabû. Gava şer ber bi qedandinê ve çû, min pala xwe da kevirekî mezin, bêhna barûdê ez gêj kiribûm. Hevalên min bi min ve hatin. Guhê min derman kirin, pişt re me berê xwe da armanca xwe. Me pir teqand û em ber bi Avaşîn ve çûn. Bi bombeyan me masî girtin. Bi vegerê re, Mezlûmê deh salî ku ew demek bû di nava me de, pê li mayîneke ku leşkeran li pey xwe hiştibû, kir. Me li wir veşart û riya xwe berdewam kir. Piştî hefteyekê ji me çar şervanan hat xwestin ku em ber bi Girê Şîrîn ve herin, leşkerên li wir bi cih bûbûn bitirsînin û vegerin. Ne av, ne xwarin û ne tûtin tiştek bi me re nemabû. Xwarina me kumikên çolan û şoqil bûn. Di rê de hevalekî pê li marekî stûr kir. Kufkuf bi mar ket, xwe hilda û li erdê ket. Em tev bi paş ve vegeriyan. Ji ber giranbûna xwe, mar hêdî hêdî dimeşiya. Me kir nekir dûr nediket. Me biryar da ku em bi qernasê bikujin. Me her çaran nikarîbû rahêjinê. Em didoyê şevê gihiştin cih. Yekî nobet girt, em yên din, razan. Ji nişka ve dengê teperepê hat. Em hemû şiyar bûn, bi dûrbînê min li aliyê deng jê hatî nêrî. Hirçeke mezin ji wir ve, ji nava daristanê dihat. Heta ji me hat me xwe jê dûr girt. Saet ber bi pêncê sibehê ve diçû. Leşkeran agir pê xistibû, li dorê civiyabûn. Ji ber ku guman nedikirin ku wê şeveqê kesek bi ser wan de bê, bi derba yekem re veciniqîn û negihan li ber xwe jî bidin. Em bê cigare û birçî, lê kêfxweş vegeriyan. Li pey me dest bi topbarana çiyê kirin. Me dizanîbû wê bi dijwarî bi ser me de bên û hatin jî. Wê gavê em bê av mabûn. Kurmik diketin berfa kevin. Me xwe bi şûtik berdida koncalên kûr. Me qalibên berfê derdixistin, dihelandin. Piştre li şûtikê dikir. Kumik li jorê diman, avê xwe berdida jêrê. Em komek ji şervanên jin ketin kemînê. Bi sedan gule bi ser me de dibariyan. Li nêzîkî serê me, li çar aliyên me diketin. Guleyek di albûma di bêrîka min re derbas bû, di aliyê din re derket. Min nema dizanîbû ka ez birîndar bûme, yan na. Li aliyê din lingê hevaleke me şikestibû, lavlav dikirin:

- Ez tika dikim, min tenê nehêlin.

Em ketin bin çengên wê me bir devereke asê. Digotin Şkefta Birîndaran jî ketiye destê leşkeran. Li hêla din jî hevaleke me birîndar bûbû, hemû pê ve diçûn. Êrîşa leşkeran dijwar bû. Em pê re negihan xelas bikin. Di nava lez û bezê de me li ser darbestê hişt, me xwe xelas kir.

Me bi dûrbînê li wan dinêrî. Leşkeran hevala me ya birîndar tevlî darbestê xistin helîkopterê Me xwe gihand nava daran, careke din me bi dûrbînê li derdorên xwe nêrî. Çar ji me ku fûzeçî bûn, li wir mabûn. Helîkopter hat. Agirekî sor ber bi jor ve bilind bû û xwe li helîkopterê girt. Mîna teyrekî qerase ku derba nêçîrvanekî zîrek lê ketibe, helîkopter di jor de hat xwarê. Qîreqîr bi leşkeran ket. Yekê ji me xwest bilîlîne, lê min nehişt. Em di newaleke kûr re, ji leşkeran ne dûr, derbas dibûn. Newal di navbera Kurêjehro û Şikefta Birîndaran de bû. Kopra di ser me re di çûn dihatin. Leşkeran agir dadabû. Xwe germ dikirin û hîrehîra wan bû. Em ji serma di cihên xwe de dilerizîn. Du rojan me bi wî halî qedand. Roja sisiyan leşker ji wir kişiyan. Ji bo çayê me agir kiribû, ji bo ku dûman dernekeve me pif dikirê. Ji nişka ve çar hevalên me yên din di ber me re derketin. Gava me hev dît, em bi hev re qîriyan. Me hev hembêz kir, ji kêfan em giriyan. Li ser Şkefta Birîndaran leşkeran çekên lazer bi kar anîbûn. Zêdeyî bîstan jî bi çekên hawanê kuştibûn. Me parçeyên dest, ling û laşên wan bi destan dan hev, pişt re me veşartin. Mîna dînan li me hatibû wê rojê. Me nema zanîbû em bi ku ve herin. Birîndara me vê carê doktora me bû. Em ketin bin darbesta doktor Zelal. Vê carê wê av dixwest. Derb li lingê wê ketibû. Wê bi xwe lingê xwe girê da û bi du çavên li ber vemirandinê her û her av dixwest:

- Tenê peşkek av. Ez nû derdê birîndaran fêm dikim.

Me mendîl şil dikir, li devê wê dixist. Me ew û birîndareke din li şkeftekê hiştin, em çûn Kurêjehro. Ji bo dîtina birîndaran leşkeran kûçikên bêhna xwînê dişopînin bi xwe re

digerandin. Dema kûçik ew biribûn Şkefta Birîndaran, Zelala birîndar bombe bi xwe û bi wan de teqandibû. Di wê operasyona berfireh de bi sedan ji wan û ji me hatin kuştin. Piştî demekê, di riya teyrên reş re, me cenazeyên xwe dîtin, veşartin. Ev hemû li aliyekî, kula Binefşê li aliyê din. Min dikir nedikir ji bîra min nediçû. Ji nişka ve min bihîst ku Binefşê ketiye lêpirsînê û ji bo têkiliya pê re ez jî di bin çavan de me. Yê berpirsiyar bawer dikir ku ajan e. Di civînê de Binefşê rêveberê xwe rexne kiribû û bi axatiyê tawanbar kiribû. Roja din endamên parastnê yên rêveberê wê çeka wê jê sitandibûn û weke sîxurekê bi nav kiribûn. Di wê demê de min xwest bibînim da meselê fêm bikim. Her çenda zehmet bû, lê dîsa ez birim cem. Nehiştin em bi tenê bimînin. Du kes li cem me man. Binefşê got; rêveber min bi sîxuriyê tawanbar dike. Tev ku sergirtî daxivî, lê dîsa jî ez têgihîştim ku du hevalên wê yên jin -ji herêma rêveber bûn- ji bo li sîxuriya xwe qebûl bike, işkence pê kirine, naylon li ser laşê wê helandine. Ez ji wan kirinan şaş mabûm. Nehiştin em dirêj bi hev re baxivin. Min bi dilekî şikestî xatir jê xwest, lê hişê min mabû li cem. Piştî hingê carekê min di xew de dît. Cilên spî lê bûn û mehîna wê ya spî di nava heriyê de teqinîbû. Destê xwe dirêjî min dikir û dikir hewar:

- Bêrîvaaan, were min xelas bike.

Me dikir nedikir destê me nedigiha hev. Ez ji xewê veciniqîm, min ji xwe re got gelo, tiştek bi Binefşê nekirine?

Wê rojê komeke nû hatibû aliyê me. Min nizanîbû di nava xwe de li hev kirine ku tiştekî ji min re nebêjin, lê xewna min nehişt ez rehet bisekinim. Bi şev du heval çûn bin darekê, min xwe li nêzîkî wan veşart, li wan guhdarî kir. Ji hev re digotin; Binefş îdam kirine. Ez di cihê xwe de cemidîm, nema deng ji min hat. Gava dîtin ez ne li nav wan im, dest pê kirin li min geriyan, bang li min dikirin. Min bersiv neda. Min tenê karîbû yek tiştî bikim, ew jî girî bû. Zimanê min nema digeriya. Ne tenê qidûmên min, dilê min, ruhê min, hestên min, hemû bi hev re şkestibûn.

Wê şevê min xwe pêş wan nekir. Roja din min rext û çeka xwe avêtin ber lingên hevalên xwe û ez bêdeng mam. Sê mehan deng ji min derneket û min çeka xwe hilnegirt. Di meha çaran de li ber Zapê ez li ya ku Binefşê bi destê xwe kuştibû rast hatim. Heta Xwedê hêz da min min şiqamek lê xist û min serê wê xist nav ava Zapê. Çar hevalan bi zorê ji nava lepê min derxist. Şensê wê hebû, ez wê gavê bêçek bûm. Piştî wê şiqamê zimanê min vebû.

Deh roj di ser wê şiqamê re neçûn, min bihîst ku ji nava me reviyaye, li Dihokê bi cih bûye û li wir zewiciye. Li pey wê, navê rêveberê ku biryara kuştina Binefşê dabû li her derê bi xayîntî belav bû. Çûbû xwe radestî leşkeran kiribû, ji me re hat gotin ku ji berê ve bi leşkeran re di nava têkiliyên veşartî de bûye û niha jî çûye cem hevalên xwe yên kevin. Lê çi fêde! Heta ku rastî derket holê êdî Binefş bûbû bîranînek, bûbû birîneke piştê ku heta hetayê wê rehet nebe. Ti carî xiyanetê kêfa min neaniye, lê vê carê xiyaneta vî mirovî bûbû nîşana dilsozî û zelaliya her du çavên Binefşê. Çîroka min li vir naqede. Jixwe her şervanek ji me dizane ka wê çawa dest bi çîroka xwe bike, lê nizane ka wê çawa biqedîne. Ez jî nizanim, lê ezê li vir rawestim. Ez westiyam, niha axavtin bese. Ez dixwazim hinekî li dengê dilê xwe guhdarî bikim. Guhê xwe deynim ser sînga wan rojên ku wê bên, ka wê çi ji me re bi xwe re bînin. Ezê niha razim Masî, xewa min tê. Baş e ku li dinyayê xew heye, nexwe wê mirov dîn bibûna. Li vê çolê, li nava van çiya û şkeftan ti pîrik li cem me nînin ku çîrokan ji me re bêjin, me di xew re bibin. Ji ber wê divê em hem çîrokan ji hev re bêjin, hem jî razin. Ax, çiqas xew xweş e, rojbaş, êvarbaş, şevbaş, hemû demên te baş bin Masî, ez radizim.

Gava Bêrîvan di xew re çû, Masî nû ji nava xewn û xeyalên Bêrîvanê pê re çêkiribûn rabû. Li rastiya rewşa xwe hay bû, ku êdî her du birîndarin û ber bi mirinê ve diçin. Diviya berî gavekê ji vî aliyê mirinê yê sar xwe bigihînin aliyê jiyanê. Wê karibûna gelo? Vê pirsê xew ji ser çavên Masî revandibû. Berî ku Bêrîvan şiyar bibe, du hevalên wan hatin. Birîndarekî din bi navê Firat bi xwe re anîbûn. Bêrîvan şiyar kirin, bi xwe re birin. Gotin; ji bo dermankirinê

wê heval bilez derxin derveyî sînoran û cara bê wê dora Masî be. Hatin û çûn. Li şûna Bêrîvanê, Firat rûniştibû bi ser birînên xwe û çîrokên xwe de dinaliya. Ew jî bi hêvî bû ku hêdî hêdî, wan ber bi dermankirinê ve bibin û bê alîkariya kesekî karibin mîna berê tevbigerin. Masî wê kêlîkê diramiya bê çiqasî birîn, xewn û xeyalên mirovan biçûk dikin. Xeyala wî ya herî mezin ew bû ku karibe bimeşe. Wisa bê êş rabe ser xwe û li ser her du lingên xwe bisekine. Li derveyî wê şkeftê, dûrî wan çiyayan, dûrî wan birînan herkes dimeşiya, bê ku zanibe ka çiqas xweşe ku mirov tenê bêêş karibe bimeşe.

Nivişt dipeyive

Hindik mabû ji bîr bikim ku ez nivişt im û li ser dilê Masî û di bin cilên wî de me. Hindik mabû Masî ji bîr bike ku li derveyî şkeftê jiyaneke din heye. Ji ber wê gava hevalên wî du hêstir li ber derî girê dan û ji wan xwestin siwar bibin, Masî ji çavên xwe bawer nekir. Wî û Firat xatir ji hev xwestin û ketin rê. Pênc rojan di deştê de meşiyan. Masî hevalê bi xwe re baş nas nedikir, tenê dizanîbû ku navê wî Farqîn e û ji Farqînê ye û dizanîbû ka wê bi ku ve biçin. Li gora ku têgihiştibû berê wan li Licê bû. Gihiştibûn derdora Hezroyê, nêzîkî Amedê bûn. Farqîn Masî di qulikekê de hişt, çû jê re li riyekê bigere. Ji bo dermankirinê, ji Masî re geh digot; ezê te bi sehrîca mazotê bişînim Başûr, geh digot; ezê te bişînim Stenbolê. Havîn bi dawî dibû, germê qulika ku Masî tê de dima sincirandibû. Tenê ew û bombe di qulikê de bûn. Gava Farqîn pişta xwe dayê, Masî bi bîr xist ku ji her tiştî pirtir wê hewcedariya wî bi avê hebe:

- Tu min bêav nehêlî, ha.

Farqîn di bin simbêlan de keniya:

- Em li ser jiyana te dihizirin, tu jî li ser avê.

Farqîn çû, sê rojan nema pêjna wî hat. Tîbûnê qurmê zimanê Masî ziwa kiribû. Dilê wî dihat ku di devê wî re derkeve. Roja çaran biryar da ku mirin ji tîbûnê hesantir e û xwe ber bi derveyî qulikê ve kişand. Ji nişka ve reşahiya tiştekî xuya kir. Masî destê xwe jê re hilda. Reşahiya mirovekî bû, bi lez û bez pê ve hat, derbasî hundirê qulikê kir. Xwe pê da naskirin, navê wî Cemîl bû, Farqîn ew şandibû. Jê re av, nan û penêr anîbû. Masî jê bihîst ku tabûtek jê re tê çêkirin; wê bixin tabûtê û bişînin Stenbolê. Heta Farqîn jê re mizgîniya xêrê anî du hefte derbas bûn:

- Sibe tu diçî Stenbolê.

Pilan weha bû: Wê pîkabek tijî sindoqên bacanên reş biçûya Edenê, di nava wan de sindoqeke dirêj mîna tabûtekê jê re vala hiştibûn. Wê ajovan pîkaba xwe pênc deqîyeyan li ser rê bisekinanda, lempeyên wê pê bixistana û vemirandana, weke ku pîkab xerab bûbe. Di wan pênc deqîqeyan de diviyabû Masî xwe di sindoqa xwe de dirêj bike, di nava sindoqên din de bê veşartin û pîkab riya xwe ya Edenê bigire. Ji ber ku nobeta leşkeran rojane li ser rê hebû, diviyabû ev kar hemû zû û bi lez û bez biqedin. Roja din piştî ku reş ket erdê Masî kîsên naylon li lingên xwe gerandin û ma li benda hatina pîkabê. Gava pîkab sekinî, lempeyên wê pê ketin û vemirîn, mîna tiyekî ku çav li aveke zelel bikeve, Masî li ser çogan xwe ber bi pîkabê ve kişand. Di wê navaberê de lempeyên panzerê ji wir ve xuya kirin. Tev de çend deqîqe ne, çend kêlîk in ku di navbera mirin û jiyanê de diçin û tên. Eger hat û lempeyên panzerê ew dan ber ronahiya xwe wê her tişt biqede û dinya bi serê Masî de xerab bibe. Eger xwe gihand tabûta xwe, wê berê xwe bide jiyanê. Gava ajovanê pîkabê dît ku panzer ji wir ve

tê, mîna ku bahoz lê rabe, ber bi Masî ve baz da; mîna kevirekî giran hilgirt, avêt nava sindoqan. Masî di tabûtê de hat dirêjkirin. Di wê kêlîkekê de bi sindoqan hat nixumandin. Wê kêlîka panzer gihişt cem wan, ajovan pê li pedalê gazê kir û pîkab ket rê. Mîna gurekî birçî, pîkabê û dilê Masî jî pê re, riya Edenê dixwarin û ber bi qedereke nenas ve diçûn.

Birîn lingên xwediyên xwe dixwin

Di binê tabûtê de Masî dihisiya ku ew û mirin bi hev re dijîn. Mirinê devê xwe vekiribû û bi diranin nedîtî lingên wî dikeritandin, hêdî hêdî dixwarin û ber bi jor ve diçûn. Her ku polîsan erebe disekinand, hestên biyanî bi Masî re çêdibûn. Di jiyana wî de ew cara yekê bû ku bê pevçûn, girtin yan jî kuştin çêbibe ewqasî nêzîkî polîsan dibe. Şensê wî baş bû ku haya polîsan jê çênedibû, nizanîbûn ku di binê wan sindoqên bacanan de dilekî germ bitirs û bi hezkirina jiyanê lê dide. Saet çarê sibehê bû gava pîkab li benzînxanê rawestiya. Cemîl ber bi sindoqan ve çû:

- Heval, tu şiyarî? Tu çawa yî? Dakeve, emê pariyek nan bixwin.

Pîkab li kêleka benzînxaneyekê rawestandibûn. Mîna hirçekî westiyayî Masî serê xwe di tabûta xwe de hilda. Ji bo meşê du dar jê re anîbûn. Odeyeke biçûçik jê re amade kiribûn. Masî ji rengê mirovan derketibû. Por û nenûkên wî dirêj bûbûn. Sipî ketibûn laş û cilên wî. Cemîl bir hemameke biçûk. Cilên wî jê kirin, riha wî kur kir, serê wî şûşt. Cilên nû lê kirin, li pişta xwe kir, bir oda biçûk. Cemîl sê moz bi xwe re anîbûn. Masî bi qerf got:

- Ez nikarim mozan bixwim.
- Tu nexwî, ezê bixeyidim.

Cemîl tênegihiştibû ku Masî qerfê xwe dike, gotina xwe got û çû xwarinê bîne. Masî moz xwarin, qaşil di bin cihê xwe de veşartin. Piştî kurtedemekê Cemîl vegeriya. Nû ket derî, li mozan pirsî:

- Te moz xwarin?
- Erê.
- Ka qaşil?
- Min ew jî xwarin.
- Heval qaşil nayên xwarin.
- Na lo, wileh xweş bûn.

Cemîl xwarin anî; çend zeytûn, rêçal û hêkeke kelandî bû. Masî di cih de xwarin li hev hilanî. Birçîbûna salan bi ser hev de kom bûbû û di wê deqîqeyê de teqiyabû. Masî têr nedixwar. Dixwest bersiva matmayîbûna Cemîl bide:

-Ditirsim xwarina vî welatî hemû têra min neke.

Gava dît ku mesele wisa ye, yekser xwe ji bo anîna xwarineke din amade kir. Cihê Masî xweşkir û ji min xwest ez rehet rûnim heta vegere. Yekî pêncî salî ket hundir, Masî himbêz kir, bi germayî ew ramûsand û xwe pê da naskirin. Xwediyê benzînxanê bû. Germayiya wî dilê Masî xweş kir. Ji bo ku dilê Masî xweş bike her tişt dikir. Cemîl qaşilên mozan bi xwe re birin, çû xwarineke din bîne. Masî ew jî xwar. Wê şevê xeweke wisa rehet kir ku bi salan bû xeweke wisa nekiribû. Berêvarê re bi alîkariya du daran û du lingên dawerivî, birîndar û hilweşiyayî bi otobûsê ber bi Stenbolê ve bi rê ketin. Roja din, piştî nîvro gihiştin mala birayê Cemîl. Ji cîranên xwe re gotin; nexweş e ji bo tedawiyê me aniye vir. Li wir min naskir ku Cemîl Mêrdînî ye. Ji ber işkenceya lê hatî kirin birayê wî nema karîbû karê giran bike. Li qehwexaneyekê dixebitî, debara xwe dikir. Jina wî diçû paqijî dikir, lawikekî wî yê pênc salî av difirot û du keçikên wî jî dirûn dikirin. Tev wilo jî maleke vekirî bû, Masî ji ber çûn û hatina cîranan û pirsên wan nema dikir der. Masî ditirsiya ku rojekê wisa bi rehetî û bi saloxdana muxbirekî biçûk bikeve destê polîsan. Doza guhertina cihê xwe kir. Cemîl daxwaziya wî di cih de pêk anî, bir maleke Batmanî. Li malê jin û mêr tenê bûn. Mêr diçû kar. Birayekî wî li çiyê bû û yek jî girtî bû. Jina wî bi Masî da fêmkirin ku êdî navê wî Yaşar e.

Yaşar navê tiyê wê yê li çiyê bû. Birayê jinikê, mîna serseriyekî tevdigeriya. Çawa ku haya wî ji bayê felekê tine be diaxivî. Heta jê dihat dixebitî ku mijarê ji siyasetê derîne. Hatina wî ya malê nerehetiyeke mezin bi Masî re çêkiribû. Lê piştî ku her du man tenê ji nû ve navê xwe ji Masî re got û xwe pê da naskirin. Navê wî Lezgîn bû. Diyar bûbû ji bo ku ti kes ti gumanan jê nebe rola serseriyan dilîze. Piştî hingê Cemîl vegeriyaye Amedê. Ji Masî re gotibû; wê Lezgîn êdî bi te re eleqedar bibe. Di demeke kin de doktorek hat malê; bi baldarî li her derên wî nêrî:

- Divê bilez bê tedawîkirin.

Heta salekê Masî av dikeland, şor dikir, piştî ku sar dibû dikir şûşeyekî. Bi wê avê lingên xwe yên birîndar dişûştin pişt re bi pembû paqij dikirin. Çawa ku lingên wî di nava ava xwêkirî de bên kelandin. Roja din, Lezgîn bi navê Yaşar bir nexweşxanê. Doktor biryar da ku iltîhab bê rawestandin pişt re emeliyet bê kirin. Lê ji bo emeliyatê jî pere pêwîst bûn. Jinbira Yaşarê li çiyê zêrên xwe firotin, dan mesrefa emeliyetê. Berî emeliyetê berdestikê doktor dilê wî xweş dikir:

- Netirse, ku tu nikaribî baxivî, destê min biguvêşe.

Masî bi hestiyarî û xemgînî li derzî, serom û çûnûhatina doktor û berdestkên wî dinerî. Dizanîbû ku çavên xwe veke, êdî bi temamî wê xwe bêling bibîne. Piştî emeliyatê Lezgîn Masî ji nexweşxanê derxist, bir maleke din. Li mala nû, roja din ji nişka ve heft zilamên taximgirêdayî derbasî cem Masî bûn:

- Tu çawa yî hevalê Yaşar?
- Ez baş im, spas.

Piştî çûna wan, Masî bang li xwediyê malê kir:

- Ev kî bûn?
- Welatparêz bûn.

Serê Masî tevlihev bûbû. Çawa ku hin di guhê wî de bêjin; hindik maye tu bêyî girtin. Dixwest berî gavekê ji wir derkeve:

- Ka berpirsiyarê min?
- Çima?
- Bila min niha bibe maleke din.

Xwediyê malê neçar ma ku daxwaziya wî pêk bîne. Li mala nû jineke navser xwe pê da naskirin:

- Ez Sakîne me, berpirsiyara te ya nû.

Li odeya din, dengê xwediya mala nû û ya mala kevin dihat guhê wî:

- Hûn çima wisa dikin? Bê ku hûn xeberê bidin me, ji nişka ve hûn tînin vir, ma dibe?. Mêrê min di hebsê de ye ne bes e, hûn dixwazin min û zarokan jî bidin girtin.

Masî nû zanî ku hem mêrê berpirsiyara wî Sakîne girtî ye û hem jî mêrê xwediya malê. Du zarokên wan hebûn, keçeke hivdeh û kurekî pazdeh salî. Sakîne û xwediyê malê yê berê derketin. Ji xwediya malê naskir ku Sakîne çûye girtîgehê da mesela wî çareser bikin. Masî ketibû xem û xeyalan. Li ser vegera malê, li ser Berfînê, li ser Bozo, li ser marê di malê de û li ser pîra cîrana xwe dihizirî. Reş ket erdê lê Sakîne hê venegeriyabû. Xwediya malê û her du zarokên xwe li benda hatina Sakîneyê bûn, gava ku zengilê malê lê ket. Ew li qata çaran bûn. Berî derî ku veke jinikê di camê re nerî, veciniqî:

- Polîs hatin.

Bi gotina wê re, her du zarok, Masî û jinik jî şaş û metel man:

- Hevalê Yaşar, em çi bikin?
- Hûn derkevin, ezê bimînim. Eger bên derî bişkînin, bila min tenê bibînin.

Keçika hivdeh salî bihêrs bersiva wî da:

- Ez jî dernakevim. Tiştê ku bê serê te, bila bê serê min jî. Ez ji vir naleqim.

Kurik û diya xwe bi lez û bez derketin. Yekser xwe li mala tiyê xwe girtibû. Tiyê wê haziriya wan a şandina Batmanê kir, pişt re bi erebeya xwe berê xwe da nava kulmoza polîsên

derdora mala wî dorpêç kirîn. Du saet derbas bûn, ne polîs ji wir çûn, ne jî kesek bi ser Masî de hat. Ji nişka ve teqereq ji derî hat. Apê keçikê bi miftê derî vekir, derbas bû:
- Heval netirse, ez im.

Mêrik ji Masî re got; hêdî hêdî polîs diçin, ne ji bo te hatibûn. Dizekî erebeyan di qata yekê de ye, ji bo girtina wî hatibûn. Lê tev wê jî ezê te ji vir bibim.

Wê rojê mêrik Masiyê bêling li pişta xwe kir, bir cihekî dûr. Maleke bi ewle bû. Xwediyê malê karmendekî şaredariyê û dûrî şubheyan bû. Ji bo ku Masî ji sînor derbas bike, diviyabû ku qaçaxçiyekî peyda bikin. Qaçaxçî ji wan re gotibû; divê hûn du lingên lastîk peyda bikin. Masî neçar bû li bendê bimîne. Zirara mezin ya vê xirecira li pey xwe hiştibûn gihiştibû berpirsiyara wî Sakîne ku navê sîxuriyê mîna pîneyekî pê ve hatibû zeliqandin. Wê şevê dema vegeriyayî li polîsan rast hatibû, Sakîne li derî xistibû, xwestibû xeberê bide wan ku polîs ne ji bo wî hatine wir. Bi lêdana zengilê derî re hemû bi hatina polîsan hisiyabûn. Di wê dema xwediya malê bi kurê xwe re derketî li xwe mikur hatibû ku ji ber polîsan reviyaye û polîsan girtiye ser malê da ku Masî bibin. Gumana herkesî çûbû ser Sakîne. Piştî belavbûna vê nûçeya şaş, êdî Sakîne nema karîbû rê li ber vî agirê belavbûyî bigire.

Rojekê Masî li ser xirecira kebaniya malê û mêrê wê -wê rojê neçûbû kar- ji xewê rabû. Jinikê bi rûyekî zerî behidî xeber dabû Masî:
-Şevê din diz ketine hundir; sindoq vekirine, zêrên heyî hemû birine.

Hindik mabû Masî bawer neke, ji ber ku wê demê bi dengekî biçûk, bi teperepa lingê pisîkekê şiyar bûbû. Pişt re naskir ku dizan paçikekî dermankirî avêtiye ber derî. Bi bêhna ku mirovan di xew re dibe ketibûn malê. Ji ber Masî nikarîbûn gilî bikin. Vê bûyerê dawî li mana Masî ya li wê malê jî anî. Ji malekê diçû ya din heta ku birin cem wênekêşekî; ji bo pasaporteke qelp çend wêne girtin. Pişt re jî mizgîniya çêkirina du lingan jê re hat. Vê carê doktorê lingên pilastîkî jê re çêkiribûn ketibû şubhê. Tev ku xwe weke şivanekî mayîn di bin lingên wî de teqiyayî dabû naskirin, lê dîsa jî berî ku ji cem doktor derkeve pirsekê ew behetî hiştibû:
- Tu ji bo siyaseta dewletê çi difikirî?
- Ez şivan im.
- Ha, rast e.
- Çogên te têra xwe xurt in. Riya te vekirî be.

Gotinên doktor baweriya Masî bi hêza çogên wî, bi hêza dilê wî zêde kirbû. Li mala nû Masî zanîbû ku êdî dema vegera malê nêzîk bûye. Ji roja çêkirina lingên wî yên lastîkî ve, her tişt bilez meşiyabû. Rojekê, mêrikek hat cem, pasaporteke wêneyê wî li sere da dest. Taximekî nû lê kir û da pişta xwe:
- Hevalê Yaşar her tişt ji bo çûna te hazir e. Tuyê bi Otobûsê biçî, riya te hinekî dirêj e, tenê divê bêhna te hinekî fireh be.

Li Garajê mêrikê dilovan hinek pere xistin bêrîka Masî, bang li muawinê otobûsê kir. Hinek pere xistin destê wî, jê xwest ku li hevalê wî rêwiyê lingjêkirî miqate be û ji bo bi selametî bigihêje cihê xwe alîkariyê pê re bike. Masî bi dilxweşî û memnûn xatir ji hevalê xwe xwest, lê nizanîbû ku wî mereqdariya muawin şiyar kiriye. Nema dev ji Masî berdida. Dixwest bizane ka çi bi lingên wî hatiye, kî ye û wê here ku. Masî nema karîbû gavê bi paş ve bavêje, an jê bixwaze ku bela xwe jê veke. Li ber deriyê derketinê ji bo kontrolkirina pasaportan, rêwî ketin rêzê. Muawin pasaporta Masî ji dest girt:
-Ezê karê te bimeşînim. Tuyê tenê bi min re bî.

Destê Masî di dilê wî de bû. Li wan çend dolarên ku dabûn muawin poşman bûbû. Ji xwe re digot; niha bêtir ketiye gumanan. Gava Masî xwe di nava koma polîsan de dît, hestên dîlekî pê re çêbûn. Diviya di komputer de li navê wî bigerin. Gava polîsekî pasaporta wî li muawin vegerand, bêhna wî hat ber, lê careke din hema pirs jê kir:
-Ê, lo, te negot ka çi bi lingên te hatiye?

Masî berê bersiv jê re amade kiribû:

- Te nexweşiya gergerîna bihîstiye?
- Na.
- Ev nexweşî bikeve kîjan lingî, ji bo ku nexweşî ber bi jor ve neçe, divê ew ling bê jêkirin.
- Na lo, ya sitar.
- Erê wileh.

Behetîbû. Masî dizanîbû ku ew di jêkirina lingên xwe de difikire. Kêliyekê bêdeng ma, dîsa pirsî:

- Sedemên vê nexweşiyê çi ne gelo?
- Qey bela Xwedê ye. Ma ez ji ku zanim.

Gava rêwiyên otobûsê zîvirîn û bi rê ket, Masî kesereke kûr kişand, ji xwe re got:

- Ez ji vir jî xelas bûm.

Hê gotina wî di devê wî de, dengê zirezira erebeya polîsan hat, ji ajovanê otobûsê xwestin raweste. Gurmînî ji dilê Masî hat:

- Aha, bi Xwedê ez çûm. Ji sedî sed van ez nas kirim.

Polîsekî madtirş -kumê wî çavên wî veşartibûn- hilkişiya otobûsê, li ber derî navên kesên ku diviya derkevin, xwendin. Xwêdan bi ser eniya Masî ketibû. Niviştа di bin çengê wî de ji xwêdanê şil bûbû. Weke dengê girî ji bêrîka wî dihat. Bi hêstirên çavên Hêvîka biçûçik, qîza Rênasê li paş xwe hiştî, dihisiya. Yê polîs navek got, ne navê wî bû. Xwediyê nav bêdeng daket. Navê duduyan jî ne navê wî bû. Mêrikekî din bêçare daket. Yê polîs da pey wan, ji ajovanê otobûsê xwest ku dewam bike, here. Pey re jî yê muawin bi hewara Masî ve hat. Desmalek da dest wî:

- Qey tu nexweş î bira?
- Na wileh. Min hinekî germ e.

Masî xwest dilê xwe xweş bike. Ji muawin pirs kir:

- Mesele qediya gelo?
- Erê, me sînor derbas kir.

Lê wisa xuya bû ku haya muawin ji cewrikên tirsê yên ku di hinavên Masî de li hev dixistin, nîne. Ji ber wê, bersiva wî ewqas bi Masî giran hat:

-Yên aliyê din xerabtir in. Hema çavên wan li peran in.

Bala Masî çû ser pereyên pê re. Ew bi xwe ji bo ku bi selametî bigihêje malê, amade bû ku bêrîkên xwe hemûyan ji pereyan vala bike. Niha kelem, kontrol û xeterên heyîn hemû derbas kiribûn. Êdî ber bi kelemê dawî ve diçû. Her ku nêzîk dibû, tirsa wî jî mezintir dibû. Ditirsiya ku wisa bi rehetî bikeve destê polîsan. Riya vegerê nemabû. Careke din otobûs rawestiya, rêwî daketin. Gava muawin pasaporta Masî da dest wan, polîsekî jê xwest ku ew here, Masî tenê bimîne. Pasaporta wî li hev diqulipand û li rû yê wî dinerî. Masî xwêdan dabû. Lastîk li lingên wî sist bûbûn. Dihat ku ji qam ve bê xwarê:

- Mirov dibêje qey ev bêbav ji tiliya xwe bêhn dikin. Ev çima ewqasî ji herkesî li paseporta min dinere.

Kîna Masî li hemberê muawin zêdetir dibû. Li şûna ku karê wî rehet bike, bi alîkariya xwe dikir ku pirtir bala polîsan here ser rewşa Masî. Çavên polîsan li ser her du lingên wî yên jêkirî dicemidîn. Polîsekî jê re got; biçe cem otobûsê, emê dû re pasaporta te ji te re bişînin. Divê pasaport hemû bên kontrolkirin. Bû çeqçeqa hesinên lastîkên lingên wî, ber bi otobûsê ve çû. Muawin pê ve hat:

- Ka pasaporta te?
- Nedan min, gotin; ewê bişînin.

Muawin ya rast jê re got:

- Tu dixwazî pasaporta te bi selametî bê.
- Erê.
- Nexwe, ka pêncî dolarî ji bo ku ez bidim wan.

Masî bi kelecan pere jê re derxistin:

- Ji te re sed.

Muawin bi kêf sed dolar bir, çû. Teperepa dilê Masî direj nekir. Muawin pasaporta wî anî, hat. Bi ken pasaporta wî ya qelp da dest:

- Ji bo ev pere helal bibin, min pêncî dan wan û va ye min pêncî ji xwe re jî birin.

Masî hê jî bawer nedikir ku wê ji wir derbas bibe:

- Li te xweş helal be.

Ji pereyên hevalê wî xistîn bêrîka wî sed dolar mabûn. Dizanîbû ku wê bi wan karibe bigihêje cihê xwe. Otobûs meşiya, hêstirên Masî jî pê re. Muawin şaş mabû:

- Tu çima hêstiran dibarînî bira?

- Ez jî nizanim, nizanim yên kêfê ne, yan jî yên xemgîniyê ne.

Muawinê heyirîmayî serê xwe bêçare dihejand:

- Ax, xwezî min derdê te zanîbûya.

-Mereqa wî Masî şaş kiribû, dixwest dilê wî rehet bike:

- Çîroka derdê min direj e bira, pir direj e. Em gihiştine dawiya rê, dem jî nemaye ku ji te re bêjim.

Serê muawin pirtir tevlîhev bûbû. Li rawestgehê xatir ji hev xwestin. Bi hesreta zanîna çîroka Masî pişta xwe dayê, vegeriya karê xwe. Masî ket ser riyeke din. Piştî çend saetan, bi du lingên jêkirî gihîşt ber deriyê mala bi du lingên saxlem jê çûyî. Wê şevê ti kesî keftelefta wî nedît gava ber dîwarê mala xwe dikola û mifteya derî ji bin axê derdixist. Derî vekir. Lempe pê xist. Rû bi rû, xwe li hemberê marekî çavvekirî, mezin û pîr, dît. Mar û Masî her du bi hev re veciniqîn. Her duyan matmayî li çavên hev nêrî.

Deriyê malê yan deriyê dil

Di wê kêlîka ku Masî li her du çavên Mar dinêrî, gotinên pîra cîrana wî yên derbarê Mar de hemû hatin bîra wî. Xwe ji ber min, da alî. Çawa ku mar têbigihêje ku rê jê re vekir, hêdî hêdî ber bi derî ve kişiya, derket. Ji ber ketina mar ya hundir Masî şaş mabû, ku ne dîwar qul kiribû, ne jî şopa wî di bin min re xuya bû. Vê yekê Masî vegerandibû jiyana wî ya berê. Berî ku tiştekî bike dixwest raze. Laşê wî hemû diêşiya. Westandinê nedihişt serê wî baş bixebite. Gava doşeka xwe derxist, hestin wisa pê re peyda bûn ku tişt ji mirovan derengtir tên guhertin. Di wan salan de çi dît, çi nedît û va ye hê jî doşek, cil, dîwarên malê hema hema weke xwe mabûn. Dibe ku jiyana di şkeftan de derbas kiribû hiştibe ku bi nûbûna mala xwe bihise. Nû serê xwe danî, ket xeweke giran.

Ji şeqûdeqa piştî ew qas sal, ew cara yekê bû ku Berfînê bi awayekî zelal di xewna xwe de ditît. Şev bû, her du bi hev re dimeşiyan. Ji nişka ve çar leşkeran rê li wan girt. Yekî ji wan demance ji ber xwe derxist, ber bi jor ve berda. Lempeya ku ronahî dida kolanê, ji hev belawela kir. Diduyan ji wan bi her du destên wî girt, xwestin girê bidin. Yê dîtir bi destê Berfînê girtibû, direvand. Masî bi hêza deh hespan li ber xwe dida. Keftûlefta wî dabû ser hêza her du leşkeran. Dikir qarewar, lê dengê wî dernediket. Heta ku xwe ji nava destên wan derdixist, yê Berfîn girtî, dibir dûr ketibû. Masî dixwest xwe bigihîniyê, lê dikir nedikir nedigihayê. Carekê li xwe nerî, dît ku mirovekî bêling e û di cihê xwe de di nava xwêdana xwe de digevize. Bi keftûlefta xwe û xirecira revandina Berfînê, ji xewê şiyar bû. Dît ku tevlî lingên xwe yên lastîk razaye û di bin lihêfê de, di nava xwêdanê de, maye. Rabû, lingên xwe danîn, cilên xwe guhertin û dîsa raza. Di wê navê re min bala xwe baş dida guhertinên pê re çêbibûn. Min gelek bêriyê kiribû. Min dixwest ez çavên xwe ji dîtina xwediyê xwe têr bikim. Guhertinin mezin pê re çêbibûn. Rûyê wî westiyayî bû û diruvên mezinbûnê lê xuya dikirin. Gava bû xirtexirta wî û lingên xwe vekirin agir ket dilê min. Her çiqas ez deriyekî dilhesin bim, lê dîsa jî min nikarîbû wan libên hêstirên ku ji çavên min digindirîn, veşêrim. Ji hêla din ve, min dizanîbû ku ji xewê rabe, wê kaniya serêşandina wî nû biteqe. Bi rastî jî wisa bû. Yekem tişt ku ket bala wî, serê sibehê, ew bû ku biçe cem mala xwişka Berfînê, jê bipirse.

Lê berî ku tiştekî bike, du kesên hêrsbûyî li ber min sekinîn. Kirin gurmegurm û bang li Masî kirin. Vê dawiyê min naskir ku tirimbêla xwe tijî leşker li derve sekinandine. Masî bi xwe re birin,çûn. Wê rojê Masî li cem wan ma. Dawiya şevê jihevketî vegeriya malê. Ji pirsan gêj kiribûn. Dixwestin ji roja ku ji sînor derbas bûyî heta roja vegerayî her tiştî kitûkit zanibin. Masî ji pirsên wan tevan re bersiv didîtin, lê carna bersivên wî rast, carna ne rast bûn. Li wir jê re gotibûn; ji bo ku em te li cem xwe bihêlin me şandiye pey te, lê madem imkana çûna bi şev û hatina sibe zû heye, tu dikarî herî malê.

Bi wî awayî du hefteyan Masî birin, anîn. Di nav re hem li Berfînê dipirsî, hem li ser çûna Amedê difikirî, da biçe mala hevalê xwe Rênas, Hêvî ya biçûçik bibîne û wêne bide diya wê. Hem ji xwe re digot; ku wiha dewam bike, ezê li çareyeke din bigerim. Çiqas li ser çareyan difikirî, ji bilî xwekuştinê, tenê riya reva ber bi welatekî din ve hebû. Li cihê muxaberatan, yê lêpirsîn dikir vekirî jê re gotibû; te du caran xiyanet kiriye. Yek jê jêkirina lingên wî bû ku êdî nikarîbû ji wan re û di ber welêt de erkê xwe yê leşkeriyê bike, ya din jî derketina ji riya rast bû, riya serok û partiya pîroz ya ku zêdeyî çil salî bû ku ev welat bi rêve dibir. Ji bilî endamtiya rêxistinên qedexe, çûnûhatina bi pasaporta sexte, xistina ewlekariya giştî û ya dewletê bin tehdîd û tehlukeyê. Wisa jî jê hat xwestin ku heftê carekê biçe cem wan imze bike û her tiştê ku bike ji wan re bêje.

Roj bi roj bêhna wî teng dibû, dinyaya wî jî kêlî bi kêlî tengtir dikirin. Bi hêviya ku rojekê dev jê berdin jiyana xwe li wir dewam dikir. Ji xwişka Berfînê agahî stand ku hê Berfîn dijî û ew demeke dirêj e ku di girtîgehê de ye. Piştî çûna çiyê bi demeke kin, hatibû girtin û cezayekî giran lê hatibû birrîn, lê derketina wê jî êdî ne dûr bû. Ji herkesî pitir pîra cîrana wî mereqa hal û ehwalên wî dikir. Pîrê hejhijî bû. Wê bi xwe jî nizanîbû bê çend salî ye. Ji her alî ve li xwe kêm kiribû, lê tenê mereqa wê ji berê zêdetir bûbû. Pîrê ji Masî re behsa mirina Bozo kir. Her çenda ez jî bûbûm şahidê mirina wî, lewre berî ku bimire hat xwe nêzîkî min dirêj kir û li ber lingên min bi hesreta dîtina Masî ruh jê çû. Gava pîrê jê re ev xebera nexweş ragihand, li ber pîrê bêdeng ma, lê wê şevê heta serê sibehê giriya. Nizanim ne dilê wî bi wî û tenêtiya wî û lingên wî yên jêkirî dişewitî, ne jî bi mirina Bozoyê kal, ne jî bi halê Berfîna di wê girtîgeha dûr de. Yan jî bi halê Hêvî, keçika ku guleyekê çiya hemû derbas kiribûn û ew bi yek derbê sêwî hiştibû. Pîra cîrana wî ya ku berê ji Bozo nefret dikir, piştî mirina wî bi dilşewatî û hezkirin behsa hatina wî ya devê derî dikir. Dem bi dem Bozo dihat ber deriyê Masî. Gava didît ku qet pêjna mirovan ji malê nayê bi du çavên melûl li derdora xwe dinêrî, diçû. Dihat ev der bêhn dikirin, xwe di dîwaran dida. Bi hêviya ku kesek tiştekî jê re bêje, li ber derî mexel dihat û berî ku here çavên xwe li cîranan digerandin. Lê her carê bêçare ji wir dida rê. Cara dawî bi du çavên şil hatibû. Kalbûnê zora wî biribû. Dikir, nedikir nikarîbû hêza çûna ji ber derî bi dest bixe. Her li wê derê ma. Ji herkesî weye qey weke hercar wê ha vê gavê, ha gaveke din bide rê, here, lê wisa nebû. Bozo êdî bêhêvî, kal û bêçare mabû. Du şevan li ber derî raza, roja sisiyan serê xwe xistibû nava her du lingên xwe yên pêşî û wisa ruh jê çûbû. Dilê pîrê hebû ku termê wî mîna termê mirovekî di goristana bajêr de bê veşartin, lê bi ya wê nebûbû. Karkerên şaredariyê hatibûn termê wî biribûn devereke ne diyar.

Mirina Bozo Masî xemgîntir û tenêtiya wî kûrtir kiribû. Li her deverê, li her quncika malê şûna wî, liv û lebata teriya wî, kûzîniya wî ya di demên xerab de dihat ber çavên wî. Ew zimanê taybet yê wî û Bozo ji xwe re afirandibûn, êdî nemabû. Qedera kesên ku di serê wî de diçûn, dihatin wê gavê bi awayekî seyr li nava hev diketin. Kûçikê mirî, pîra cîrana wî ya li ber mirinê, Marê pîr yê ku bi hatina wî re ji ber çavan wenda bûyî û berî hemûyan Berfîna girtî û pirtûka wê ya kevin û tozgirtî. Mîna dilê mirovekî zindî ji hinavên wî bê kişandin, Masî diyariya xwe ya kevin ji nava pirtûkan kişand. Pirtûk ji bergê wê yî stûr derxist, dest bi xwendinê kir. Vê carê bi rehetî dikarîbû bixwîne, lê şûna pêçiyên Berfînê li ser rûpelan kesk bûbûn, bûbûn pelên kesk û di nava rûpelan de şîn mabûn. Li ser zimanê pirtûkê yê qedexe dihizirî. Zimanekî ku li dibistanên gund û bajaran, li deştan mirov nikare hîn bibe û çiya wî zimanî zindî dihêle. Ew bi xwe jî li çiyê hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bûbû. Ya

dîtir ew bû ku hînî zimanê leşkerên ku li hemberê wan re şer jî dikir, bûbû. Dikarîbû bi zimanê generalê pîr jî êdî baxive. Çawa û çilo hînî wî zimanî bûbû, jê re mîna xewnekê dihat. Bi salan bû ku hevalên derdora wî hemû pê daxivîn, hema xwe dît ku ew jî pê daxive. Masî ji berê pirtir tî dibû. Tîbûna wî nema wek ya berê bû. Berê ji tinebûna avê tî dibû, av vedixwar, tîna wî dişkest. Lê piştî hatinê tî dibû, av vedixwar, lê tîbûna wî nedişkest.

Av tenê tîbûnê sivik dike, lê her û her tî dihêle. Wê rojê li cihê Muxaberatan, di lêpirsînê de, tîbûnê avêtibû kûrahiya giyanê wî. Ji hêla din ve, generalok li navên kesên ku li wê herêmê alîkariya wî û hevalên wî dikirin, dipirsî. Bi tîbûnê re, ziwabûna qirikê bêhna wî çikandibû. Ji wê rojê ve, her ku diçû cihê lêpirsînê û heman pirs jê dihatin kirin. Dixwestin ji roja çûna wî heta vegerê, kî nas kiriye û bi kê re daye û stendiye, nav bi nav ji wan re bêje. Carna Masî dihisiya ku tenê ji bo têkbirina hiş û giyanê wî van pirsan jê dikin û tenê ji bo işkencekirinê dibin tînin. Di ber re jî haziriya xwe ji bo çûna aliyê din yê sînor dikir. Cara yekem bi lingên xwe çû ket nava şer, niha jî wê bê ling here mala hevalê xwe yê di şer de wenda bûyî, da emanet û soza jê re dayî bîne cih. Di jiyanê de Rênas gelek hêz û dilxweşî dabûyê, niha jî piştî mirina wî be jî, divê daxwaziya wî bi cih bîne û dilê wî xweş bike. Dizanîbû ku dijwartirîn kirin di jiyana wî de ev e, lê tev wê jî bibiryar bû ku bike. Di lêpirsînê de, dema behsa xwesteka wî ya rêwîtiyê bû, wiha bersiv da:

- Dê û bavê min mirine û ez dixwazim herim serdana apê xwe.

Masî bi bersiva xwe, li xwe hay bû ku hê her du apên xwe ji bîr nekirine. Wî jî nizanîbû ka çawa di wê kêlîkê de hatin bîra wî, lê ji bilî vê behanê tiştekî din nehat ser zimanê wî. Ji ber wê, gava navnîşana apê wî pirsîn, hinekî tevlîhev bû:

- Diyarbekir. . . Yek ji wan ji zû ve li wir bi cih bûye.

Bi vegera malê re diviya xwe ji bo rêwîtiyê amade bike. Ji bo karibe here Amedê vîze diviya û ji bo vîzeyê jî pere diviyan. Tenê yek çare li ber xwe dît, ew jî firotina perçeyê erdê ber deriyê wî bû ku heta hingê ew weke hewş bi kar dianî. Masî bi dilekî şkestî li min dinêrî. Dizanîbû ku wê rê li min teng bike, lê buhabûna wî perçeyê erd dikarîbû zehmetiya çûnhatina Amedê çareser bike. Roja ku ev xwesteka xwe ji pîrê re got, pîrê jê re du cîranên nêzîk anîn. Ji bilî xaçirêkeke zirav ku têra derketinê dikir, Masî erdê derdora xaniyê xwe hemû firot yekî ji wan. Di hundirê hefteyekê de vîze sitand. Tiştên di destê wî de mabûn yên herî girîng nivişt û wêne bûn. Her du danîn ber xwe û li ser jiyana xwe hizirî. Tiştê destpêkê ku bikira diviya soza xwe xerab neke, wêne bigihîne cihê wî. Wê demê nivişt û xwediyê wê diman. Paçikê li niviştê gerandî kevin bûbû. Kirasekî nû ji nivişta xwe re dirût, wêneyê Hêvîka biçûçik xist cuzdanê xwe û ket ser rê. Di rê de volkanên di hinavên wî de vemirîn û bi carekê teqiyan. Zaroktiya wî, sêwîtiya wî, xwendin û şer, Rênas û xewna li pey xwe hiştibû, jêkirina lingên wî, qehir, kîn, nefret, xezeb û hêrs, hemû di hundirê wî de li nava hev diketin gava gihişt ber deriyê sînorê navbera Qamişlo û Nisêbînê.

Halê min, ez deriyê hesinî yê kerr û lal, yê bêzehrûziman, ji halê Masî ne çêtir bû. Xwedê tenê ev hêsirên hesinî kiribûn para min. Hêsirin wisa nin, dema nabarin dibin stiriyên hesretê di çav de asê dimînin, dema dibarin jî kesek wan nabîne.

Rêwîtiya bêling

Kêfa min hat gava ku Masî ez xistim nava destên xwe û dilê wî bi min şewitî:

- Heyfa nivişta min ku ketiye vê rewşa xerab.

Paçikê li min gerandî peritîbû, kevin bûbû, toz girtibû. Çû paçikekî nû anî, kirasekî nû ji min re dirût, yê kevin avêt. Bi wê guhertinê re min naskir Masî êdî bawer dike ku ne tenê di şer de, li malê jî ez dikarim destê xwe deynim ser dilê wî û di tengasiyê de alîkariya wî bikim. Gava me da rê, heta em gihiştin nêzîkî sînor jî bala wî li ser min bû û bala min jî li ser teperepa dilê wî bû. Li ser sînor, ew agirê ku bi dîtina leşkeran re diket xwîna wî, xwêdan bi eniya wî xistibû. Her ku nêzîkî wan dibû lerzandina kîn û nefretê diket giyanê wî, nikarîbû

xwe ji wê heyecana ku zor dabû xwêdanê xelas bike. Kesekî ku guh bide wan hestên wî yên tevlîhev tine bû. Leşkerên li ser sînor bi çavekî li pasaporta wî, bi çavê din li lingên wî yên jêkirî û meşa wî ya ku perîşanî jê dibariya dinerîn. Ramanên xemgîn dev jê bernedidan. Ew raman nedibûn gotin û ji devê wî dernediketin, dibûn birînin reş û xwe berdidan kûrayiya dilê wî:

- Ewqas kurên dê û bavan, ewqas keçên delal çûn û ev sînor ma. Min dixwest ez bi lingê xwe van sînoran xerab bikim, wan derbas bikim, lê ling jî çûn û ev sînor ma!

Li ser riya Amedê, di dijwariya hevdîtina Hêvî ya biçûçik de dihizirî û hestên wî mîna ku li ser agirekî dînbûyî bin, dikeliyan. Vê zarokê çend caran xwestiye ku rojekê bavê wê bikeve derî û xwe bavêje himbêza wî? Çend caran berê xwe daye Xwedê û gazina jêstendina bavê xwe jê kiriye? Çend caran xwe avêtiye himbêza diya xwe û bi girî pirsa nehatina bavê xwe jê kiriye? Çend caran li bavên zarokên hevalên xwe nêriye û dilê wê pê şewitiye? Çend caran li van çiyayên bilind û bêserûber nêriye û bang li bavê xwe kiriye?

Masî dixwest zanibe ka ev zarok çawa li van çiyayan, li van pevçûnan û li vê kuştina ku mezin dikin, dinêre. Ji xwe dipirsî:

- Niha ev zarok li ser çi xeyalî dijî gelo? Ezê çawa bibim sedemê şkestina xeyalên vê tifalê? Her çenda ev wesiyeta bavê wê ye, lê dîsa jî zehmet e!

Ji bo çûna Amedê du dever xistibûn bala xwe ku diviya here serdana wan: Yek jê mala Rênas, ya din deriyê çiyê bû; cihê bidarvekirina şêx Seîdê kal û hevalên wî. Piştî van pirsan fikirî ku tenê here deriyê çiyê û vegere. Dihat ku li çûna mala Rênas poşman bibe, lê pêkanîna daxwaziya Rênas zora poşmanî û zehmetiyan tevan bir. Ji Otobûsa ku ji Nisêbînê diçû Amedê daket, berê xwe da sûrê mezin. Tev ku cara yekem bû diçû Amedê, lê bi biryar bû ku bêpirs hem here deriyê çiyê, hem mala hevalê xwe yê di destên wî de, yê çavên xwe li vê dinyaya gewrik girtibûn. Çarçav li derdora xwe dinêrî. Dixwest hem ji ber xwe ve, hem ji ber Rênas ve li Amedê binere. Bawer nedikir ku ewqas bajar mezin û qelebalix be. Her ku di kolanekê re diçû, ji xwe re digot; gelo, Rênas jî di vir re bihuriye, yan na. Her ku diçû bi xurbetê dihisiya. Xelkên bajêr bi zimanê generalê mezin dipeyivîn. Li hinek quncik mincikan dengê stiranan xweş dihat, jê pêve her ku guhê xwe dida xelkê, aciztir dibû. Weke ku herkesî li vî bajarî ji bîr kiribe ka çi li deriyê çiyê bûbe. Weke ku xelkên vî bajarî ji bîr kiribin ka di girtîgeha bajarê wan de çi bûye û çi nebûye.

Masî li ber deriyê çiyê wisa şaşmayî li tevgera xelkên ku bilez bûn û bi tiştên xwe ve mijûl bûn dinêrî. Weke ku kalekî rihspî berî heştê salî li wir nehatibe daleqandin, weke ku pinpinîkên giyanê şêxê kal bi demê re şewitîbin, weke ku haya ti kesî ji xwîna Rênas tine be, xelkên vî bajarî wilo qure û bi dengekî bilind dipeyivîn weke ku haya wan ji bayê felekê tine be. Masî bêdeng û bêling li ber deriyê çiyê rawestiya û pê re dipeyivî:

- Me hemûyan xwe li te girt, Deriyê Çiyê. Em ref bi ref li ber te rawestiyan û te em derbas kirin. Kesek ji me nema li te neda û nexwest ku derbas bibe. Hinek bavên kal, hinek dayikên pîr, hinek bûkên destbihene, hinek zarokên biçûçik û hinek jî bi dergîsî û bi yar. Ev sûrê mezin ji xwe re dikirin palpişt û hêza xwe jê digirtin. Va ye ez yek ji wan im, bêling û bêdeng li te vedigerim Deriyê Çiyê û . . .

Di nava xem û xeyalan de Masî ketibû avjeniyeke dijwar. Êşeke xedar xwe berdabû jora lingên wî. Dengê lawikekî ji xeyalan şiyar kir:

- Xalo, xalo, Selpak!

Ji bilî zarokên ku dixwestin selpakên xwe bifroşinê, haya ti kesî ji rûyê wî yê zerbûyî û şkestina dilê wî tine bû. Derfeta ku Masî lê digeriya hatibû ber destê wî. Bi kirîna selpakan re dostayî bi lêwik re danî û hêdî hêdî di riya wî re xwe nêzîkî cihê mala Rênas kir. Piştî ku deriyê malê nas kir, zarokên selpakfiroş ji dora xwe dan alî, bi dudilî nêzîkî malê bû. Her ku nêzîk dibû mesele girantir û zehmetir dibû, lê riya vegerê êdî nemabû. Serê xwe hilda, xwest xwe bi temamî ji nava xeyalên xemgîn derxe, hêz da xwe, li deriyê malê xist. Keçikeke heft-heşt salî jê re derî vekir, ma li benda silava wî. Ji çavên xwe bawer nekir ku Hêvî be. Xwediya

wêneyê di bêrîka wî de biçûçik bû. Gava çav li guliyên hûr yên li ser serê wê ket, qurpînî ji dilê wî hat û zimanê wî ji qurm ve hat girêdan. Tenê dixwest wê kêlîkê bigirî, yan jî bike hewar û wê zaroka behetî tevlî çavên tijî pirs himbêz bike û yekser jê re bêje; bavê te ez şandime. Lê zimanê wî negeriya ku ti tiştî bêje. Gava Hêvî dît ku mêvanê wan bêdeng li ber derî behetî maye, bang li pîrika xwe kir:

- Pîrê, mêvanekî me hatiye.

Û baz da hundir. Jinikeke navser di dêrî de xuya kir:

- Bi xêr hatî kurê min. Te xêr e?

Bi silava pîrê re Masî bi ser xwe ve hat, bi lêvên beşişî lê giran giran got:

- Ez ji riyeke dûr ve têm. Ez dixwazim silavekê li we bikim, çayekê li cem we vexwim û dîsa bi riya xwe ve herim.

Pîrê têgihiştibû ku mêvanê wan wê ji derdorên hevalên kurê wê be; bilez û bimereq mêvanê xwe derbasî hundir kir:

- Derbas bibe lawo, keremke kurê min keremke.

Gava pîrê bala xwe da lingên Masî, yekser têgihişt ku şervanekî kevin e. Bi derbasbûnê re jineke ciwan bixêrhatina wî kir. Masî naskir ku ew xwediya rûyê xweşik û xemgîn jina Rênas e. Ji bo mereq û tirsa wan kêm bibe xwe bi wan da naskirin ku nêzîktirîn hevalê Rênas bû û hatina wî ya cem wan ji bo pêkanîna wesiyeta wî ye. Bi wê agahiyê re hêsirên pîrê herikîn û çirîskên xemgîniyê xwe berdan çavên jina ciwan. Pirsa yekem ku jina Rênas jê kir, pirsa cihê cenaze bû. Ew kevirê Masî laşê hevalê xwe di ber re dirêj kiribû hate bîrê. Tenê ev gotin ji devê wî derketin:

- Li kêleka kevirekî mezin!

- Li ku?

Masî hat ku bêje li kêleka kevirekî ji kevirên çiyayên Kurdistanê, lê li xwe haydar bû ku niha li devereke wisa ye ku gotina navê (Kurdistanê) sûc e û ew peyv bi xwe dikare li gora qanûnên wî welatî bibe sedema dadgeh û cezeyên giran. Dixwest bêje mîna her kevirekî ji kevirên vî welatî ew kevir jî bû cih û warê cangoriyekî, lê gotin di qirika wî ya ziwa de asê man û doza vexwarina çayê kir. Bi vexwarina çayê re Masî gotin anî ser Hêvî ya biçûçik. Diya wê qala girêdana wê ya mezin bi bavê wê re dikir. Jina Rênas bi bawerî digot berî xebera nexweş li ser mêrê xwe bibihîze, keçika wê ew bi vê yekê hisandiye:

- Dem bi ser nîvê şevê ketibû, Ji nişka ve qêrîn bi Hêvî ket û bi gotina papa, papa re ji xew veciniqî û giriya. Min wê kêlîkê naskir ku êdî hinekan derbin xedar li bavê wê xistine! Dema hevalan xeber da me, min ji wan re got ez berê pê zanim. Wê şevê keçika min bûyera kuştina bavê xwe di xew de dîtibû. Destpêkê jinapa min jî - berê xwe da xesûya xwe – bawer nedikir, lê niha ew jî bawer dike ku di wê şeva çûna Rênas de Hêvî qêriya û veciniqî.

Masî matmayî li jina Rênas guhdarî dikir. Di wê kêlîkê de dixwest li şûna Rênas ew biçûya. Di dilê xwe de digot:

- Hema bi kêmanî kesek li benda min tine bû, ne zarok, ne jin û ne jî dê û bav.

Diya Hêvî her tişt jê re gotibû. Ji mêvanê xwe re got; êdî Hêvî mezin bûye, tiştan ji nava hev derdixe, tu dikarî wêneyê bavê wê bidiyê. Diya wê çû ew ji odeya din anî cem Masî:

- Ev hevalê bavo bû. Silavekê li apo bike.

Hêvî bêdeng destê xwe dirêjî Masî kir. Masî Hêvî maç kir û destê xwe avêt bêrîka xwe. Pey re jî ew hestên germ yên ku Rênas li ber mirinê xistibûn dilê wî careke din agir berdabûn hinavên wî. Bi kelecaneke mezin wêne dirêjî Hêvî ya matmayî kir:

- Ev wêneyê te ye, bavê te ji min xwest ku ez bigihînim te û ji te re bêjim ku ji bo tu bi serbilindî bijî wî can da. Û tiştekî din jî got. . .

Li vir kela girî ket qirika wî û kelehên mêranî û sertiya wî hemû bi hev re hilweşiyan û giriya. Di nava hêsirên germ re gotina xwe dewam kir:

- Bavê te got; ji Hêvî re bêje, ku ew gelekî ji te hez dike.

Wêne da dest Hêvî ya bêdeng, serê xwe xist nava her du destên xwe û heta jê hat nehişt ku dengê giriyê wî bilind bibe. Her du çavên zelal yên keçika Rênas, hêsirên diya wî û xemgîniya jina wî Masî dorpêç kiribûn. Geh bi xwe dihisiya ku ew jî yek ji kujerên Rênas e; pêwîst bû niha ne ew, Rênas li şûna wî rûniştî bûya. Geh jî bi xwe dihisiya ku ew bi xwe Rênas e; Rênas çû û ew li şûna xwe hişt. Di nava van ramanên tevlîhev de bi xwe hisiya ku wê rojê li wê malê tirajediyeke mezin çêkiriye. Hêdî hêdî bi ser xwe ve hat. Ji Hêvî xwest ku wêneyê xwe yê kevin deyne jora pirtûkên xwe û li dersên xwe miqate be. Ji jin û diya Rênas jî lêborîn xwest ku wê rojê ew ewqas ew xemgîn kirine. Dayika ji bêrîkirina kurê xwe jar bûyî dilê Masî xweş kir:

- Na kurê min, nebe nebe bêhna Rênasê min ji te tê.

Gava Masî qala çûnê kir, yekser diya mêvanperwer ji bûka xwe xwest ku êdî firavînê hazir bike:

- Bê xwarin tu ji mala me dernakevî. Jixwe divê tu bavê Rênas jî bibînî, niha wextê hatina wî ye.

Gava bavê Rênas bi rûyê xwe yê esmerî qermiçî û porê xwe yê spî, ket derî, qurpînî ji dilê Masî hat. Weke ku çil şerbikên kevin bi hev re di hundirê wî de bişkin. Wêne û diruvên bavê wî yê mirî hemû di dil û serê wî de şiyar bûn. Hindik mabû jê re bêje; bavo, ev tu yî? Masî ji ber ve rabû, destê wî hejand û xwe pê da naskirin, lê heta bi çavên wî jî her du çavên bavê wî yên reş û hûr anîn bîra wî. Masî di bin bandora dîtina bavê Rênas de behetîbû:

- Ev ne bavê min be gelo?

Bi xwe û wan ramanên xwe yên seyr dikeniya. Hat bîra wî ku wê rojê bi xwe dihise ku li şûna Rênas e, ji ber wê ev hestên seyr li hemberî bavê wî pê re çêbûne. Bavê Rênas dest pê kir li Masî, cihê jê hatî û li bav û kalik û malbata wî pirsî. Bavê Rênas behsa birayekî xwe jî kir ku li wir çûye rehmetê û tiştekî li ser malbata wî nizanin. Gava bavê Rênas navê birayê xwe got, Masî weke ku ji serê dareke bilind were xwarê, nema deng jê hat. Naskir ku zilamê li hember wî apê wî ye. Naskir ku Rênas ne tenê hevalê wî bû, pismamê wî jî bû. Nema dengê apê xwe dibihîst. Bûyerên wê rojê ew lal kiribûn. Apê wî jî mabû li benda xeberdana wî. Bi du çavên tijî hêsir apê xwe veciniqand:

- Belê Apo, ew birayê te yê ku tu qal dikî bavê min e.

Bi wan gotinan re bavê Rênas jî, bê ku haya wî jê hebe, rabû ser xwe û bikelûgirî ber bi Masî ve çû û bikel himbêz kir:

- Nexwe tu kurê rehmetî yî?

Masî nû têgihişt ka çima ewqas bavê Rênas mîna bavê xwe didît. Bi naskirina vê rastiyê re hem jina Rênas, hem diya wî pir kêfxweş bûbûn, lê ji wê lihevrasthatinê jî şaş mabûn. Piştî wê gava Masî qala vegerê kir, apê wî û malbata xwe hemû li hember rabûn, wê şevê destûra wî nedan ku vegere. Masî wê şevê ji şaşitiyeke xwe jî haydar bû, çawa destvala bi ser Hêvî ya biçûçik de hatibû, nexasim ku malbat jî derketibû malbata wî. Heta dema vegerê jî Hêvî ya jîr û devliken dev jê bernedida, her pirs jê dikirin. Masî xwest li apê xwe yê din jî bipirse, bersiva apê wî kurt û têr hat:

- Wî ji zû ve ji bo kar mala xwe bar kir, çû Izmîrê; hema hema haya me ji hev nîne.

Wê rojê tişta ku li ser malbata xwe nizanîbû jî pê hisiya. Apê wî rûpelên jiyana xwe û ya bavê wî hemû li ber raxistin. Diya Rênas jî tiştên di zaroktî û ciwaniya wî de dianîn bîra xwe û ji Masî re digotin. Roja din bi zorê destûra vegera Masî dan. Soz da wan ku careke din jî bê cem wan. Li ser riya vegerê çavên wî çûn ser wî aliyê bajêr cihê qula hirçê lê. Mereqa dîtina wan derûdoran dikir, lê tirseke giran ew raman ji serê wî avêtin. Wisa li ser Berfînê jî difikirî; eger zanîbûya wê neyê keşifkirin wê biçûya ber deriyê girtîgehê, bidîta. Lê hindik mabû ku derkeve û dizanîbû ku wê Berfînê jî ew ji bîr nekiriye.

Dema gihişt malê her tişt hat ber çavên wî. Rênas û gera li çiyê: Nexwe li dû wê xwîngermiya wî û têkiliya wî ya germ bi min re mirvantî jî hebû. Xweziya wî ew bû ku di jiyana Rênas de her duyan ev rastî zanîbûna; rastiya malbata ku sînor ew kirine du perçe û

çiya gihandine hev. Bawer nedikir ku ew tenê sê roj in ku ketiye rêwîtiyê. Jê weye qey ew sê sed sal in di nava bûyerên seyr de dijî. Ji hêlekê ve wijdanê wî rehet bû ku wesiyeta Rênas aniye cih, ji hêla din ve jî bi xwe dihisiya ku barê wî, pey re jî xemgîniya wî girantir bûye. Ji xwe re digot:
- Ew derewa min li muxaberatan kiribû, min gotibû ezê herim mala apê xwe, bê ku ez jê haydar bim bû rastî û ez li mala apê xwe mam.

Serê sibehê li ser teqereqa derî ji xewê rabû. Dizanîbû ku tenê muxaberat dikarin bi vî şêweyî li deriyan bixin. Wan jî dizanîbû ku wê Masiyê bêling nikaribe derî zû veke. Lê tev wê jî ji bo vekirina derî bilez bûn. Vê carê ji Masî nexwestin here cem wan. Ew bi xwe hatin; piştî ku derbarê çûnhatina wî de û li her tiştî pirsîn, vegeriyan. Masî dizanîbû ku hebûna wî ji wan re nerehetiyeke mezin çêdike. Carna dihisiya ku bi zanebûn wisa dikin, da ji wan deran bireve û koçber bibe. Masî bihêrs ji neynikê re digot:
- Ew wilo dixwazin, ezê jî xwesteka wan ji wan re bi cih bînim.

Vê biryara wî hem marê ku pîrbûnê ew dilnazik kiribû xemgîn dikir, hem jî ne bi dilê pîra cîrana wî ya bitirs li benda mirinê bû. Lê tev wilo jî dixwest jê re wê xizmetê bike:
- Tev ku ne bi dilê min e, lê dîsa jî ez qaçaçiyekî baş nas dikim, ezê te pê bidim naskirin.

Masî nedixwest di reva xwe ya ji wir de bilezîne. Ji bo paşxistina vê yekê jî tenê yek sedem mabû, ew jî Berfîn bû. Li benda hatina Berfîna xwe bû. Dizanîbû kesek ji wan girtîgehan saxlem dernakeve, lê tenê dixwst berî wendabûnekê, yan berî mirinekê, wê ji nêzîk ve li jiyanê bibîne. Bi vê xwestekê re bala wî hat ser min. Serê tiliyên xwe li min pelandin, weke ku dilê xwe bêxe cih ku ez hê li cihê xwe me. Mîna diranên kurmî yeko yeko gotin ji devê wî ketin:
- Divê ez bibînim.

Bi van gotinan re çavên xwe li avê gerandin, tev ku dizanîbû wê av tîna dilê wî neşikîne:
- Ez tî me, tî.

Ew cara yekê bû ku ez ji wan teyrikên mirinê yên ku xwe li nava çavên Masî dixistin, ditirsiyam.

Marê ku dişibe Masî

Mar jî mîna mirovan, her ku pîr dibin dilê wan tenik dibe. Hêsirên wan bi leztir tên xwarê. Çawa mirovên mîna marên kujer hene, wisa marên mîna mirovên hestiyar jî hene ku rojekê zirar negihandine mirovekî. Ev rastiyek e ku gelek kes naxwazin bibînin. Ji dema Masî vegeriyayî heta hingê xemgîniyê xwe berdabû bin çermê min. Xemgîniyeke wisa ku pêjna xatirxwestina dawî jê dihat. Dibêjin; mar zû bi hatina xeterê dihisin, ev rast e. Cara din gava Masî berê xwe da wan çiyayên ku ji bo yên mîna wî riya çûneke bêveger bû, min dizanîbû wê ji bo Masî ne wisa be. Ez di wê baweriyê de bûm ku wê rojek bê, ezê dîsa wî bibînim, lê vê carê ji raman û pilanên di serê wî de dizîvirîn, bêhneke din dihat. Ji aliyekî ve, kî diçû wan welatên dûr nema vedigeriya, ji aliyê din ve jî ez pîr bûbûm. Eger rojekê vegeriya jî wê ez nedîtibama. Nizanim çima ewqas girêdana min bi vî mirovî ve xurt bû. Dibe ji ber ku dişibiya min. Em her du tenê bûn. Em her du yek mar û yek mirov, marê ku mirovên rengemar jiyana wî xerab kiribûn û mirovê ku marên rengemirov jiyana wî tarûmar kiribûn.

Piştî firotina hewşê Masî mal jî da ber firotinê. Vê yekê ez tirsandim. Ji roja roj ve xwesteka min ew bû ku ez ne bi destê mirovan bêm kuştin. Eger mirin bihata jî bila bi awayekî xwezayî bûya. Berî du rojan xebera derketina Berfînê ji girtîgehê gihiştibû Masî, tev wê jî ji wê biryara xwe venegeriya. Dizanîbû ku wê Berfîn bê serdana wî. Geh kêfa wî dihat, geh jî li her du lingên xwe yên jêkirî dinêrî, xemgîn dibû. Bêhna wî ji çûnhatina cem muxaberatan çikiyabû. Li bajarokê wî tenê pênc beş hebûn, muxaberatên leşkerî, yên parastina dewletê, yên ewlekariya siyasî, yên ewlekariya hewayî û yên cînayetan. Hê beşekî lêpirsîna pê re neqedandibû, beşê din dişand dû, piştre yê dîtir. Hindik mabû berî ku

amadeyiyên derketina xwe biqedîne, ji wan deran bireve. Du sedeman ew bi paş ve vedigerand. Yek nêzîkbûna hatina Berfînê, ya din tirsa ji têkçûna pilana wî ya derketinê bû. Tenêtiya Masî ji berê kûrtir, firehtir û dijwartir bûbû. Berê ew û Bozo derdiketin her derê û xwe mîna perçeyekî ji wê derê didît. Lê piştî wê xirecira jiyana wî tev dayî, dihisiya ku haya kesên li derdoên wî ji tiştekî tine ye. Herkes bi debara serê xwe de ketibû. Gava Masî bi du lingên saxlem çûyî herkes bi xwe de ketibû, dema bêling vegeriyayî, dîsa herkes ji berê pirtir bi xwe de ketibû. Dilê wî ji her tiştî sar bûbû, lê kêlîka ku pêjna lingên Berfînê hat guhê wî her tişt serûbinoyî hev bû. Dilê wî, mîna ku di beroşeke ava kelandî de be, mabû dîlê germayî û şewatê. Dengê derî hat. Teqereq ne ji derî, ji dilê wî dihat. Dizanîbû ku Berfînê li ber derî ye. Bi zorê xwe da ser lingên xwe yên lastîkî û rabû ser xwe. Weke ku serê wî di nava ewr û mijê de be, nema ber xwe didît. Li ber derî, kenê li ser lêvên Berfînê ji ser ewran daxist erdê. Deng ji her duyan jî dernediket. Her du jî pê hay nebûn ka çawa derbas bûn, rûniştin. Li hundir, ji ber guhertinên mezin yên di rû û diruvên Berfînê de çêbibûn, behetîbû. Ji mezinahiya şkestinên di çavên mêrê li ber wê sekinî de Berfîn jî wisa şaş û metel mabû. Li pey bêdengiyê hevhemêzkirineke germ û hestiyar hat. Berfînê bi ken got:

- Çi bi te hatiye lo? Tu ji mêvanên xwe re nabêjî kerem bikin.

Kinbûna porê Berfînê rengekî din dabû rûyê wê yê girover. Li xwe şkênandibû, lê çavên wê zora şikestinê biribûn. Li lingên Masî nêrî. Berî ku ew qal bike Berfînê got:

- Xwişka min ji min re got; lingên wî di şer de çûne.

Masî nikarîbû kêfxweşiya xwe veşêre. Dixwest jê re çayekê, yan qehweyekê bîne û dirêj dirêj bi hev re biaxivin:

- Tuyê çi vexwî?
- Tu çima wisa li ser çûna min bilez î?
- Na. Wê qirka te ziwa bibe, ji ber ku ezê te zêde bidim xeberdan.
- Nexwe, çayê.

Bi vexwarina çayê re her du dil dihatin hember hev. Du dilên ji çar aliyan ve vekirî, du dilên bibirîn, şkestî û geş. Masî jê re qala xwe û gera xwe ya dirêj kir. Ew gera ku herdem çavên wî jî li benda hevdîtinê westandibûn, nexasim dereng naskiribû ku yara wî hatiye girtin. Axavtina xwe bi derxistina niviştê qedand:

- Eger ez heta niha li jiyanê mabim, sedem ev niviştê e.

Berfîn keniya. Matmayî jê pirsî:

- Qey baweriya te bi van tiştan tê?
- Erê, çima na? Ma tu zanî ev çi ye?
- Niviştê... niviştê e, ma çawa ez nizanim?

Gava Masî niviştê vekir û çavên Berfînê li serê guliya wê ya jêkirî ket, hindik mabû veciniqandin dilê wê rawestîne. Bi wî awayî Masî ya dilê xwe jê re gotibû û name gihiştibû cihê xwe. Çavên wê tijî hêsir bûn. Serê xwe berda ber xwe û bi dengekî nizim û nazik got:

- Tu dizanî ku rojeke tenê jî tu ji bîra min neçûyî?

Berfînê çavên xwe li aliyê pirtûkên wî gerandin. Masî têgihişt ku li diyariya xwe digere. Pirtûka wê ya bergstûr jê re anî:

- Ez dizanim tu lê digeriyayî.
- Rast e.

Berfînê gazinên di bin şkestina çavên Masî de dîtin. Di serê xwe de sedemên wê şkestinê rêz dikirin. Yek jê bêdengiya wê bû, ew bêdengiya piştî şandina wê nameya kinik ya jiyana wî ber bi aliyekî dijwar ve zîvirandî. Pirsên Masî yên li ser zimanê wî bûn û nedikirin, Berfînê hemû di çavên wî de dixwendin.

- Tu li ku bû yî, vê dema dirêj?
- Çima, carekê tenê be jî te li min nepirsî?
- Çawa ez li te digeriyam, ez bawer nakim tu li min geriyabûyî.

Ji bo ku Berfîn jimara pirsên li ser zimanê wî kêm bike, çû çayeke din ji xwe re anî, dîsa dest pê kir, tejikê salên xwe yên derbasbûyî li ber lingên Masî raxistin. Dixwest jê re ta bi derziyê ve bike. Ji ber ku birînên serpêhatiyên wê hê germ bûn, berî ji devê wê derkevin, mîna pêlên dîn, gotin bi ser hev de diqulipîn.

Berfîn tozê ji ser rûyê jiyana xwe dide alî

Ez xwişka çar bira me. Eger ez vegerim koka meseleya xwe, divê ez ji girtina birayekî xwe yê herî biçûk dest pê bikim. Birayê min salekê ji min mezintir bû. Di wê dema ku şer giran bûbû de, ji ber ku leşkeran li çiyê derbên mezin dixwarin, dihatin li deştê li heyfa xwe digeriyan. Hatin ew birayê min ku bi rastî dûrî siyasetê bû, girtin. Destpêkê haya me jê çênebû. Ji ser cadê, ji kolanekê biribûn. Piştî sê rojan xeber ji qereqolê ji birayê min yê mezin re hat:
- Birayê te bi şaşitî hatiye girtin. Werin bibin.

Gava birayê min çû, çi bibîne? Gewdeyê wî hemû birîn bûn; deverek tenê ji işkencê nefilitîbû. Bi gihiştina malê re birayê min av xwest. Piştî ku av vexwar tayekî xwînê ji kêleka devê wî herikî û careke din nema çavên xwe yên xweşik vekirin. Ji wê rojê ve polîs, leşker û her tiştê bi wan ve girêdayî nefretê bi min re çêdike. Ez dikarim bêjim biryara derketina min ya çiyê di wê kêlîka ku birayê min çavên xwe girtin di hundirê min de hat meyandin. Piştî anîna birayê min, tenê lêborîneke wisa kurt ji me xwestin:
- Li qisûrê nenêrin, me bi şaşitî girtibû.

Doktoran di rapora xwe de nivîsîbû ku bi awayekî xwezayî miriye. Dema me doza rastiyê kir, bersiveke lezgîn ji qereqolê ji me re hat:
- Eger hûn deriyê vê meseleyê negirin, wê serê we jî bikeve belayê.

Min bi awayekî fermî û li ber çavan deriyê meseleyê girt, lê rûpelê herî fireh û mezin di jiyana min de nû vebû. Karê min yê siyasî yê bi dizî dest pê kir. Pey re jî pêşbaziya bi girtin û kuştinê re. Di wê navê re me yek ji birayê min re xwest û naskirina min bi te re dest pê kir. Me got birayek çû, bila qedera birayê din cuda be; bila bibe bi mal, jin û zarok. Diviya bi kêmayî lawekî wî navê apê xwe yê kuştî hilde, wisa jî bû. Ya rast ez bi te û naskirina te re heyirîbûm. Min tim ji xwe re digot Xwedê, ev ji min re ji ku derket! Ji ber wê rewşa xwe ya tevlîhev min nedixwest te bi xwe re zêde girêdayî bihêlim. Çavekî min mabû li te û yê din li çiyê bû. Ne min karîbû ez xwîna birayê xwe li erdê bihêlim, ne jî bi rehetî dev ji te berdim. Di nav agirê wê dudiliya dijwar de ez çûm û min serê guliya xwe ji te re hişt. Lê min qet bawer nedikir ku tuyê jî pey min re berê xwe bidî çiyê. Biryareke wisa ne hesan, ne jî hindik e. Ji ber ku min tu baş nas nedikirî, min texmîn nedikir ku tu biryareke wisa wêrek bidî. Çûna çiyê zû bi zû bi dest min neket. Min di komîteya ciwanên bajaran de cih girt. Me xwarin û derman dişand çiyê û birîndar dibirin ser doktoran. Me pirtûk û belavok belav dikirin. Dema dihat xwestin, me dikan bi xelkê didan girtin. Çend caran ez hatim girtin. Heta ku debara min ji destê wan nema. Min berê xwe da Stenbolê cem birayê xwe. Her sê bira hem ji bo kar, hem ji bo xwendinê li wir bi cih bûbûn. Piştî çend rojan, carekê min dît deriyê mala birayê min şkênandin û ketin hundir. Sîleh li me kişandin û em hemû birin. Ji birayê min yê mezin re digotin:
- Ev ne xwişka te ye, terorîst e û bi nasnameya xwişka te li vir dijî. Hatiye vir bombe bike.

Li girtîgehê, polîsan li me xist, çavên me girê dan, lê xirecir û qîreqîra me diçû hev. Yekî ji wan derbek li pozê birayê min xist. Pey re dilopên xwîna wî li rûyê min ketin. Qîrînî bi min ket. Birayê min hêrs bû:
- Netirse, tiştek nabe.

Yekî bi pora min girt, kişand:
- Eger tu her tiştî nebêjî, emê birayê te bikujin.

Min lê vegerand:
- Eger hûn min bikujin, herkes dizane ku em li cem we ne.

Hêrsa işkencekarê hevalê wî zêdetir dibû:
- Min ji we re got, ev terorîsteke perwerdekirî ye.
Ez çavgirtî ji wir derxistim. Dengê birayê min bi zorê dihat min:
- Berfîn, tu tiştekî imze nekî ha.
Bi rastî jî wisa bû, yekser kaxetek ji min re anîn, ji min xwestin ku ez imze bikim. Ji ber wê çavên min vekirin. Kirin nekirin min imze nekir. Işkenceyê heta berbangê dewam kir. Serê sibehê em anîn cem hev. Birek polîsên din hatibûn. Hinekan ji wan em gihandin ber malê. Li ber derî polîsekî bi nermayî got:
- Em lêborîna xwe ji we dixwazin. Hinekan îfade li ser we dabû.
Em berdan, çûn. Kuştina birayê min hat bîra min. Wî çaxî jî lêborîna xwe xwestibûn û gotibûn şaşitiyek bûye. Bi wê şaşitiyê birayê min yê herî nêzîkî min kuştibûn. Piştî demekê diya min şand pey min. Min xatir ji birayê xwe xwest, ez vegeriyam malê cem diya xwe. Komek heval dihatin malê, komek diçû. Min ji wan xwest ku ez jî bi wan re herim çiyê. Yekî ji wan got:
- Baş e, emê te bi xwe re bibin. Eger nebû jî vegere.
Şevek ji şevên biharê bû, me da rê. Em çûn gundekî nêzîkî çiyê. Em tevlî komeke mezin bûn. Me çek û kinc datanîn gund, me li wir civîn çêdikirin. Li wan derdoran, li ber kendalekî nêzîkî çiyê me perwerdeya siyasî û leşkerî dît. Ji ber çûnûhatina leşkeran ya wê derê, me ji wir bar kir. Ji hev re gotin:
- Em hatin keşifkirin.
Û gera me ya li wan çiyayan dest pê kir. Min Agirî ji bilindayiya wî nas kir. Di wê navê re, min naskir ku wê hevalekî nexweş dakeve aliyê we. Min pişta xwe da Gabar û min ew name ji te re nivîsî. Min bawer nedikir ku careke din te bibînim, lê hêvî jî mîna van çiyayan mezin bû. Wî çaxî, ji ber ku ez nû tevlî bûbûm, min perwerdeya leşkerî baş nedîtibû. Hevalên min ez li rex neh kesên din ku hemû nû bûn, li gundekî nêzîkî çiyê hiştin û çûn. Êrîşên helîkopteran û panzeran qut nedibûn. Nedihiştin em derfeta perwerdeyeke baş bibînin. Berî em herin şer, şer hat cem me. Zivistaneke dijwar bi ser me de hat, diviya em cihê xwe biguherin. Gundê din, meşa du rojan dûr bû. Di rê de firtone, berf û bahozê rêberê me şaş kiribû, berê me dabû cihekî din. Rê bû meşa çar rojan. Me xwe ji bo wê riyê amade nekiribû. Ne solên berfê, ne kincên zivistanê û ne jî xwarin. Ji bilî ku berfê dest û lingên gelekan şewitandibûn, riyên gundan hemû girtî bûn. Lingekî min şewitî, yek jî werimî. Ji bilî min, lingên çarên din jî şewitîbûn. Me solên xwe derxistin û me şûtik li lingên xwe gerandin. Em gihiştin gund. Koma me zêdeyî şêst kesî bû. Em li malan belav kirin. Min di wê navê re naskir ku ew gund hemû qorocî ne. Digotin; çekên dewletê vegerandine. Dilê min ji wan ne rehet bû, lê ji ber ku gund ji êrîşên leşkeran dûr bû, ez bêdeng mam. Heta bigihana gund, ji bo hatina koprayan du saet, ji bo panzeran jî şaş saet lazim bûn. Rêveberê me, em yên lingşewitî li malekê civandin. Hinekan jî hilkişîna xwe ya bi çiyê ve dewam kir:
- Emê niha we li gund bihêlin. Berf e, serma ye, seqem e, dû re emê ji we re hespan bişînin.
Dijle, hevala me ya gund baş nas dikir, li hemberê biryarê derket, ji rêveber re got:
- Tu van hevalan li vir bihêlî, wê hemû yan bên girtin, yan jî bên kuştin.
- Na, em wan demeke dirêj li vir nahêlin.
- Tu berpirsiyar î. Niha xeber gihiştiye dijmin.
Yê berpirsiyar hêrs bû:
- Ez çi dibêjim wê wisa bibe.
Min jî jê re got:
- Ez dikarim bimeşim. Ez li vir namînim.
Bêtir li xwe nexweş anî:
- Jixwe tu dibî sebeb ku hemû dereng dimînin.

Milîsekî xort li bal me hiştin, em ên din, tev şervanên keç bûn. Em li mala muxtarê nû bûn. Muxtarê kevin yê gundî hemû kiribûn qorocî li wan deran diçû dihat. Me nobet digirt. Carekê min dît dengê nobedarê me yê xort bilind bû:
- Va du heval bi hespan tên.

Me kincên gundiyan li xwe kiribûn. Berî ku em kincên xwe li xwe bikin, jina muxtar giriya:
- Leşkeran dora gund girtiye. Mala we şewitî.

Me dev ji kincan berda, em beziyan çekên xwe. Qelebalix ket nava me. Çendên nû, ez jî di nava wan de, em li hewşê man. Yên kevin gotin; emê herin li aliyekî li wan biteqînin, di wê navê re, di aliyê din re divê evên nû hûn li çiyê bixin, xwe xelas bikin. Di çend deqeyan de belav bûn. Min nema dizanîbû kî bi ku ve çû. Ji nava me ya herî birîna wê giran Zîlana hijdeh salî bû. Gava me xwest ew bi tenê bimîne, gazî me kir:
- Min tenê li vir nehêlin.

Gava me dît ku nikare bi me re were, jina muxtar soz da ku bibe cihekî asê. Piştre em derketin. Bi derengiya şevê re dengê çekan hat. Ez û hevaleke xwe dîwar bi dîwar, mal bi mal, ber bi aliyê din yê çiyê de meşiyan. Mala dawiyê bi keviran di navbera xwe û çiyê de sûrek çêkiribûn. Diviya berî ku xirecira şer kêm bibe em ji sûrê derbas bibin. Hêviya me ew bû ku berî berbangê em di bin baskên şevê de xwe xelas bikin. Min û hevalê xwe, me kir nekir, bi lingên xwe yên birîndar me nikarîbû em hilkişin. Dawiyê hevala min ev pêşniyaz kir:
- Tu hilkişe û bi destê min bigre.

Ez hilkişiyam, berî ku destê xwe bide min, em her du man di bin ronahiyê de. Leşkeran şewq da me û destê me ji hev filitî. Ew kete wî alî, ez ketim aliyê din yê sûrê. Çeka min jî ma li aliyê wê. Yekser hevala min dan ber guleyan, kuştin. Min xwe ber bi bexçeyekî mezin ve, di nava dilê tariyê de, xwe kişand. Di wê navê re, derdor hemû kirin ronahî, lê min xwe gihandibû nava bexçe. Min xwe di nava lodeke giyê de veşartibû. Bi wan kincên gundiyan û bi lingên xwe yên şewitî, ez di bin giya de ketim devê serma û seqemeke dijwar û bê wijdan. Ez dilerizîm. Ji jana sermayê pirtir jana mirinê ketibû qirika min. Tevzînokên mirina yên hatibûn ber deriyê min, tevzînokên sermayê ji bîra min biribûn. Gava deng ji dora min kêm bû, hinekî bêhna min hat ber min. Min cihê xwe di binê giyê de xweş kiribû û ez mam li hêviya berbangê. Her ku dem derbas dibû, hêviya min jî pitir dibû. Min pilan dikir ku bi derketina gundiyan re, ezê jî hêdî hêdî derkevim û xelas bibim. Lê kuştina hevala min û veciniqandina wê şewqa gurr bi min re çêkiribû, serê min tevlihev kiribûn. Ronahiya rojê xwe berda erdê, pey re jî hêviyên min hemû di avê de çûn. Ne tenê gundî, qelebalix û xirecira leşker û gundiyan bi hev re gav bi gav nêzîkî min dibûn. Çawa ku cihê min zanibin, berê xwe dabûn min. Ez şaş mabûm. Kûçikekî di ser min re dikir ewteewt. Li hewşa kêleka lodê derî vekirin, heywanên xwe hemû ji wir dûr kirin. Min nizanîbû ku dane dû şopa xwîna min a li ser berfê. Gava min xwe ji ser sûrê avêtî, heta ber bi lodê dilopên xwîna lingê min rêz bûbûn. Leşker û gundî pazdeh mitreyan dûrî min diaxivîn. Leşkerekî got:
- Dibe ku bombe li balê hebe.

Yê din lê vegerand:
- Em giyê bişewitînin.

Yê dîtir:
- Em birîndar bigirin baştir e.

Ez wê deqîqeyê bi xetera meselê hisiyam. Êdî min zanîbû ku di demeke nêzîk de ezê bi birîndarî bikevim destê wan. Ji ber ku newêrîbûn xwe bidin ser min, melhêb dan dest muxtar, jê xwestin giyê ji ser min bavêje. Muxtar neçar ma rahişt melhêbê, giya ji ser min avêt. Heta ez sax bim, ez wê tirsa di çavên wî de, di kêlîka ku ez dîtim de, ji bîr nakim. Bi xuyakirina serê min re leşkeran hemûyan berê çekên di destên xwe de, da min. Serekê wan bang kir:
- Muxtar, wê rake û bîne.

Ez di nava gihê de cemidîbûm. Min dikir û nedikir tiliyên min yên hişk nediliviyan. Ji bilî dil û hişê min, devereke min ne pûç nemabû. Muxtar denglerizî bersiv da:
- Çek pê re tine ye.

Sîlah hemû serberjêr bûn. Serekê wan du gule berdan ber serê min. Ferman da du leşkeran:
- Kaş bikin, bibin.

Her du leşkeran bi porê min girtin, li ser piştê, heta navenda gund, ez li dû xwe li ber çavê gundiyan hemûyan kişandim. Li wê derê gelek gundî jî xistibûn panzêran. Dixwestin wan jî bi xwe re bibin qereqolê. Min li wir naskir ku ew xortê milîs yê bi me re mayî bi leşkeran re jî dixebite. Gundiyên di panzêran de hemû bi alîkariya wî hatibûn destnîşankirin. Bi wî halî, leşkeran ez birim ser cenazê hevala min. Ez didam ber pehînan û gotinên gemar dikirin. Bang li hev dikirin:
- Ka vê ya terorîst bibînin ka yeke çawa ye?

Bi bêtêlê ji hev re digotin:
- Me yeke sax girtiye, şokolata û şampanyayê bînin û werin.

Ji helîkopterê çend tîmên taybet yên din jî hatin. Şampanya û qedehên xwe anîbûn. Mîna mirov li filmekî tirsê binêre, gundiyan hemuyan li min û cenazeyê hevala min dinerî:
- Tu vê nas dikî?
- Erê, hevala min e.
- Hûn li kîjan malê bûn?
- Ez nizanim kîjan mal bû.

Leşkeran ez xistibûm nava xwe. Yekî pehîn li devê min dixistin, yê din porê min dikişand û diqîriya:
- Tu mirovên xwe nîşan nadî, ne? Tu wan diparêzî.

Kincên min hemû qetiyabûn. Xwîn hem ji lingê min dihat, hem ji bêvila min. Derbên cezmeyên wan birînin xedar di rû û laşê min de hiştibûn, şewat û jan ji wan diçû. Bêhêvî, serekê wan pehînek li zikê min xist û ferman da wan:
- Bavêjin wî alî.

Leşkerên hêrsbûyî ez ber bi koma gundiyan ve kişandim. Serleşker berê xwe da gundiyan:
- Van hemuyan alîkariya we dikir?
- Na, em bi zorê ketibûn malên wan.

Gundiyên di panzeran de daxistin. Berê min dan mala muxtêr. Ez bi wê xwîna xwe ya ziwabûyî, porê gijik û kincên qetiyayî ve derbasî hundir kirim. Di nava cihan de Zîlan veciniqî, ji ser hişê xwe çû. Jina muxtar li ber leşkeran rahişt sola xwe, avêt min:
- Wey ne bi xêr. Te qîza min tirsand.

Gava êrîşî min kir, leşkeran ew vegerand, lê pilana wê bi ser ket. Bi wê êrîşê, bi leşkeran da fêmkirin ku ya di nava cihan de nexweş, keça wê ye. Bi wî awayî Zîlan ji destê leşkeran xelas kir. Jina muxtar bi Zîlanê daket, leşkeran ez dam pêşiya xwe, birim xistim hundirê panzerê û ji gund derxistim. Li qereqolê çavên min vekirin. Gundî hemû berdan. Ez û Muxtar tenê hiştin. Serleşker ji min re got:
- Tu li ku rûniştibû, te çi xwariye, te çi kiriye, em her tiştî zanin.

Wî xortê milîs yê ajan her tişt ji wan re gotibû. Dîsa çavên me girêdan, em şandin devereke din. Li wir em dan destê istixbaratên leşkerî. Lêxistin, lêpirsîn û işkence bi hev re dikirin. Zêdeyî du hefteyan ez û muxtarê pêncî salî di wî halî de man. Pişt re çavvekirî em derxistin xwedêgiravî dadgehê. Li wir sê dozger, çend polîs û leşker rêz bûbûn. Dozgerekî dosya xwend. Diviya em sûcên xwe, çûna çiyê û bikaranîna çekan li dijî dewletê, yan bipejirînin, yan jî red bikin. Muxtarê ku bi işkenceyê ji hawhaw xistibûn, her tişt pejirandibû. Min ji dozger re got ev mirov ji ber işkenceyê sûc hemû pejirandine. Dozger li min nêrî. Cihekî saxlem ne di canê min de, ne jî di canê muxtêr de nemabû. Muxtar li min nêrî, hêsir ji çavên wî hatin. Av dan muxtêr, careke din jê pirsîn. Muxtar got; min ti sûc ji van sûcan nekirine. Di bêhnvedanê de, li gora daxwaziya dozger, xwarin ji me re anîn. Li pey bêhnvedanê dozger

dosya min xwend; min tiştek nepejirand, lê agahiyên rast yên ajanên wan anîbûn ber destê wan, rê li ber min girtibûn. Min pejirand ku ez bi dilê xwe û bi bawerî çûme çiyê û min çek hilgirtiye. Dawiyê muxtar berdan, lê jê xwestin ku her ji demekê biçe dadgehê. Berê min jî dan girtîgehekê.

Ger û rêwîtiya min ya bi erebeyên sergirtî û bi destên kelebçekirî, di navbera gitîgehan de, dest pê kir. Piştî sê salan nû cezeyê min eşkere kirin. Pirtûk li hinek girtîgehan hebûn, hinek jî rût bûn. Li derve çi çêdibû, li çiyê çi dibû, li hundir gardiyan dihatin heyfa bûyerên derve ji me hiltanîn. Carna kerba xwe di serê pirtûkên me re derdixistin; diqetandin, li erdê pê li piçik û pariyên wan dikirin. Me jî ji hêla xwe ve, kêmayî nedixist karê xwe. Ji girevê bigire heta derxistina kovarên destnivîs, heta civatên perwerdeya siyasî û pêşkêşkirina şano û stiranan. Di nav re jî hinek bejnên bilind dihatin xwarê, diçûn nava itîrafkaran. Dixwestin rojekê berî gavekê ji wir derkevin. Ez dikarim bi du gotinan ji te re bibêjim. Salên giran bûn. Jiyana min carna weke dîwarekî xerabe tê ber çavê min. Ji hêlekê ve şensê min yê xerab, dema ez li çiyê li nava refên zarokên çiyê, ez ber bi kesekî ku bi dijminê zarokên çiyê re dixebitî ve ajotibûm. Ji hêla din ve şertên wan girtîgehên ku ez di wan de dîleke şer bûm, têra herifandina sed dîwarên di giyanê mirov de dikirin. Ji her hêlê ve xwîna birayê min ya ku hîn jî li erdê ye, di nava wê xirecira hişk de û nazikiya wan hestên germ yên ku te bi min re hiştibûn de, ez dikuştim. Bawer bike, birînên min ji yên te kûrtir in. Yên te ji derve ve xuya ne, her du lingên te bûn qurban û hatin jêkirin. Lê ya min, birîneke kûr ya ku nema tê hev di giyanê min de vebû. Ez ji girtîgehê pîr, birîndar, şkestî û xemgîn derketim. Dema lingên min ketin ser riya mala te, tev vê kêfxweşiya mezin, ez têr giriyam. Ez bi xwe dihisim ku em ji hêla giyan ve hatine seqetkirin. Ev mîrasa ku pala xwe dide peymanên dîrokî yên zalim, yên ku bav û kalan ji me re hiştine, mîraseke kujer e. Vê xelkê ji hêlekê ve qehremanên mezin û bi dehên fidakaran mîna efsaneyan derxistin, lê ji hêla din ve bi hezaran xayînên mezin, artêşên nokeran, teriyên dijminên qewmê xwe jî derxistin. Di nava van û wan de qedera min û te rastî hev hatin û va ye ez hatim cem te. Ya rast di vê çîroka min û te de şaşitiyek heye. Ez baş nizanim ka ew şaşitî li ku ye. Yan di vê dema ku em tê de dijîn de ye, yan di vî cihî, yan di hundirê min, yan di hundirê te, yan jî di qederê de ye. Cara din ku me hev dît, min haziriya xwe û çûnê dikir. Vê carê me hev dît, va ye tu haziriya xwe û çûnê dikî. Dibe ku ne sûcê ti kesî be. Dibe ku ev çîrok çîroka mêr û jinê be. Çîroka her mêrî û her jinê be. Gava mêr tê jin diçe û gava jin tê mêr diçe. Jin û mêr tenê li rawestgehan li hev rast tên. Ew hevdîtina li rawestgehê carna dirêj dibe, navê wê dikin zewac, carna jî kin e û navekî din lê dikin. Li van rawestgehan yek ji wan siwar tê, çep diçe, yê din jî rast diçe. Eger her du bi hev re bi yek alî ve biçin, hevxwarin dest pê dike. Jin û mêr wî çaxî ji jiyana hev dixwin û hev diqedînin. Ku hev neqedînin, dem, zeman her duyan diqedîne. Ez bala xwe didimê, gava ez qala têkiliyên jin û mêr dikim çavên te fireh dibin. Şaş nemîne. Rastî herdem wiha ye, dema xwe tazî dike, veciniqandinê li pey xwe dihêle. Em vegerin ser meseleya xwe. Gelek tişt hene ku min negotin. Dibe ku ne hêjayî gotinê bin, lê min dixwest ez ji te re qala van salên xwe yên dawiyê bikim. Min dixwest bi gurbûna agirê êşên me re êdî ev pevçûn vemire û ev agir zarokên me neşewitîne. Lê wisa xuya ye ku dilê generalê pîr û dîtina rastiya me tine ye. Mixabin, me dawiya vê êşê neanî, ne wilo tenê, em bûn destpêka vê êşê. Wê ev çîroka me û vî generalê pîr heta kuderê bajo, ez jî nizanim. Êdî ez westiyam. Qirika min ziwa bû. Ez nema zanim di kuderê re çûm û di kuderê re hatim. Erê, min bi xwîna birayê xwe dest pê kiribû û va ye çîrokê ez birim cem generalê pîr sekinandim.

Generalên ku çiyayan dixwin

Ez kevirek ji hezarên kevirên li ser sînoran im, yên li nava van gelî û çiyayan belavbûyî. Ez li her çîrokê guhdarî dikim. Mirov wisa dizanin ku guhê keviran nînin. Ev ne rast e. Li vî welatî heta bi kevirên weke min, bidil, bican, bihest, biguh û biziman bûne. Zilm û zora vê axê dîtî,

kevirên li ser jî şiyar kirine. Generalê pîr dema jehra agirê tang, balafir û topên xwe dibarîne, keviran jî dide ber xwe, me diteqîne, belawela dike, hûrhûrî dike û bi mebesta kuştinê me dişewitîne. Weke mirovên vî welatî min jî dabû pey çîrokên vî generalê ku hebûna me wî bêzar dike. Kîna wî ya li hemberî me ne kêmî kîna li hemberî vê axê û mirovên wê ye. Wê kêlîka ku Berfîn bi Masî re diaxivî, kef bi ser devê generalê pîr ketibû. Ji bo êrîşa ser çiyayên bilind bi dehhezaran leşkerên xwe perwerde kiribûn. Vê carê, ne tenê ji bo nêçîra çend masiyan bû, ji bo xwarina çiyê bû. General çaralî bi ser leşkerên xwe de diqîriya. Kevir bi kevir çiya dabûn ber xwe, dixwarin. Ji bo xwarina kevirên çiyê wî û leşkerên xwe ji zû ve diranên xwe mivred kiribûn. Dar, kevir, kêstek, giya, lawir, çi diket ber wan dixwarin û dimeşiyan. Berî xwarina wan ya ecêb, firokeyên wî yên şer ew çiya tarûmar kiribûn. Koncalên fireh li wan deveran hatibûn kolan. Ferman dabû leşkerên xwe ku yek ji wan qelsiyê bike, yan jî bêhna nokeriyê jê bê, divê tenê bi yek guleyê di serî de bê kuştin û cendekê wî di wan koncalan de bê veşartin. Li gundê xwe, yan li bajarê xwe, divê tabûta wî ya vala bi alaya wî ya pîroz bê pêçan û weke şehîdê welat û dewletê bê binavkirin. Gotina general nedibû didu. Ji zarokan bigire heta bi mezinan, li seranserê welêt, li gora sîstema ku danîbû, dihatin perwerdekirin. Zarokên wî welatî hemû bûbûn generalên biçûk. Di serê her zarokekî de mejiyê leşkerekî ji leşkerên xwe çandibû. Li vî welatî di xeyala her jinê de generalek hebû. Jinan jî xwe bi kincên leşkerî paye dikir. Bi wan kincan stiranên li ser qehremaniya wî û leşkerên wî digotin. Xwendevanên zanîngehan ji çermê xwe derketibûn û her yek ji wan dibû generalekî biçûçik. Cotkar û karkeran bi serê wî sond dixwar. Herkesê ku hinek pere dabûna hev, digot; bi saya serê generalê xwe em gihane vê derê. Ji bo nebe cihê gumanê aleke mezin li cihê karê xwe dadilqandin. Karê perlemana wî welatî jî mabû erêkirina daxwaznameyên wî. Daxwazname bi ken davêt nava lingên perlementeran. Ew jî mîna leşkerên wî tevdigeriyan. Karê serokên welêt jî yên bi taximên sivîl, mabû şandina birûskên pîrozbahiyê ji general re; pesnê mêraniya wî û leşkerên wî yên qehreman didan. Li ser cenazeyê her leşkerî, serokên bitaxim û bêstêrik diketin pêşbaziya serxweşiyê. Ev hevok di devê herkesî de bû:

- Bila serê miletê me û dewleta me sax be.

Generalê pîr, ji bo jiholêrakirina van çiyayên ku bûbûn bela serê wî û dewleta wî, gelekî xebitîbû. Dinya hemû kişandibû aliyê xwe. Mezintirîn dewleta dinyayê, hem ji hêla teknolojî, hem ji hêla dana çekên giran, hem ji hêla siyasî û istixbaratê ve alîkariya wî dikir. Her ku kevirek ji kevirên çiyê dixwar, ji bo xwarina kevir, lat, kendal û zinaran dilbijokiya wî û leşkerên wî zêdetir dibû.

Generalê pîr xwarina goştê masiyan ji bîr kiribû. Baweriya wî mabû ew ku çavkaniya wê serêşandina ku carna navê terorê, carna navin din lê dikirin, çiyan in: Heta ev çiya hebin, wê rehetiya me tine be. Çare yek tişt e; divê dost û hevalên me yên li dinyayê rastiya me fêm bikin. Divê ev çiya ji holê rabin.

.Dixwar û hey dixwar. Bi çekên giran û teknolojiyeke pêşketî leşkerên wî çiya yek yek diherifandin û dixwarin. Êrîşa dawî Masî şaş kiribû. Digot; ez û hevalê xwe herdem bi van gotinên xelkê yên ku li ser generalê pîr digotin dikeniyan; niha jî hemû dibin rastî û li ber çavên me ne. Êrîşê li dinyayê deng dida. Masî li ber televizyonê rûdinişt, bi zimanên ku dizane tevan guhdariya nûçeyan dikir:

- Emerîka piştgiriyê dide êrîşa generalê pîr û leşkerên wî yên ji destê van çiyayan gelek zehmetî kişandine. Emerîka maf dide tang, top û panzerên generalê pîr ku van çiyayên -li gora wan dijî mirovayetiyê- biherifînin û leşkerên wî jî wan bixwin. Yekîtiya Ewrupayê destekê dide xwarina çiyayan, lê ji jetên generalê pîr dixwaze ku li mafê mirovên li wê herêmê miqate bin. Nexasim qazanên ku ji ezmên tên xwarê, ew jî mafê dewleta generalê pîr e, lê pêwîst e ku zirarê nede demokrasiyê.

Masî nema zanîbû ka nûçe bi rastî wilo tên dayîn, yan jî li ber guhên wî wisa tevlihev dibin:

- Yan min serê xwe xwariye, yan jî evên ku nûçeyan didin serê xwe xwarine!

Hakimiyeta xwe li ser girêdana van bûyeran û van nûçeyan bi hev re wenda kiribû. Nedixwest li nûçeyan guhdarî bike, hêrs dibû, ditengijî, dihat ku bike qêrîn, lê di encamê de bêdeng dima.

Berî vegera Berfînê, li benda hatina wê bû. Piştî hatina wê, li bendê bû ku heta demekê Berfîn wî bi tenê bihêle, da karibe bifikire. Ne destê wî ji Berfînê dibû, ne jî dikarîbû weke ku tê xwestin li wê û li evîna xwe xwedî derkeve. Berfînê wê gavê ew tenê hişt û çû mala xwişka xwe. Soz dayê ku gelek carên din hev bibînin. Hatibû û çîrokên generalê pîr bi xwe re anîbûn. Pêjna evînê jî bi xwe re anîbû, lê ne dereng bû, gelo? Heta ku dil û ling saxlem bûn, evîn dûr bû, evîn nêzîk bû, ling hatin jêkirin û dil:

- Dema muxaberatên mîna muxaberatên vî welatî li pey kesekî bin, wê çi di dilê wî de bimîne gelo?

Dema ev raman hatin bîra Masî, tirsiya û li dora xwe zîvirî. Wê gavê li rewşa xwe haydar bû, ka çiqas hatiye tirsandin. Bê ku bipeyive, êdî ditirsiya ku dengê ramanên wî hatibin bihîstin.

Dengê nûçeya nû vegerand nava xirecira bûyerên ku li ser her zimanî bûn:

- Pîrozbahî ji bo serkeftinên generalê pîr dewam dikin.

Hat ragihandin ku çend çiyayên biçûk bi tevayî hatine xwarin û çav lê ye ku di demeke nêzîk de çiyayên ku mane jî ji holê bên rakirin. Ji ezmanan firokeyên şer bi her cureyî bombe, qazan, TNT, bi ser serê çiyayan de dibarandin. Li erdê, panzer, top, tang û bi dehhezaran leşkerên biçek li çiyayan diciviyan û kevir bi kevir dikeritandin, dixwarin. Tev ku teknolojiya dihat bikaranîn çiya dikirin piçik û parî, lê dîsa jî generalê pîr tetmîn nedibû. Bêhna wî dernediket ku ne wî bi destên xwe bi wan perçeyên kevirî yên çiyê bigirtana û bidana ber gezan. Ji leşkerên xwe re digot:

- Teknolojiya di dest me de têrê nake. Eger piçik û parî li erdê bimînin, wê bi demê re dîsa bên ser hev û bibin çiya. Divê ev çiya ji kokê ve bên hilanîn. Ev ne agahî ye, ev Ferman e.

Leşkeran bi her hêza xwe êrîş dikirin. Ter û hişkên wan çiyayan didan ber xwe. Generalê pîr kevirên mezin dixwarin. Soza xwarina çiyayên wî welatî tevan dida. Tişteke tenê vê dawiyê ew bê zar kiribû, ew jî diranên wî bûn. Diranên wî ko bûbûn û çiya nediqediyan. Êdî her ku dev li kevirekî ji kevirên çiyê dikir, diranekî wî diket. Generalê pîr bibiryar bû ku wisa berdewam bike. Ji ber ku pîr bûbû, nav di leşkerên xwe yên ciwan dida:

- Hêviya vî welatî, hûn in qehremanino! Bixwin, tiştekî li pey xwe nehêlin.

Em kevirên Xwedê, yên bêzehr û bêziman, ji çavsorî û hovîtiyên ku van mirovan li hev dikirin, şaş û metel mabûn. Bi kuştinê tenê razî nedibûn. Laşên hev parçe parçe dikirin. Guhên miriyan jê dikirin, bêvilên wan, endamên wan yên cinsî, pêsîr û zimanên hev jê dikirin. Me li wan dinêrî û em diêşiyan, lê wan ne li me dinêrî, ne jî bi êşa me zanîbûn. Rewşê wisa dewam kir; ji hêlekê ve çiya diteqandin, dixwarin, ji hêla din ve jî yek bi yek diran ji devê generalê pîr diketin.

Gava dinya dibe goleke miçiqî

Gava Masî berê xwe da xirecira dora mala xwe û bihîst ku pîra cîrana wî miriye, ji guhê xwe bawer nekir. Hesteke wisa li cem çêbûbû ku wê ew pîr heta hetayê sax be. Pîrê heta roja dawiya jiyana xwe bi derdorên xwe ve mijûl bû û her tişt li ser wê derdorê dizanîbû. Bi mirina wê re Masî li pilana derketina xwe ya derveyî welêt jî ket gumanê. Ji bo serxweşiya pîrê konekî reş vegirtin û bi refan xelk diçûn û dihatin. Di wê navê re kesên ku dixwestin xaniyê wî bikirin jî dihatin. Tiştê din yê serî lê gerandibû girtina Berfînê bû. Dixwest here lê bipirse, lê ew bi xwe jî ji bo lêpirsînê diçû cem muxaberatan. Ditirsiya ku lê bipirse, barê wê girantir bike. Ji xwişka wê re ev got û ma li benda vegera wê. Weke ku texmîn dikir, Berfîn bi ken lê vegeriya:

- Li vî aliyê sînor girtin û li wî alî girtin.

Masî ya dilê xwe jê re got:

- Ez bawer dikim ew nema dev ji te berdidin.
- Tiştekî ku min bitirsîne tine ye. Ji wilo pêve ma wê çi ji me bikin. Tiştê ji destê wan hatiye, kirine.
- Tiştek maye nekirine.
- Ew çi ye.
- Em hîn li jiyanê ne. Ez carna dihisim ku ne ji zimanê me û daxwaziyên me, ji hebûna me aciz in. Dijminayî ye, dijminayî.

Berfînê ji gotinên Masî tirsiya. Di jiyana wê de, ti peyvan mîna peyva dijmin ew mijûl nedikir. Bi salan bû li koka hebûna wê peyvê digeriya. Dijmin, tê wateya ku êdî riya axavtin, danûstendin û jihevfêmkirinê, hatiye girtin. Têkiliyên mirovan ji pirrengiyê dûr dixe û di yek quncikê de asê dihêle, ew jî quncika mirinê ye: Yan ezê yên din bikujim, yan wê ew min bikujin. Heta ku ez hebim, divê ew tine bin. Vê felsefeya ku bi hezaran xort û keç di bihara ciwaniya wan de binax kiribûn, herdem û hergav serê wê dêşand. Niha jî Masî berê mijarê ber bi wê peyvê ve dibir. Ew peyv her ku dihat gotin, lempeyeke pêketî ji lempeyên dilê wê yê tijî ronahî dişkest. Dixwest bi Masî re jî vê danûstendinê bike:

- Em weke laş, bi awayekî fîzîkî hene, lê weke yên din tine ne.
- Jixwe mebesta min ew e; dixwazin me bi awayekî fîzîkî jî ji holê rakin.
- Nexwe, neçe derveyî Welêt. Meydanê ji wan re vala nehêle.
- Eger sebebeke mana min hebe, wê tu bî.

Ew cara yekê bû ku Masî her du destên xwe dixistin nava porê Berfînê û her du lêvên wê wisa dirêj dimijandin. Giraniya lastîkên her du lingên jêkirî ji jêr ve zor didan hewildana wî ku dixwest bi tevayî xwe lê bipêçe. Bi alîkariya Berfînê giraniyê cihê xwe da sivikayiyê; dihat ku pê re bifire, lê tîbûneke bêîman bi giyanê wî girtibû û bernedida. Tîbûneke wisa ku maçên Berfînê jî nikarîbûn bişkîne. Masî li xwe û xeyalên xwe mabû ecêbmayî. Li şûna ku di wan kêlîkên germ de, dîmenên jiyaneke xweş û nû bi Berfînê re di serê wî de herin û bên, geh li ser xwarina wê, geh li ser kuştina wê dikfikirî. Wisa bawer dikir ku wê nikaribe bê Berfînê bijî, lê dizanîbû ku wê nikaribin bi hev re jî bijîn. Masî ji xwe û van xeyalên xwe yên reş hêrs bû û xwe ji nava lepên Berfîna behetî derxist. Bilez berê xwe da avê. Şaşmayîna Berfînê cihê xwe da ken:

- Wisa xuya ye ku çiya hatin bîra te ku tu ewqas tî bûyî.
- Tîbûna ku li vir bi qirika min digire, dijwartir e. Li çiyê weke herkesê ku demeke dirêj bêav bimîne, ez jî tî dibûm. Lê li vir ruhê min tî dibe, ruh.

Berfînê xwest hewaya cidiyetê hinekî biguherîne:

- Masî, te jî mesele pir asê kirine ha!

Masî bi kesereke kûr re:

- Min asê kirine, yan ew bi xwe asê ne, ew jî meseleyeke din e.

Masî dixwest bi Berfînê bide bawerkirin ku tiştekî din yê ku li wî welatî bikin, nemaye. Tiştê ku ji wan hat kirin û desthilatdar nema derfeta jiyaneke bê dijwarî li ber wan vekirî dihêlin. Her du aliyên sînor ji hev xerabtir didîtin. Li hemberî van ramanên wî, Berfînê jî ew xewnên reva ji wê derê ber bi welatin nenas ve sivik didît û soza ku ew jî bide dû, jê re mîna pêkenokekê dihat. Her du jî, di serî de ka çiqas ji hev dûr bûn, ewqas di dil de nêzîkî hev bûn. Ne serî dihişt dil rojekê rehet bibe, ne jî dil dihişt ku serî rojekê, bi rehetî biçe ser balîfê. Ji bilî her duyan tenê haya marê wê zivistanê razayî ji vî şerê bêhedan yê dil û serî hebû. Mar meyldarê Berfînê bû. Çavvekirî û dilgerm li hewildanên wê guhdarî dikir. Hema hema dilê wî ji vê yekê piştrast bû ku heta Berfîn li wir be, wê Masî nikaribe wê bi tenê bihêle û biçe. Lê rastiyeke din jî hebû ku ew ditirsand. Heta wê gavê amadeyiyên Masî jî yên çûnê bi dawî nebûbûn. Hê di nava wan ramanên xwe yên tevlihev de bû, zilamekî çil salî hat ji Masî re got;

her tişt amade ye, divê em sibe bikevin rê. Mar ji Xwedê dixwest ku wê kêlîkê Berfîn bi hewara wî ve bê û nehêle biçe. Dizanîbû çend saet mane ku Masî bikeve riya koçberiyê.

Wisa têgihîştibû ku Masî xanî firotiye, êdî ne xwediyê wî xaniyî ye û wê roja din bi rê bikeve. Tev ku dizanîbû ku wê Berfîn dîsa hewil bide, lê dîsa jî nedixwest vê dawiya xemgîn bibîne. Ji bo ku wî dîmenî nebîne, nebîne ku Masî pişta xwe daye wî, mala xwe û axa xwe, ber bi qulika xwe ve kişiya, her du çavên xwe yên bihêsir dan hev û careke din ket xewa zivistanê. Weke mar, deriyê malê yê hesinî jî hêsirên xwe yên hesinî vedişartin; lalbûna xelkên wî welatî gihiştibû wî jî. Di xaniyê Masî de bûyerên seyr didîtin, lê ji ber ku lalbûnê li koka qurmê zimanê wî yê hesinî xistibû, nema deng û his jê dihat. Wê rojê ne tenê li derve xelk mîna kerr û lalan bûn, li hundirê mala Masî jî bêhna lalbûnê ji her tiştî dihat.

Di wê navê re, Masî xwe gihandibû cihê ku dixwest. Li Ewropayê kesek nas nedikir. Bihîstibû ku ne xelkên van welatan ne jî dewletên wan, naxwazin biyanî biçin cem wan, lê dîsa jî ji ber ku li ser sînor bêkaxet û bêpasaport hatibû girtin, neçar ma ku li wir bimîne. Di wan rojan de herkesî bihîstibû ku Masî ji malê reviyaye, lê kesekî nizanîbû çîroka wê jina kuştî ya di mala wî de hatibû dîtin, çi ye. Masî êdî ne li wir bû, lê laşê wê jina ku cîranan di mala wî de, piştî çûna wî bi du rojan, dîtibû laşê kê bû? Herkesî ji xwe re tiştek digot. Hinekan digot; yê Berfînê ye, hinekan digot; me bi çavên xwe piştî çûna Masî Berfîn dîtiye. Hinekên din jî dîtin piştrast dikirin û digotin; xwişka Berfînê dibêje 'vegeriyaye mala bavê xwe li aliyê din yê sînor û ev jina kuştî wisa xweşik û spehî ku jinên mîna wê li vî welatî nehatine dîtin, ne Berfînêye, jineke biyanî ye. Hinekan jî digot; Xwedê tenê dizane ka têkiliya Masî bi çend jinan re hebû, ev jina kuştî jî yek ji wan e. Hinekan jî digot; ne Masî kuştiye, piştî çûna wî, wê xwe li mala wî bi dar ve kiriye. Bi vî awayî her serê çend rojan çîrokên nû li ser jina kuştî, xwediya bejin û bala bêmînak, ya di mala Masî de hatibû dîtin, derdiketin. Herkesî qala Masî û xirecira li pey xwe hiştibû dikir, tenê wî qala xwe nedikir. Dixwest rojek bê, devê xwe veke û bêje. Bêguman, wê ew ji herkesî bêtir zanibe ka rastiya wê jina xweşik û kuştî ya li pey xwe hiştibû, çi ye. Wê ew roj bê, yan neyê, ez nizanim. Tenê ez dizanim Masî li welatekî Ewrupayê ku nedixwest kesek navê wî zanibe, kolan bi kolan digeriya. Hewaya van welatan sal diwazdeh meh mîna hewaya zivistana welatê wî bû, lê yê wî havîn bi ser de hatibû. Xwêdan dida û mîna ku tiştekî xwe wenda kiribe, dimeşiya. Bi xelkê re dipeyivî. Xelkên van welatan, mîna xelkên welatê wî, tênedigihiştin ka çi dibêje, yan çi dixwaze. Li wan kolanan herdem zimanê wî bi hustekê ji devê wî dikişiya, digot û dubare dikir:

- Ez tî me, tî.

Masî li tenekeyan digeriya, ew didan ser hev. Dixwest ji hejmareke tenekeyên vala, ku divê wekî hejmara salên temenê wî be, ji xwe re malekê ava bike. Hêdî hêdî hejmara salên temenê wî mezin dibû, lê tenekeyên vala bi dest nediketin

.....Dawî.....